



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

# ÇÎROKA KURMANCÎ YA MODERN DI KOVARA HAWARÊ

DE

Teza Lîsansa Bilind a Bitez

Emin BOZAN

15711011

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn, 2019

## TAAHHÜTNAME

### TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ’NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum *Çîroka Kurmancî ya Modern di Kovara Hawarê de (Hawar Dergisi’nde Modern Kurmanci Öyküsü)* adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin 1 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.


10.08.2019

Emin BOZAN


## KABUL VE ONAY

Emin BOZAN tarafından hazırlanan “Çiroka Kurmancî ya Modern di Kovara Hawarê de” adındaki çalışma, 21.08.2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[ İ m z a ]



Doç.Dr. Nesim SÖNMEZ (Başkan)



Prof.Dr. Abdurrahman ADAK ( Üye)

Doç.Dr. Mustafa ÖZTÜRK



## PÊŞGOTIN

Hawar ji bo çîroka Kurmancî qonaxeke girîng e. Ji ber piştî çîroka yekemîn a kurdî çîroka Kurmancî cara ewil di Hawarê de hatiye weşandin. Heger bi awayekî din em bibêjin asasê çîroka Kurmancî bi Hawarê re hatiye danîn. Di vê xebatê da me hewl da em çîrokên modern ên Kurmancî yên ku di Kovara Hawarê de hatine weşandin analîz bikin.

Di serî de em li ser têgeha çîroka modern sekinîne û bi kurtayî dîrokçeya çîroka modern me daye. Gava me ev kurteya daye me tenê bala xwe daye wan nivîskaran ku hinek ji wan avakarê çîrokê ne û hinek jî çîroknûsiya wan hiştiye ku çîrok bi pêş bikeve û veguhere. Me ew pêşketin û veguherîna çîrokê di ser çîroknûsiya nivîskarên wek N. Gogol, E.A. Poe, Guy de Maupassant, A. Çexov, J. Joyce, F. Kafka, J.L. Borges re daye. Em bawer dikin ku bi alîkariya van nawan hem serpêhatiya çîrokê hem jî veguherîna wê ya bi demê re ew ê zelaltir xuya bibe.

Em li ser çîroka modern a yekemîn a kurdî sekinîne û me bi hûrgilî pêşketina çîroka kurdî nîqaş kiriye. Ji ber ku Kurd di nav çar dewlet û sê zimanan de hatine dabeşkirin me pêşketina çîroka Kurmancî di ser berhemên li wan dewletan hatine weşandin re kiriye. Helbet şert û mercên kurdan ên di wan dewletan de me li ber çavan girtiye. Ji ber ku li Qafqasyayê jî hejmareke zêde ya kurdan heye û wan jî edebiyatek ava kiriye me çîroka wan jî di ser vî navê re nîqaş kiriye. Dîsa ji ber ku kurdên li dîasporayê jî xebatên edebî kirine û berhem dane, me çîroka wan jî li ser navê dîasporayê nirxandiye. Yanî me li gor zeman û mekanê wê, analîza pêşketina çîroka kurdî a modern kiriye.

Kovara Hawarê di 15ê Gulana 1932an de dest bi weşanê kiriye. Bi giştî 77 heb çîrok di Hawarê de hatine weşandin. Hejmara çîrokên modern ên Kurmancî yên di Kovara Hawarê de hatine weşandin me wek 50 hebî tespît kiriye. Di bijartina van

çîrokan de qiyasa me ew bû ku di çarçoveya hunera çîroka modern de ne ya na. Nivîsên ku em bawer dikin di çarçoveya hunera çîroka modern de bi cih nabin me ew wek çîrok hesab nekirin. Ev çîrok ji aliyê 15 heb nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn.

Di serî de me tabloya temamê çîrokan derxistiye. Ev tablo ji bo çîrokên di Hawarê de nerîneke giştî dide me. Di nav van çîrokan de me çîrokên dikevin çarçoveya çîrokên gelerî bi tabloyeke cuda nîşan dane. Çîrokên adaptasyon û çîrokên werger dîsa me di tabloyeke cuda de nîşan dane. Ew çîrokên mane ku me ew wek çîrokên modern tespît kirine, me bi tabloyeke cuda nîşan dane û me li gor nivîskarên wan ew senifandine.

Nivîskarên ku çîrokên wan di Hawarê de hatine weşandin me tespît kirine. Li gor Tespîta me 15 nivîskarên cuda di Hawarê de çîrok nivîsandine. Me ew nivîskar jî wek tablo dane. Celadet Alî Bedirxan bi kodnavên xwe nêviyê van nivîskaran pêk tîne. Ji ber vê yekê jî em li ser kodnavên Celadet Alî Bedirxan sekinîne û ew çîrokên ku wî bi wan kodnavên cuda nivîsîne me li ser navê wî hesab kiriye.

Ew çîrokên ku me tespît kirine me di bin navê nivîskarên wan de rêz kirine û kurtiya wan dane. Di beşa dawî de jî me analîza tematîk a van çîrokan kiriye. Di tespîtkirina temaya van çîrokan de me gotiye, ji ber ku nivîskarên Hawarê çîrok wek alavekê dîtine, nerîn û fikrên xwe yên sîyasî di ser çîrokên xwe re dane. Sedema vê yekê jî me bi wê ve girêdayîye ku di destpêka weşandina Hawarê de hatiye gotin ku kovar ew ê ji siyasetê dûr be.

Ez dixwazim spasiyên xwe pêşkêşî şewirmendê xwe birêz Mustafa ÖZTÜRK bikim ku di nivîsîna vê tezê de alîkariya xwe ji min kêr nekir. Ji ber pêşniyaz û şîroveyên wî yên hêja, spasî Umran ARAN dikim. Herwiha spasî hevala xwe Yasemin AYAT BOZAN dikim ku bi piştgiriya xwe barê min sivik kir.

MÊRDÎN 2019

Emin BOZAN

## KURTE

Kovara Hawarê di warê çîroka Kurmancî ya modern de xwedî cihekî taybet e. Çîroka Kurmancî di Hawarê de asasekî xurt ji xwe re daniye û pêngaveke mezin avêtiye. Di Hawarê de ji hêla 15 nivîskaran ve 50 heb çîrokên nûjen hatine nivîsîn. Temayên wek şer/serhildan, xelaskirina welat, hesreta welat, şer/adeten eşîrî, evîn, fedakarî, poşmanî, bîranîn, zanîn/xwendin, hezkirina ziman, rêvebir/rêvebirî, ol, heyfhilanîn, xurafe/bawriyên batil, welatperwerî, hêvî, qedirnasî, mêrxasî, sêdaqet, timayî, bindestî, camêrî, yekîtî û xayintiyê hatine bikaranîn. Di ser van temayan re hatiye xwastin analîza van çîrokan bê kirin.

**PeyvênSereke:** Çîrok, Çîroka Kurmancî, Çîrokên Hawarê, Kovara Hawarê.

## ÖZET

### *“Hawar Dergisi’nde Modern Kurmanci Öyküsü”*

Hawar dergisi Kürtçe modern öykü açısından önemli bir yere sahiptir. Kürtçe modern öykü Hawar dergisinde sağlam bir temel oluşturmuş ve sıçrama yaşamıştır. Hawar dergisinde 15 yazar tarafından 50 modern öykü yazılmıştır. Savaş/başkaldırı, vatanın kurtarılması, memleket hasreti, kavga/aşiret töreleri, aşk, fedakarlık, pişmanlık, anı, eğitim, dil sevgisi, yönetici/yönetim, din, öç alma, hurafe/batıl inanışlar, vatanseverlik, umut, kadir bilmek, kahramanlık, sadakat, aç gözlülük, sömürgeleşme, cömertlik, birlik, ihanet gibi temalar hikayelerde kullanılmıştır. Bu temalar üzerinden bu hikayelerin analizi yapılmaya çalışılmıştır.

**Anahtar Kelimeler:** Öykü, Kurmancî Öykü, Hawar Dergisinde Öykü, Hawar Dergisi

## **ABSTRACT**

### **THE MODERN KURDISH (KURMANJI) SHORT STORY IN HAWAR MAGAZINE**

Hawar magazine has an important place in modern Kurdish short story. Modern Kurdish short story has reached a strong basis and risen in the magazine. Hawar has published 50 modern short stories written by 15 authors. In this thesis these short stories are studied thematically.

**Key Words:** Short Story, Kurdish Short Story, Hawar Magazine, Kurdish Short Story in Hawar Magazine.



## NAVEROK

TAAHÛTNAME .....	I
KABUL VE ONAY .....	II
PÊŞGOTIN .....	III
KURTE .....	V
ÖZET .....	VI
ABSTARCT .....	VII
NAVEROK .....	VIII
DESTPÊK .....	1

### BEŞA YEKEM

#### 1. KURTENÊRÎNEK LI ÇÎROKA KURMANCÎ YA MODERN

1.1.Pexşan Di Zimanê Kurdî De .....	11
1.2.Çîroka Kurmancî Ya Modern .....	13
1.2.1. Yekemîn Çîroka Modern a Kurdî .....	14
1.2.2. Çîroka Modern a Kurmancî Di Hawarê De .....	17
1.2.3. Çîroka Kurdî Di Bin Sîwana Fermiyetê De .....	21
1.2.4. Çîroka Modern Di Edebiyata Kurdî Ya Kafkasyayê De .....	22
1.2.5. Çîroka Kurmancî Li Dîasporayê.....	24
1.3.Çîroka Kurmancî ya Nû.....	26

### BEŞA DUYEM

#### 2. KOVARA HAWARÊ Û ÇÎROKA KURMANCÎ DÎ KOVARA HAWARÊ DE

2.1.Kovara Hawarê.....	31
2.1.1. Çîrok di Kovara Hawarê de .....	32
2.1.2.Çîroka Modern Di Kovara Hawarê De .....	39
2.2.Kurteyên Çîrokên Di Kovara Hawarê De .....	44
2.2.1.Çîrokên Celadet Alî Bedîrxan.....	44
2.2.1.1. <i>Ber Tevna Mehîfûrê</i> .....	44
2.2.1.2. <i>Şêraniya Zimanê Kurmancî</i> .....	45
2.2.1.3. <i>Gazinda Xencera Min</i> .....	45
2.2.1.4. <i>Bi Xwehên Guhderz Re</i> .....	45
2.2.1.5. <i>Kevirê Mûsayê Ehmed</i> .....	46
2.2.1.6. <i>Zerdeşt</i> .....	46
2.2.1.7. <i>Klêopatre</i> .....	47
2.2.1.8. <i>Selahedîn û Riçardê Şêrdil</i> .....	48
2.2.1.9. <i>Şûşa Dilan</i> .....	48
2.2.1.10. <i>Keleha Şahîn</i> .....	49
2.2.2. Çîrokên Qedrî Can .....	50

2.2.2.1.	<i>Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye</i> .....	50
2.2.2.2.	<i>Gundê Nûava</i> .....	50
2.2.2.3.	<i>Besreka Zêrîn</i> .....	50
2.2.2.4.	<i>Hêva Çardeşev î</i> .....	51
2.2.2.5.	<i>Sond</i> .....	51
2.2.2.6.	<i>Guneh</i> .....	52
2.2.2.7.	<i>RojênDerbasbûyî</i> .....	52
2.2.3.	Çîrokên Osman Sebrî .....	53
2.2.3.1.	<i>Li Goristanek Amedê</i> .....	53
2.2.3.2.	<i>Nêçira Hirçan</i> .....	54
2.2.3.3.	<i>Li Pêşberî Yarê</i> .....	54
2.2.3.4.	<i>Warê Min Ne î Kor e</i> .....	55
2.2.3.5.	<i>Pira Genderê û Hemûşê Kulik</i> .....	55
2.2.3.6.	<i>Şeytanqûnî I</i> .....	56
2.2.3.7.	<i>Şeytanqûnî II</i> .....	56
2.2.3.8.	<i>Şeytanqûnî An Tabûta Şeş Cendek</i> .....	57
2.2.4.	Çîrokên Kamiran Alî Bedîrxan .....	58
2.2.4.1.	<i>Du Egîd</i> .....	58
2.2.4.2.	<i>Lawikê Min</i> .....	58
2.2.4.3.	<i>Dildiziya Gulekê</i> .....	59
2.2.4.4.	<i>Mêrê Min di Şerî de ye</i> .....	59
2.2.4.5.	<i>Leylana Rastiyê</i> .....	59
2.2.4.6.	<i>Du Dengbêj</i> .....	60
2.2.4.7.	<i>Eyloyê Pîr</i> .....	60
2.2.4.8.	<i>Nivîsevan</i> .....	61
2.2.5.	Çîrokên Nûredîn Êsif (Zaza) .....	61
2.2.5.1.	<i>Xurşîd</i> .....	62
2.2.5.2.	<i>Gulê</i> .....	62
2.2.5.3.	<i>Keskesor</i> .....	63
2.2.5.4.	<i>Perîşanî</i> .....	63
2.2.5.5.	<i>HevînaPerîxanê</i> .....	64
2.2.6.	Çîrokên Cemîlê Haco .....	64
2.2.6.1.	<i>Melayê Gulê</i> .....	64
2.2.6.2.	<i>Biserhatiya Reşoyê Darê</i> .....	65
2.2.7.	Çîrokên Ş. Hesen .....	65
2.2.7.1.	<i>Tirba Spî û Marê Qut</i> .....	65
2.2.7.2.	<i>Xewna Rastiyê</i> .....	66
2.2.8.	Çîroka Sibhî Resûl .....	66
2.2.8.1.	<i>Dilawerê Çardesalî</i> .....	67
2.2.9.	Çîroka Fiad Cemîl Paşa .....	67
2.2.9.1.	<i>Dilgirsî û Dilovanî</i> .....	67
2.2.10.	ÇîrokaTelet Qedîr Hec Elî Begzade .....	68
2.2.10.1.	<i>Kulîlkên Ko Ji Kurdistanê Tê</i> .....	68

2.2.11. Çîroka Derketîkî Dêrsîmî .....	68
2.2.11.1. <i>Kurd Yek In</i> .....	69
2.2.12. Çîroka Cegerxwîn .....	69
2.2.12.1. <i>Behramê Gor</i> .....	69
2.2.13. Çîroka Dilistan .....	70
2.2.13.1. <i>Melik û Koçer</i> .....	70
2.2.14. Çîroka Şêx Abid .....	70
2.2.14.1. <i>Segê Jar û Şêxê Teyles</i> .....	71
2.2.15. Çîroka M. Emîn Silêman .....	71
2.2.15.1. <i>Mîr û Nêçirvan</i> .....	71

## **BEŞA SÊYEM**

<b>3. TEMAYÊN ÇÎROKÊN DI KOVARA HAWARÊ DE .....</b>	<b>73</b>
3.1. Şer/Serhildan .....	74
3.2. Xelaskirina Welêt .....	75
3.3. Hesreta Welêt .....	76
3.4. Şer/Adetên Eşîrî .....	76
3.5. Evîn .....	78
3.6. Fedakarî .....	81
3.7. Poşmanî .....	82
3.8. Bîranîn .....	82
3.9. Zanîn/Xwendin .....	83
3.10. Hezkirina Zimên .....	85
3.11. Rêvebir/Rêvebirî .....	86
3.12. Ol .....	88
3.13. Heyfhilanîn .....	89
3.14. Xurafe/Baweriyên Batil .....	90
3.15. Welatperwerî .....	91
3.16. Hêvî .....	92
3.17. Qedirnasî .....	93
3.18. Mêrxasî .....	93
3.19. Sedaqet .....	95
3.20. Timayî .....	95
3.21. Bîdestî .....	95
3.22. Camêrî .....	96
3.23. Yekîtî .....	96
3.24. Xayintî .....	97
<b>ENCAM .....</b>	<b>98</b>
<b>ÇAVKANÎ .....</b>	<b>100</b>

## DESTPÊK

Çîrok ew cureya edebîye ku li dinyê bi pêşketin û guherîna pexşanê re hem wek nav hem jî wek têgeh bûye cihê nîqaşan. Çîrokêbi kurtayî em dikarin bi vî awayî pênase bikin: Çîrok, bi piştgiriya çavdêriyekê, ya jî sêwirandinekêre vegêrana beşeke bûyerekê, rewşekê ya jî kêlikekê ye.

Dîroka çîrokê, bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Ji efsaneyan bigire heta bi çîrokên gel; ji çîrçîrokan bigire heta bi pêkenokan; ji destanan bigire heta bi meseleyên bi jiyane ve têkildar tev ji çîrokê re dibin bingeh û kokên wê dadixin heta bi destpêka mirovahiyê. Em dikarin hinekî din kûrtir jî herin û wê kokê daxin heta bi çîroka avêtina mirovan ya ji bihiştê. Wê gavê Adem û Hawa dibin du lehengên çîrokekê. Lê helbet çîroka em behs dikin ne ev e. Bereksî wê dîroka çîroka em behs dikin ne hewqasî kevn e. A.J.J. Ratcliff dibêje: “Wek maneya em dizanin çîroka modern, ne ew vegêraneke ji rêzê ye ku yek an jî çend bûyerên ku pêk hatine vedigêre, ew vegêrane ku xwedî nirxekî hunerî ye, di wextekî nêzîk de derketiye holê.”<sup>1</sup>

Çîroka modern di lîteratura edebiyatê de xwediye xwe û gelek pênaseyan e. Li gor nivîskarê îngilîz Wells’î çîrok ew e ku “metneke sêwirandî ya kin e ku di navbera niv saete de dikare bê xwendin.” Nivîskarê Emerîkî Poe ku wek pêşengê çîrokê ye Emerîkayê jî tê dîtin û bi nav kirin ji bo çîrokê dibêje nivîsandina çîrokê çalakiyeke kêlikî ye û li ser vê yekê dibêje “di naveroka temamê metnê de divê peyvek bi tenê jî ya berê hatibe sêwirandin tunebe.” Li gor Çexov jî divê destpêk û dawiyeye çîrokê tunebe. London dibêje divê çîrok "kin, xwerû, jîndar û balkêş be" O’Brien ku navekî girîng e di pêşketina çîroka modern a edebiyata Îngilîz û Emerîka’yê de ji bo çîrokê wisa dibêje: "Ji bo analîzeke kartêker ya di naveroka çîrokê de taybetiya ewil divê mirov bala xwe bidê ew e ku rastî û bûyerên ku nivîskar bijartine bi hewcedariya radeyeke çawa wî ew dahurandiyê nava metnê. A.E. Coppard bingeha teorîk a berhemên xwe yê ku nivîsandine bi wî rengî ji hev cuda dike; metnên hatine nivîsîn çîrok, ên tîn qalkirin jî wek çîrçîrok in”<sup>2</sup>

Çawa ku ji bo pênaseya çîrokê nerînên ji hev cuda hebin ji bo binavkirina wê jî heman gengeşî heye. Ji ber ku vegêrana “masal”ê jî wek “çîrok” tê bi nav kirin çîrokê di edebiyata Kurdî de navên ji hev cuda li xwe bar kiriye. Navên wek “çîrok”, “çîroka kin”,

<sup>1</sup> H.E.BATES Kısa Öykü, Bige Kültür Sanat, Stenbol, 2013, Wer. Gökçen EZBER rp. 7

<sup>2</sup>BATES ,2013, rp. 9

“çîroka mînîmal”, “kurteçîrok”, “novel” li ser bergên pirtûkên çîrokan cih digirin. Di edebiyata Emerîkî de jî navên nêzîkî hev ên wek “tale” “story”, “short story” hatine bikaranîn. “Novella” di sedsala 19’an de li Ewrûpayê navê herî zêde hatiye bikaranîn e. Piştî “Çîrokên Decameron”ê ev navê Îtalyanî berbelav bûye. Ev nav ji bo wan çîrokan hatiye bikaranîn ku dişibin “Çîrokên Decameron”ê. Ji bo van cûre çîrokan li Fransayê navê “conte” û “fable”, li Elmanyayê navê “schwank” li Tirkîyeyê navê “öykü” hatine bikaranîn. Di vir de gengeşiya mezin a binavkirinê li ser dirêjbûn an jî kinbûna çîrokan e.

G. Boccacio, wek çîroknûsê yekemîn ê edebiyata cîhanê tê qebûl kirin. Berhema xwe ya bi navê "Decameron" ku ji sed çîrokî pêk tê di navbera salên 1348- 1351 de nivîsiye. Deh mirovên ku ji ber nexweşiya webayê reviyane di qesrekê de dimînin. Her roj her yek ji wan çîrokekê dibêje. Di vê berhemê de di navbera deh rojan de û rojê deh çîrok tên gotin. “Dîrok, efsane û çîrçîrok tevna çîrokên Decameron’ê pêk tînin.”<sup>3</sup> Bextewarî, têkîliyên jin û mêran, derdê dilan, rêvebirên olî yên li pêy berjewendiyên xwe dikevin mijarên sereke yên çîrokan e.

G. Boccacio, berhema xwe bi zimanê gel nivîsiye. Bi vê berhema xwe çavdêriyên rasteqîn yên heyama xwe raxistiye ber çavan. Berhema wî nîzameke pexşanî ava kiriye ku ji bo pêşketina zimanê Îtalî bûye çavkaniyek.

G. Boccacio, bi vê berhema xwe ne tenê li Îtalyayê lê li temamê Ewrûpayê deng vedaye û li nivîskaran bandor kiriye. “Çîrokên Canterbury“ a “Chaucer“ yek ji van mînanan e.

Minakên pêşîn yê çîroka modern di sedsala 19. de li Emerîkayê ji aliyê Irving, Hawthorne, Poe û Mellville ve hatine nivîsîn. Çîrok ji vir û bi şûn de wek cureyeke xweser, cuda û bi tena serê xwe cureyeke pexşanî tê qebûl kirin. Çîrok di wê sedsalê de li Rojavayê pêşketineke mezin bi dest dixwe. Di edebiyata Emerîkî de nivîskarên wek Nathaniel Hawthorne, Mark Twain, O.Henry, Somerset Maugham, Jack London, Katherine Mansfield, Ernest Hemingway; di edebiyata Frensî de Prosper Mérimée; di edebiyata Îngîlîzî de James Joyce; di edebiyata Çekî de Yaroslav Hašek; di edebiyata Rûsî de Puşkin, Gogol, Çehov, Gorki dibin pêşengê çîrokê yên vê sedsalê.

---

<sup>3</sup> Feridun Andaç, Öykü Yazmak Hikaye Anlatmak, Eksik Parça Yayınları, İstanbul, 2017 rp. 52

Heger em bala xwe bidin serpehatiya çîrokê û dîrokçeya wê divê navê gelek çîroknûsan bê hildan. Lê belê em ê tenê bala xwe bidin wan nivîskaran ku hinek ji wan avakarê çîrokê ne û hinek jî çîroknûsiya wan hiştiye ku çîrok bi pêş bikeve û veguhere: N. Gogol, E.A. Poe, Guy de Maupassant, A. Çexov, J. Joyce, F. Kafka, J. L. Borges. Bi alîkariya van navan hem serpehatiya çîrokê hem jî veguherîna wê ya bi demê re ew ê zelaltir xuya bibe.

N.Gogol (1809-1852) bi çîroka xwe ya bi navê “Saqo” (1842) deriyekî nû ji çîrokê re vekir û qedera çîrokê guhert. Bi vê çîroka xwe ne tenê li welatê xwe lê li temamê dinyayê nivîskar di bin bandora xwe de hişt û vê bandorê hişt ku ew peyva bi nav û deng ya “em tev ji saqoyê Gogol derketin.” bê zimên. Gelo Gogol çî kir ku hewqas deng veda û rêyeke nû li pêşiya çîrokê vekir? Bersiva vê pirsê ev e: Mirovê ji rêzê. “Ev tiştê ku Gogol kir giringîyeke bivê nebê ye ji bo çîroka modern. Ji ber heta ku wî ev yek kir tu hebûna çîroka modern, ya ku îro em dizanin, tunebû.”<sup>4</sup> “Ew kesên ku çîroka modern bi wî didin destpêkirin ji ber vê yekê dikin ku “mirovê ji rêzê” cara ewil wî di çîrokê de kiriye leheng.”<sup>5</sup> Berî Gogol lehengên çîrokan kesên qehreman, mezin, naskirî bûn. Lê Gogol memûrekî bi navê Akakî Akakîyevîç ku wenda, belengaz û ji rêzê bû kir lehengekî edebiyatê yê sereke.

Di vê çîroka de qala serpehatiyeke Akakîyevîç tê kirin. Akakîyevîç di jiyanê de ji bilî memûrtiya ku dike tu armanca wî tuneye. Derveyî civakê ye, belengaz e, hebûna wî ne di bala kesekî de ye. Rojekê bi zor û bela ji xwe re saqoyekî distîne. Şevê gava di kolanan de digere çend heb pêxwas saqoyê wî jê distînin. Teva ku diçe gilî dike û serî li çend cihan dide jî ew pêxwas nayên dîtin. Hêviya wî ya dawî ew kes e ku wek “kesê muhîm” tê bi navkirin. Diçe cem wî kesî lê ew kes bi tundî bi wî re dixeyide. Piştî vedigere malê nexweş dikeve û di dawiyê de dimire. Lê çîrok di vir de xelas nabe. Piştî ku Akakîyevîç dimre gote got belav dibin ku xeyaletê li bajêr digere û bi şev saqoyên mirovan ji wan distîne. Ev yek heta bi saqoyê “kesê muhîm” tê dizîn dewam dike.

N. Gogol, ji bilî “Saqo”yê çîrokên bi navê “Rojnivîska Dînekî”, “Poz”, “Fayton” jî nivîsîne û ew çîrok jî minakin hêja ne ji bo çîroka modern. Di van çîrokan de piranî jiyanê memûran a wê serdemê, mirovên ji rêzê ku di nav diranê sîstemê de dihatin hêran, sîstema burokrasiyê ku wek labîrentan bû, bi hosteyî vegêriye.

---

<sup>4</sup> H.E.BATES, 2013 rp. 18

<sup>5</sup> Necip Tosun, Modern Öykü Kuramı, Hece Yayınları, Ankara, 2018 rp. 16

E. A. Poe (1809- 1849) bi Gogol re di heman salê de hatiye dinê. Çîrokên wî li gora yê Gogol ne ji nava jiyânê ne. Wî bêtir bera pê xeyaletan, periyan û bûyerên derasayî daye. Çîrokên wî li dora tirs, kabûs, tawan, mitaleyên de tèn vegeerîn û lehengê wî di tariya şevê de, li giravên bi perî de, di qesrên nepen de û li kolanên bêkes de digerin. Bi van çîrokan dibe pêşengê çîrokên tirsê û bûyerên tawanî. Helbet pêşengtiya wî ya ji bo çîrokê ne ev bi tenê ye. “Qaîdeya destpêk-rûdan-encam’ê cara pêşîn di çîrokên wî de tèn dîtin.”<sup>6</sup>

Mijar û bûyerên derfizîkî bi jiyana rasteqîn ve dihûne. Ev yek jî nêzîktêdayîneke nû ye ji bo çîrokê. Bi van çîrokan diselmîne ku çîrok ji bo qalkirina bûyerên derfizîkî jî guncav e. Ji xwe gava mirov bala xwe dide çîrokên wî, wê yekê aşkere dibîne ku hayê Poe ji pêşketinên zanistî yê wek matematîk, fizîk û derûnnasiyê yê serdema wî heye. Fikir û ramanên wek jiyana piştî mirinê, hipnoz, ruh û perî, hêmanên çîrokî û surreal bi wî re maneyeke nû bi dest xistine. Ji bo vê yekê jî em bi rehetî dikarin bibêjin ku “bi rênîşandariya zanistiyê re rêwîtiya ber bi ruhê mirov kakilê çîrokên wî pêk tînin.”<sup>7</sup> Helbet gava ew qala bûyerên derasayî, xeyaletan, periyan, ruhan dike tiştêkî ji dest bernade, ew tiştê ku bi hosteyî di hemû çîrokên xwe de bi kar aniye, hûnandina bi hevdu re ya rastî û sêwirînê.

Poe, her çiqas bi çîroknûsiya xwe bê nasîn jî di warê teoriya çîrokê de jî xwedî peyv e. Asasekî saxlem a cudatiya çîrokê ya ji helbest û romanê cara pêşîn wî daniye. Ew û Washington Irving ew kesên serekene ku şiklekî taybet û şexsî dane çîrokê. Şayesandina wan ya ji bo çîrokê hema bêje ji aliyê hemû nivîskaran ve hatiye qebûl kirin. “Li gora van nivîskaran ku cara ewil şayesandina çîrokê kirine, destpêkeke ne pir tevlihev a çîrokê heye. Lehengên çîrokan bi piranî bi xwe re ya jî bi kesên din û civakê re dikevin gengeşiyê. Bûyerên ku leheng tev lê dibe digihêje lûtkeyê û çîrok bi veçirandina van bûyeran li cihekê wisa bi dawî dibe ku xwîner ne li bendî tiştêkê wisa ye.”<sup>8</sup>

Teoriya ku Poe ji bo çîrokê aniye ziman em dikarin wek awayê li jêr bi kurtayî rave bikin.

---

<sup>6</sup> Andaç, 2017 rp. 155

<sup>7</sup> Tosun, 2018 rp. 18

<sup>8</sup> ( İmge Alpay, Anton Pavloviç Çehov’un Kısa Öykü Sanatı, Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Yüksek Lisans tezi, 2016)

*“Çîrok li gora Poe:*

1. *Divê wisa bê sêwirandin ku li ser xwîner “bandora tiştêkî bi tenê” bike;*
2. *Ew şewka dramatik ya bi “bandora tiştêkî bi tenê” ku li ser xwîner çê dibe ji bo ku ji aliyê exlaqî ve bibe pêvajoya dirûvdanê divê çîrok bi qasî di carekê de bê xwendin kin be.*
3. *Divê nivîskar, bûyeran, qerekeran û rewşan li derdora “bandora tiştêkî bi tenê” saz bike.*
4. *Di ava kirina “bandora tiştêkî bi tenê” de divê nivîskar zimanekî helbestî bi kar bîne, yanî zimanekî wisa tîr divê bê bikaranîn ku gava ji çîrokê hevokek jî bê derxistin divê çîrok kêmbimîne.”<sup>9</sup>*

Guy de Maupassant (1850-1893) piştî Gogol û Poe di warê çîrokê de yek ji wan kesan e ku herî pir derketiye pêş. Asasê wê çîrokê avêtiye ku îro jî ew şewê çîrok, bi wî tê binavkirin. Çîroka ku îro wek “çîroka bûyerî” tê bi nav kirin ku jê re “Şewaza Maupassant” jî tê gotin şewaza çîroka wî ye. Ew di çîrokên xwe de bera pê beşeke bûyerekê, rewşekê ya jî kêlîkekê nade, ew jiyenek temambûyî radestî xwînerên xwe dike. Ew her bera pê “dawî”yê dide. Ji ber vê jî tiştê ew qal dike ji binyada şeweyê muhimtir e. Mahne aşkere ye. *“Di Berhemên Maupassant de hey li rewşên têkilîdanîna sêwirandî tê vegehrîn. “Çîrokên çarçove” di “conte” û novelayên Maupassant de pir têtin. Di van çîrokan de çîrok di hundirê çîrokeke din de bi cih dibin. Ew kesê ku ew çîroka bi cih kirî vedigêre bang li wî kesî dike ku wê çîrokê dixwîne. Her vegêrek xwediyê yek an çend kes guhdaran e. Di van çîrokan de tiştê girîng ne “peyam”e ya girîng ew e ku çîrok ji aliyê yê hember ve çawa tê hilgirtin û ji “çi dibêje” bêtir “çawa tê dayîn” e.”<sup>10</sup>* Helbet ji bo vê yekê jî mecbûr e ku ew tiştê dixwaze bibêje bide xwendin. Wek çare jî ji bo bigihîje armanca xwe qala wan çîrokan dike ku berê nehatiye qalkirin. Asasê çîrokên xwe li ser surprîzan û bûyerên derasayî ava dike. Ji bo ku xwîner şaş û metel bihêle serî li dawiyên bi surprîz dide. Di baweriya wî de ji bo çîrokê ne tiştên ji rêzê lê tiştên ne ji rêzê bi qîmet e. Ji bo wê jî di çîrokên wî de bûyerên bibandor, rasthatinî, pêrgîhevhatinên bêhimd, bûyerên nepen, dînîtî û xeyalet temayên sereke ne.

<sup>9</sup> Sevinç Sayan Özer, Çağdaş Kısa Öykü Sanatı ve Politikaları, İmge Kitabevi Yayınları, Ankara, 2018 rp. 15

<sup>10</sup> Peter Brooks, Psikanaliz ve Hikaye Anlatıcılığı, Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2016, Wer: Hivren Demir- Atay – Hakan Atay rp. 88



“Rexneya civakî, serhildêrî û daxwaza azadiyê rengvedana çîroknûsiya Maupassant in.”<sup>11</sup> Wî bera pê wê yekê daye ku dijberiya ew tiştên ku civakê ew îdealîze kirine aşkere bike. Keşe, burjûwazî, têkiliyên sexte, bêexlaqî di çîrokên wî de ji ber tîrên wî nefilitîne. Çîrokên Maupassant li derdora temayên wek evîn, ixtiras, tirs û zayendiyê de kom dibin. Di çîroka xwe ya bi navê “Boule de Suif” de durûtiya civakê bi awayekî vekirî aşkere dike. Ew jina ji ber ku fahişetiyê dike wê kêmbûnê, gava li hember qomitanê dagirkeran derdikeve zorê didin wê ku here fahişetiyê bike.

Anton Çexov (1860-1904) bi şêwaza xwe rêyeke nû vekir ji çîrokê re. Bi wê şêwazê di edebiyata cîhanê de hem hebûna xwe da qebûl kirin hem jî alaya çîrokê bilindî lûtkeyê kir. Wî ev yek di wê serdemê de kir ku li welatê wî, li Rûsyayê romanên girîng ji aliyê Dostoyevskî û Tolstoy ve hatibûn-dihatî nivîsandin. Ew ji vê yekê ne tirsîya. Wî bera pê “nû”tiyê da. Şêwazeke nû û têgihîştina hunereke nû ji wî re bûn piştgir û bi ser ket. Gelo çi bû ew şêwaza nû û têgihîştina hunereke nû ku qedr û qîmetê çîrokê bi wan bilindtir bû û navê Çexov ne tenê di edebiyata Rûsî de, di edebiyata cîhanê de jî da nivîsandin? Bi kurtayî em dikarin bibêjin “xwerû bûn” e. Wî çawa peykertiraşek zêdeyiyên mermer jê davêje û peykerekî tîne holê, wisa “zêdeyiyên” vegêranê jê avêtîye û şêwaza xwe ya nû afirandiye. Di serî de ew şayesandinên dûr û dirêj ên xwezayê red kiriye. Wî bera pê wî tiştî daye ku tiştê dixwast qal bike bi kinayî qal bikira. Heta ku karîbe kin bike kin kiriye. Bi hevokên kin û bi ziman û vegêraneke xwerû nivîsiye. Bêyî ku serî li bûyerên derasayî bide, bala xwe dide bandora li ser mirov ya li hember rewşên ji rêzê.

Li gora wî ya girîng bi awayekî zelal qalkirina kakilê bi xwe ye. Ji ber ku ew bi vî rengî nêzîkî qalkirinê dibe hebûna mirov ji bûyer an rewşê zêdetir li pêş e li cem wî. Di çîrokên wî de tiştên derasayî tunene. Çîrokên wî ji dil in, nêzîkî ruhê mirov in û baweriyê bi xwe tînin. Hêlên qels û xurt ên mirovan, ew tiştên ku hêza hebûnê didin mirov û helwesta mirov ya li hember guhertinan bi çîrokên xwe radixe ber çavan.

Çîrokên wî hem ji aliyê temayê ve hem jî ji aliyê qerekeran ve dewlemend in. Gundî, mamûr, hunermend, mamoste, zenaetkar, zarok, ciwan, yextiyar, dewlemend, hejar, bijîşk, dergîstî hin ji wan tîpanin ku di çîrokên wî de tîne xuya kirin. Ev qereker di cihana xwe ya biçûk de ne û di halê xwe yê xwezayî de dijîn. Bi xêra vê

---

<sup>11</sup> Tosun, 2018 rp. 19

nêzîktêdayînê bandora mezin a li ser mirovan a bûyerên biçûk û ji rêzê dahurandiyê çîrokê.

Çexov çîrokên wî xelas nabin. Gava mirov çîrokên wî dixwîne gelek caran ew hîsa “temamnebûyî” bi mirov re çêdibe. Yek ji taybetiya nivîskariya wî ya herî mezin ew e ku anîna nûbûnê ya finala çîrokan e. Ew xwîner dibe cihê heta ku ew ê heriyê û li wira dihêle. Ji wir û pê ve berdewamkirin an jî tamamkirina çîrokê ji xwîner re dihêle. Heger xwîner bixwaze wê çîrokê di zihnê xwe de dikare tamam bike. “Ji ber wê jî mesûliyetê mezin li xwîner bar dike.”<sup>12</sup> Bi vê yekê dizane ji ber wê jî dibêje ku “ew bi xwîner bawer e.”

James Joyce (1882-1941) bi berhema xwe ya bi navê “Dubliners” ku ji panzdeh çîrokan pêk tê dengê nû, “dengê bajêr” daxilî hundirê çîrokê kir. Ji tiştên berbiçav wêdetir mirovên Dublinî yên ji rêzê di çîrokên wî de wek qereker derdikevin pêş. Bi şewaza biyografîk qedera wan portreyan nîşan dide ku mirov Dublinî be û li Dublinê bijî çi tê serê wî.

Di temamê çîrokên wî de temayeke hevpar heye. Çîrokên Joyce teva ku ji hev cuda dikarin bên xwendin jî li gora plansaziya romanekê hatine rêzkirin. Mirov dikare van çîrokan di nav sê beşan de tesnîf bike ku ev beş ji serdemên wek “zarokatî”, “ciwanî” û “gîhaştî- navsere” pêk tên. Bûyerên ku cih digirin li gora taybetiyên her serdemekê hatine vegêrîn. Di çîrokên pêşî de dengê zarokan tê. Her ku bi pêş de dihere temenê qerekeran mezintir dibe, pê re jî şerê wan, fikarên wan jî mezin dibin. Belkî wek îroniyekê be lê navê çîroka dawî jî “Yên Mirî” ye.

Mirovên Dublinî mehkûmî bindestî û felcê ne. Tu rê nemaye ku mirov pê de herin. Di vir de em dikarin bibêjin ku Dublin bi xwe jî felc bûye û rêyeke ku pê de here nemaye. Çawa qerekerên din, keşe, rojnamevan, hunermend, siyasetmedar, mamûr di labîrenta felcbûyî de wenda bûne, felc bûne, qedera Dublinê jî dibe wek a van qerekeran û ew jî ezabê heman felcê dikişîne. “Di çîrokan de wek sedemê van nerêniyan, tûndîtiya dêran, neteweperestiya tûj û malbatên aso teng tên xuaykirin. Dublin wek organîzmayeke ku xerabiyê belav dike tê resimkirin.”<sup>13</sup>

---

<sup>12</sup> BATES, 2013 rp. 37

<sup>13</sup> Tosun, 2018 rp. 23

Joyce bereksî berhemên xwe yên din, “Ulysses” û “Wek Mirovekî Ciwan Portreya Hunermend” , çîrokên xwe bi şêwazeke sade û xwezayî nivîsîne. Ji peyv û şayesandinên xemilandî dûr e. Ev yek jî ji bo çîroknûsiya wî xweseriyekê dide wî. Joyce di çîrokên xwe de atmosfereke xweser ava kiriye. Di avakirina wê atmosferê de ji mûzîkê, ji helbêstê û ji dîmenan sûd wergirtiye.

Joyce têrma “Epîfenya” diyarî teoriya çîrokê kiriye. Joyce têrma “Epîfenyayê” ji bo rewşa “famkirina ji nişka ve ya rastiyeke ya qerekerên wî ew afirandine.”<sup>14</sup> bi kar tîne.

Franz Kafka (1883 – 1924) yek ji wan nivîskaran e ku li ser wî bi hezaran lêkolîn hatine kirin, maqale hatine nivîsîn, tez hatine amadekirin û pirtûk hatine weşandin. Roj bi roj ev hejmar jî zêde dibin. Tenêti, wendabûn, ecziyet û bêçaretiya mirov ya li hember modernîzmê di bin mija atmosfereke kaotîk de, bi bûyerên ku tu carî ronahî nade ser wan, bi lehengên ku bi bayê modernîzmê tîr hîç kirin û tenê di şiklê koleyekê de hebûna wî tê xuya kirin, bi mekanên girtî/zîndanî ku xelasî jê tune ye û bi awayekî serkeftî çîroka xwe ava kiriye. Kafka, “mîrovên robotî yên ji giyanê xwe razberbûyî, bajarên ku ji xwezayê razberbûyî afirandine.”<sup>15</sup> Ji ber wê jî peyvên wek zîndan, biyanîbûn, tîrs, guman, wendabûn kakilên temayên çîrokên wî pêk tînin.

Tevlihevî, nediyarî, muxlaqî, asêbûna mirov a di jiyane de navenda çîrokên wî pêk tînin. Di çîrokên wî de hêma cihekî taybet digirin. Ew “tiş”tên ku di çîrokê de cih digirin, gelek caran dibin hêmayek û di xwezaya wê jiyana nû de cihê tiştekî din digirin. Gelek caran mekan bi xwe jî alîkariya wê vegêranê dikin û ew jî barê hêmayekî hildigirin ser xwe. “Kafka, di çîrokên xwe de vegêrana hêmayî, xeyalî, alegorîk bi kar tîne. ...ceribandîye ku bi hêmayin din şifreyên tevliheviyê bi hêza hunerê mayinde bihêle.”<sup>16</sup> Yanî ji derveyî dinyaya ku heye dinayayeke nû afirandiye û ew dinya bi xwe xwediyê qanûnên xwe ye.

Kafka daye zanîn ku tenêti, biyanîbûn, tengezarî û asêbûna mirovê modern bi çîrokê jî dikare bê dayîn. Lehengên wî axlebe bi rewşeke nû re rû bi rû dimînin. Gava ji bo wê rewşê fam bike dikeve hewldanan di esasê xwe de deriyekî li rewşeke ku nû tê meydanê vedike. Ji ber wê jî dibin wek masiyê ji avê derketî. Der heqê wê rewşa nû de

---

<sup>14</sup> Andaç, 2017 rp. 107

<sup>15</sup> Yıldız Ecevit, Türk Romanında Postmodernist Açılımlar, İletişim Yayınları, İstanbul, 2016 rp. 47

<sup>16</sup> Tosun, 2018 rp. 25

bi tiştêkî nizanin. Di dawiyê de dibin bindestê wî karê ku dikin û tîna girêdan. Wek Gregor Samsa'yê di çîroka "Veguhêrîn"ê de ku serê sibê bi rewşeke nû şiyar dibe. Hewldanên wî tev ji bo wê yekê ne ku ew rewşa nû fam bike. Lê di rastiyê de ew hewldanên wî ne ji xwe tiştê ku çîrokê pêk tînin. Jiyanêke nû kû xwedî zagonên taybet e hem li pêşberî leheng bi xwe ye hem jî li pêşberî xwîner e.

Kafka, bi avakirina vê cihana nû, bi afirandina wê atmosfera di wê cîhanê de, bi bêçaretîya lehengan a di nava wê atmosferê de û bi hebûna wê rewşa kaotîkî ya li ser wan lehengan nêzîktêdayîneke ku bandora xwe li hemû beşên hunerê kiriye/dike jî afirand: "Nêzîktêdayîna Kafkaesque/Kafkaesk"

Jorge Luis Borges (1899 – 1986) bi rêze-çîrokên xwe yên di rojnameya Critica ya Arjantinê de weşiyane ku bi dû re bi navê "Historia Universal de la Infamia" (em dikarin wek "Dîroka Nemerdiya Gerdûn" wergerînin kurmancî) bûye pêşengê rêbaza "Realîzma Efsûnî" di warê edebiyatê de. Nivîskarên piştî wî ku ew rêbaz bi kar anîne wî wek afirînerê wê rêbazê qebûl dikin. Di van çîrokan de leheng lehengên nivîskarên dinê ne ku di çîrokên wan de tîna xuya kirin lê Borges ew leheng jî nû ve afirandine.

Di çîrokên Borges de rastî û xeyal di nav hev de hatine hûnandin. Di navenda çîrokên wî de çand, huner û edebiyat cihekî taybet digirin. Ji ber wê jî lehengên gelek çîrokên wî pirtûk in, nivîskar in û berhemên çandî û hunerî ne. Dîrok, mîtolojî û hêmayên olî ew asas in ku çîrokên wî li ser bilind dibin. Zimanên dinyê, pirtûkên pîroz, mekanên antîk, şexsiyetên dîrokî, peyvên wenda, pirtûkên bi efsûn, gerok, qral di parzûnê wî yên ji xewn û xeyal û rastî û fantazyayan pêk tê re disefin û di demên cuda yê zeman de û li mekanên cuda yê di gerdûnê de li bin guhê hev dikevin. Borges di çîrokên xwe de bûyerên dîrokî, efsaneyan, meseleyan jî nû ve şîrove dike û kirasekî nû li wan dike. Ew wisa bawer dike ku çîrokê bûbe berê bûye. Ji ber wê jî ew difikire ku mirov heman çîrokê jî nû ve lê bi awayekî dinê vedigêre. Ji ber êşên ku mirov dikşîne jî, trajediyên ku diqewimin jî heman êş û trajedî ne. Vê yekê bi yekbûna qedera miravan ve girê dide.

Zimanekî hêmayî bi kar tîne di çîrokên xwe de. Ew çîrokê be ku dikevin nava çîrokê vediguhêrin hêmayekê û temsîliyeta tiştêkî din dikin. Hêmayên wek labîrentê ku di gelek çîrokan de temsîliyeta jiyane dike û ayneyê ku ew jî temsîliyeta parçebûn an jî hev-demiyê dikin di çîrokên wî de gelek tîna bikaranîn. Zeman ne yek parçe û sar û

sekinî ye di çîrokên wî de. Zemanên paralel di cihoka xewn û xeyalên wî de diherikin û xwe digihînin wî zemanî ku çîrok tê de tê nivîsandin. Xeyal û rastî, xewn û fantezi li nav hevdu dikevin û ji wan hem zemanekî nû hem jî zimanekî nû diafire. Di çîroka wî ya bi nav û deng “Alef” de ev yek bi awayekî zelal derdikeve pêş. Di vê çîrokê de vegêr di jêrzemînekê de xalekê dibîne ku temamê xalên gerdûnê di xwe de dihewîne. Gerdûn bi xwe di hundirê wê xalê de veşartîye. Di heman kêlikê de bi milyonan sûretên ji hev cuda, bi milyonan dîmenên ji hev cuda dibîne. Di çîrokê de wisa dibêje: “Min di hundirê çirkeyeke dêwî de bi milyonan çalakî dîtin ku hem nuwaze, hem jî tirsnak bûn. Tu ji van çalakiyan jî bandora xwe li min nekirin bi qasî wê yekê ku teva ku tev di heman mekanî de, di heman xalê de kom bûbûn jî yekê ya din di bin siya xwe de nedihîşt, yekê ya din ne dinixumand. Tiştê ku çavên min didîtin hev-demî bûn. Lê tiştê ku ez ê aniha binivîsim ew ê di hundirê zemên de bên rêzkirin ji ber ku ziman dide rêzkirin.”<sup>17</sup>

Borges, bi ziman, şewaz û naveroka xwe ya di çîrokên xwe de nêzîktêdayîneke edebî ku bi navê wî tê ziman jî afirand. “Şewaza Borgesyan” ji bo wê şewazê tê gotin ku bi şewazeke xweser hêmayan, îroniyan û metaforan di xwe de dihewîne. Heger di metnekî de, teknîka fiksiyonê ji teknîka Borges sûd wergirtibe, binyada wî metnî xwe li ser têgeha labîrentê ava kiribe, di metnê de paradoks serdest be, hêmaya ayneyê hatibe bikaranîn, zeman û hiş parçebûyî be, xeyal û rastî li nav hev ketibe, ew metn wek “Borgesyan” tê bi nav kirin.

---

<sup>17</sup> Jorge Luis Borges, Alef, İletişim Yayınları, İstanbul, 2009, Wer: Fatma Akerson (wergêra çîroka Alefê)

## BEŞA YEKEM

### 1. KURTENÊRÎNEK LI ÇÎROKA KURMANCÎ YA MODERN

Çîrok pexşan e. Li Rojavayê berî ku çîroka modern derkeve holê pexşanê rêya xwe dîtîbû û di gelek cureyên çî edebî çî jî zanistî de dihate bikaranîn. Çîroka modern jî li ser wî esasê hazir lê bû û bi pêş ket. Lê ew derfet ji bo Kurdî tunebû. Ji ber ku di Kurdî de nivîsên pexşanî ancax di serê sedsala bîstan de dest pê kirin û derketin holê. Pexşanên beriya wê serdemê ne berbelav bûn û ancax di dawiya sedsala bîstan de bi awayekî giştî berbelav bûn.

#### 1.1. Pexşan Di Zimanê Kurdî De

Lêkolîneke t êkûz a li ser zimanê Kurdî û pê re jî lêkolîneke t êkûz a li ser edebiyata Kurdî gelekî zehmet e. Ev yek hem bi wê girêdayîye ku Kurd di nav çar dewletan de hatine dabeşkirin hem bi ser de xwedî gelek zaravayan e. Polîtîkayên van dewletan a li hemberî zimanê Kurdî, alfabejên ji hev cuda, sînorên ku ji wextekî pê ve qutbûnên nerîtî bi xwe re anîne tev dibin asteng ku mirov bikarîbe bi giştî lêkolînekê bike. Ji ber van sedeman me teza xwe tenê bi çîroka Kurmancî bi sînor kir.

Hem di nav Kurdan de hem jî di nav ew dewletên ku Kurd di nav wan de hatine dabeşkirin, (Erebî, Farisî û Tirkî) helbest forma serdest a edebiyatê ye heta bi sedsala 19an. Di warê edebiyatê de hema bêje pexşan nehatiye bikaranîn. Pexşana ku hatiye bikaranîn jî ne di warê edebiyatê de yanî ne di warê sêwirandinê de hatiye bikaranîn lê di “nameyan de, seyhatnameyan de, şerha Qur’anê de û di vegotina hin tekstên dîrokî de hatiye bikaranîn.” (Aydoğan 2014: 104)<sup>18</sup> Vê yekê jî kiriye ku wek cûreyeke edebî çîrok bi derengî xuya bike di edebiyata Kurdî de.

Pexşana bi zimanê Kurdî ya pêşîn ku tê zanîn ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye nivîsîn. Ziya Avcî di pêşgotina xwe ya bi navê “*Agahdariyeke Kurt Di Der Barê Vê Berhemê De*” ya pirtûka “*Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*” ya Mela Mehmûdê Bazîdî de li ser van hikayetan wisa dibêje: “Ev çil hikayetên han ên ji aliyê Mele Mehmûdê Bazîdî ve hatine nivîsandin, çend libên destpêkî yên di der barê tamahî û çikosiya mela û kesên xwenda de hatine nivîsandin ne tê de, piraniya wan

---

<sup>18</sup> Îbrahîm Seydo Aydoğan, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weşanên Rûpel, Stenbol, 2014

behsa bûyerên ku di dîroka me de qewimî ne dikin.” (Bazîdî 2010: 7) <sup>19</sup> Di vê derê de tiştê bala me dikşîne ew e ku ev hikayetên ku hatine nivîsîn ne ji sêwirandinekê hatine zayîn. Yanî em nikarin ji wan re bibêjin ku îşaretên fiksîyonî di xwe de dihewînin. Bazîdî di van hikayetan de rasterast bûyerên ku qewimî ne nivîsandine. Di vira de em dikarin bibêjin ku ev hikeyetên ku bûyeran ji xwe re dikin alav hinin ji wan bûyeran belkî rasterast Bazîdî bi xwe bûye şahidên wan an jî ji devê hinin din bihîstine û ew neqil kirine. Bûyerên hin çîrokên din jî ji xwe di nav gel de hebûne û Bazîdî dîsa ew neqil kirine û kiriye malê hikayetên xwe. Ziya Avcî dîsa di heman pêşgotinê de di der heqê van çîrokan de wisa dibêje:

*“Eger em van hikayetan bi awakî gelek giştî tesnîf bikin, ev tabloya han derkeve: Hikayetên 1-4an, wekî me li jorê got, di der barê tamahiya malê dinê û çikosiya mela û xwendevanan yên di nav xelkê de tîn gotin de ne. Hikayetên 5,6,9,10,14,15,16,20,21,27,32,34,38 û 39’an, raste rast bûyerên dîrokî yên li Kurdistanê qewimî ne. Ez di netîceya lêkolîna yek bi yek di der barê van hikayetan de gihîştim vê geneetê. ... Hikayeta 12’an di der barê serpêhatiyê evîniyê ku li Kurdistanê gelek belav e de ye, yanî li ser evîniya Hesên Axa û Lalîxana Goveyî de ye. Ya 13’an bi varyant û naveke cihê, di der barê serpêhatiya bûyera evîniyê ya Siyabend û Xecê de ye. Hikayetên din jî, di der barê bûyerên civakî yên di nav gel de yên wekî dizîya dêran, şelandin, kuştinên li ser meseleya namûsê û yên wekî wan de ne ku dixuye piraniya wan rast in, di nav xelkê de hatine gotin û Mele Mehmûd jî ew berhev kirine û nivîsnadine.”<sup>20</sup>*

Haşim Ahmedzade jî bi heman nêzîktêdayinê nêzîkî van çîrokan dibe. Di baweriya wî de ev çîrokên Bazîdî ji taybetmendiyên tîpîk ên cureya çîrokê bêpar in. (Ahmedzade 2004: 191)<sup>21</sup> Wek di dirokçeya çîrokê de jî me anîbû ziman çîrok, bi piştgiriya çavdêriyekê, ya jî sêwirandinekê re vegêrana beşeke bûyerekê, rewşekê ya jî kêlîkekê ye. Em van taybetmendiyên di çîroka Bazîdî de nabînin. Di der heqê cudatiya vê yekê de Ferîdûn Andaç nirxandineke zelal kiriye. Andaç dibêje: “Hikayet ne çîrok e, çîrok jî ne hikayet. Yek di derbarê peyvê/qalkirênê de ye ya din di derbarê

<sup>19</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, Camî’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, Weşanên Lîs, Amed, 2010, Amadekar: Ziya Avcî

<sup>20</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, Camî’eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî, Weşanên Lîs, Amed, 2010, Amadekar: Ziya Avcî

<sup>21</sup> Haşim Ahmedzade, Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma, Wer: Azad Zana Gündoğan, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004

nivîs/ziman/sêwirandin (fiksîyon) ê de ye. (Andaç 2017: 11) <sup>22</sup> Ji ber van sedeman jî em nikarin bibêjin ku ev hikayetên Bazîdî çîrokên modern ên pêşîn ên edebiyata Kurmancî ne.

Nivîsandina çîrokê ya bi zimanekî bi derfet û çalakiya wî zimanî ve girêdayî ye. Helbet qesta me jî çîrokê, çîroka modern e. Heger di zimanekî de derfet û bingeheke ku çîrok karîbe li ser bilind bibe hebe wê gavê çîrok di wî zimanî de jî xwe re rêyekê dibîne û derbasî nava wî zimanî dibe. Di zimanê Kurdî de heta bi sedsala 19an jî ew derfet û bingeha ku çîrok karîbe li ser bilind bibe tunebû. Çîrok pexşan e, ji bo ku di zimanekî de, di vî warî de rêyekê jî xwe re bibîne divê bingeheke pexşanî ya wî zimanî jî hebe. Kurdî ew derfet ancax di dawiya sedsala 19'an de dît. Di sala 1898an de bi derketina rojnameya “Kurdistan”ê re di zimanê Kurdî de mînakên pêşîn ên pexşanî hatin xuya kirin. Nivîsên siyasî û edebî yê di vî rojnameyê de hatin weşandin û belavkirin deriyekî nû jî vekir di avakirina edebiyata Kurdî de. Ferhat Shakely di pirtûka xwe ya bi navê “*Modern Kürt Öykü Sanatı*” de der heqê karîgeriya rojnameya “*Kurdistan*”ê de dibêje “Du erkên taybet ên rojnamegeriya kurdî hebû. Ji alîkî ve bi pêşxistina jiyana polîtîk û îdeolojîk ve belavkirina hişmendiya neteweyî, pê re jî armanca pêşxistina çand û zimanê Kurdî. Derketina holê ya hunera çîroka Kurdî rasterast bi rojnamegeriya Kurdî ve têkildar e.”<sup>23</sup> Mehmed Uzun girîngiya vî rojnameyê bi pêşdetir dixê. Li gora Uzun ev rojname “ji bo ziman û edebiyata Kurdî destpêka serdemeke nû û nîşana şewaza vegêraneke edebî ya nû û modern e.”<sup>24</sup> Her çiqas zêde berdewam nekiribe jî (1898-1902) bingeheke hatibû danîn. (Di vir de her çiqasî Mela Mehmûdê Bazîdî berî rojnameya Kurdistanê di warê pexşanê de berhem dabe jî, ji ber ku heta bi dawiya sedsala 20î hayê kesekî zêde jê tunebû mirov nikare wek bingehe wî qebûl bike.)

## 1.2. Çîroka Kurmancî Ya Modern

Çîroka Kurmancî piştî derketina holê ya pexşana Kurdî nimûneya xwe ya pêşîn da. Derfetên wek derxistina kovar û rojnameyan ew rêya çîroka modern jî nivîskarên Kurd re jî vekir. Ji ber ku Kurd di nav çar dewletan de hatine dabeşkirin û ji ber ku li her beşekî zimanekî cuda û pergaleke rêvebirî ya cuda heye, çîroka Kurdî jî li gor

<sup>22</sup> Feridun Andaç, *Öykü Yazmak Hikaye Anlatmak*, Eksik Parça Yayınları, İstanbul, 2017

<sup>23</sup> Ferhad Shakely, *Modern Kürt Öykü Sanatı*, wer: Rohat Alakom, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998 rp. 12

<sup>24</sup> Mehmed Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2006 rp. 74



derfetên heyî ji xwe re rêyek ajotiye û gelek caran bêyî ku hayê beşekî ji yê din hebe ev pêşketin dewam kiriye. Ji ber vê sedemê gava em çîroka modern a Kurdî binirxînin divê em yek bi yek li wan beşan binerin ku çîroka Kurdî tê de xwe ava kiriye.

### 1.2.1. Yekemîn Çîroka Modern a Kurdî

Komeleyên Kurdan di serê sedsala 20î de ji hêla rewşenbîr û zanayên wê serdemê ve hatin damezirandin. Ew rewşenbîr û zanayên ku berî îlankirina Meşrûtiyeta 2. gelek ji wan hatibûn sirgûnkirin, bi îlana Meşrûtiyeta 2. dîsa li Stenbolê veşeriyên û dest bi çalakiyên komelî û rewşenbîrî û edebî kirin. Komeleya bi navê “Kurd Teavun ve Terakki Cemiyeti” di sala 1908’an de vebû. Vê komeleyê bi navê “*Kurd Teavûn ve Terakki Gazetesi*” rojnameyek jî derdixist ku ev rojname li bajarên Kurd jî dihat belavkirin. Ev komele û pê re jî rojnameya wê piştî bi salekê tîn girtin. Piştî vê komeleyê, komelenin din vedibin li Stenbolê. “Hêvî” yek ji van komeleyan e û di sala 1912an de vebûye. Wek komeleya xwendekarên Kurd tê naskirin. Vê komeleyê bi navê “*Rojî Kurd*” kovarek jî derdixist. Ev kovar çar hejmar hatiye derxistin. Di her du hejmarên pêşîn ên “*Rojî Kurd*”ê de nivîskarê kovarê û yek ji damezirînerê komeleyê yê bi navê “Fû’ad Temo” çîrokeke bi navê “*Çîrok*” daye weşandin. Ev çîrok di dîroka çîroknûsiya Kurmancî de wek çîroka yekemîn a modern hatiye qebûlkirin. Îrfan Amîda di der heqê sedema qebûlkirina modernbûna vê çîrokê de wisa dibêje: “Di vê çîrokê de cara yekem karaktereke ji rêzê angî ji nav gel dibe lehengê çîrokê û wêje bi derd û kulên gel, bi jiyana rojane dadikeve, dibe perçeyeke jiyana gel. Bi zimanê gel ji gel re gel bi xwe veibêje. Di wêjeya klasîk an jî di wêjeya devkî de mirov pêrgî vî tiştî nayê.”<sup>25</sup>

Helbet dema ku ev çîrok hate weşandin “*Saqo*”yê Gogol ji zû ve li dinyê belav bûbû, şewaza Poe ya nû li ber çîroknûsiya modern deriyên nû vekiribû, Maupassant û Çexov du şewazên ku bi navê wan dihatin naskirin diyarî çîroknûsiya cihanê kiribûn, nivîskarên Rojavayî xwe li deriyên nû yên şewaz û vegêrana çîrokê diqelibandin û ceribandînen nû dikirin, ji çîroka modern re bingeheke xurt a teorîk hatibû danîn. Piştî hewqas pêşkatina çîrokê jî weşnadina yekemîn çîroka Kurdî helbet girîng e. Wek me li jorê jî got nivîsandina çîrokê ya bi zimanekî bi derfet û çalakiya wî zimanî ve girêdayî ye. Zimanê Kurdî wê serdemê bê derfet bû. Rewşenbîr û xwendeyên kurd berhemên

<sup>25</sup> Îrfan Amîda, Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2016, rp. 127

xwe bi zimanê tirkî didan. Ji ber vê yekê jî zimanê Kurdî ne çalak bû bi qasî em karîbin bi zimanên din re berhev bikin di warê berhemdayînê de. Ji ber wê jî ancax “Çîrok” di sala 1913an de hatiye nivîsîn. Bi ser de jî zimanê Tirkî ku wê serdemê serdestê zimanên din ên di nava rewşenbîriya Osmanî de ye hîna nû nû berhemên xwe yê pêşîn didin di warê çîroknûsiya modern de. Îhtîmal e ku nivîskarên kurd çîroka modern di ser çîroka tirkî re nas kirine. Shakely neqil dike ku Marûf Xeznedar der heqê vê yekê de wisa difikire: “Çîroka yekemîn a Kurdî, zemanê ku piştî Herba Cîhanê ya Yekemîn dihat nivîsandin, tecrûbeyeke çîroknûsan a çîroknivîsandinê tunebû. Çavkaniyên zanyariyên wan, bi taybetî li Başûr, ew çîrok in ku ya bi Tirkî hatine nivîsîn an jî ji zimanên Ewrûpî li Tirkî hatine wergerandin.”<sup>26</sup>

Ev çîrok nîvco maye û temam nebûye. Di dawiya beşa wê ya di hejmara duyemîn ya kovarê de “Dawî heye”<sup>27</sup> hatiye nivîsîn. Teva ku piştî wê du hejmarên din ên kovarê çap bûye jî dewama çîrokê nehatiye. Ev nîvcomayîn hinekî qedera ziman û edebiyata Kurdî û pêre jî çîroknûsiya Kurmancî berbiçav dike. Zimanekî ku di nava çar dewlet û sê zimanên serdest de roj bi roj dor lê tê tengkirin di warê çîroka modern û çîroknûsiya zimanê Kurdî de piştî xwe dide wê çîrokê ku nîvco maye û bi dawî nebûye.

Wek me li jorê jî got navê yekemîn çîroka modern a zimanê Kurdî “Çîrok” e. Ev çîrok qala jiyana zarokekî deh salî yê bi navê Şewêş û bavê wî yê şivan dike. Şewêş diya xwe nediyê. Ew û bavê xwe yê reben û belengaz in. Feqîr in û tiştêkî wan tune. Meteke wî ya pîr heye. Şewêş tu teşqeleya dernaxe, ji hevalên xwe re baş e û tu carî dilê wan nahêle û bêdeng e. Ji ber van xisûsiyetên wî gundî jê hez dikin û qîmetê didin wî. Rîspiyê gund her roj wî dibe mala xwe û xwarinê dide. Bavê wî her êvar ji ber pez vedigere û Şewêş jî diçe pêşiya wî û destê wî maçî dike. Êvarekê bavê wî dereng dimîne. Tarî dikeve erdê û Şewêş hîna li benda wî ye. Ji bo bavê xwe digirî û di xew re diçe. Şewêş bi dengê pez re şiyar dibe. Bang bavê xwe dike û ber wî ve baz dide. Ji bavê xwe dipirse ku çima dereng maye, bavê wî dibêje pez têr nexwaribû û ez hinekî betilî bûm. Ji ber wê ez dereng hatim. Ev yek wek elameta nexweşiya bav xuya dike di çîrokê de. Ji ber ku serê sibê bavê wî di xew de dimîne. Bavê wî nexweş dikeve. Gava rîspî tê li derî dixê ji bo bipirse bê çima wisa dereng maye nikare rabe here derî veke. Şewêş li ber wî dikeve û bi ser wî de digirî. Rîspî wî teselî dike û dibe mala xwe nan

<sup>26</sup> Ferhad Shakely, Modern Kürt Öykü Sanatı, wer: Rohat Alakom, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998 rp. 25

<sup>27</sup> Rojî Kurd 1913, Amadekar: Koma Xebatên Kurdolojiyê, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, rp. 156

dide wî. Ji bo bavê wî jî hinek xawrin dide destê wî û wî temî dike ku bi ya bavê xwe bike û dilê wî nehêle. Çîrok di vir de diqede.

“Çîrok” him wek şewaz û him wek teknîk di nava pexşana Kurdî de nû ye. Helbet ev nûbûn bi xwe dibe sedem ku ev çîrok bibe destpêka serdemekê û bibe yekemîn metna cureyeke edebiyatê ya bi zimanê Kurdî. Tiştê ku qîmetê dide vê çîrokê ji naverok, vegêrîn û fiksiyona wê zêdetir ev xisûsiyetên wê ne. Li gora Mehmed Uzun hevokên kurt ên vê çîrokê heman awayî xurt in jî. Vegêrana wê ya hisî û sadebûna wê vê çîrokê dike çîrokeke baş. Ji ber van nîşanên di xwe de dihevine pesnê wê dide. Ew dibêje “Vegêrana wê bibandor e û zimanê wê jî bi têra xwe edebî û xweş e.”<sup>28</sup> Lê Ferhad Shakely bi awayekî din nêzikî wê dibe. Sahkely qet wê naecibîne û di baweriya wî de tiştêkî ku ev çîrok bide çîroknûsiya Kurdî tuneye. Ew dibêje ku “ev çîrok bi her awayî metnekî xerab e, qîmeta wê ji ber wê ye ku çîroka pêşîn a hatiye weşandin e. Ji aliyê din ve tiştêkî nade çîroknûsiya Kurdî.”<sup>29</sup>

Em qîma xwe pê bînin an neyînî di çarçoveya taybetiyên çîroka modern de yekemîn çîroka Kurdî “Çîrok” e. Tiştê jê xerabtir jî ew e ku ev çîrok, ji bo Kurmancî û li Bakur, heta bi sala 1979an jî her yekemîn çîrok dimîne. Di du hejmarên *Rojî Kurdê* yê piştî “Çîrok”ê hatine weşandin de, di *Hetawî Kurdê* (1913-1914, 10 Hejmar) de, di *Yekbûnê* (1913) de, di *Jînê* (1918-1919, 25 Hejmar) de em rastî çîrokeke din nayên. Helbet Herba Cîhanê ya Yekemîn, zordestiya desthilatdariya Îttihat ve Terakki Partisi’yê, rûdanên nû yê polîtîk û sosyolojîk, avabûna komara Tirkiyeyê, nêzîktêdayîna Kemalîzmê ya li hember zimanên ji bilî Tirkî, serhidana Şêx Seîd, serhildana Agiriyê tevan em dikarin wek bendên li hember pêşketina ziman û edebiyata Kurdî û bi taybetî jî çîroknivîsiya Kurdî rêz bikin. Di van şert û mercan de ne weşanên Kurdî bi rêk û pêk derfet dîtin ku biweşin, ne jî nivîskarên Kurd ew rê dîtin ku karîbin azadane berhemên xwe biafirînin.

Ji ber van sedemên jorîn edebiyata Kurdî ya modern wek çawa di destpêkê de, yanî di dawîya sedsala 19an û di serê sedsala 20î de li derveyî Kurdistanê, li derveyî axa xwe kok veda, di berdewamiya xwe de jî derfet nedî ku li ser axa xwe şax vede. Piştî avabûna komara Tirkiyeyê û li dû wê jî bi serhildana Şêx Seîd re nivîskar, zana û

<sup>28</sup> Mehmed Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2006 rp. 75

<sup>29</sup> Ferhad Shakely, *Modern Kürt Öykü Sanatı*, wer: Rohat Alakom, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998 rp. 27

rewşenbîrên Kurd neçar man ku li derveyî welatê xwe xebatên xwe yên siyasî, rewşenbîrî û edebî bimeşînin.

### 1.2.2. Çîroka Modern a Kurmancî Di Hawarê De

*Kovara Hawarê* di sala 1932an de li Şamê dest bi weşana xwe kir. Hejmara pêşîn di 15 Gulana 1932an de derket. Pêşeng, avakar û xwediyê wê Celadet Alî Bedirxan e. *Kovara Hawarê* him ji hêla ziman ve him jî ji hêla edebiyatê ve stûneke saxlem, bingeheke saxlem a zimanê Kurdî –Kurmancî- ye. Berî *Hawarê*, *Rojnameya Kurdistanê*, *Kurd Teavûn ve Terakki Gazetesiyê*, *Rojî Kurdê*, *Hetawî Kurdê*, *Yekbûnê*, *Jînê* bingehek danîbûn di warê pexşan, rêziman, helbest û şanoyê de. Lê tu ji van weşanan yekê wextekî dirêj dewam nekirin, nerîteke giştî ava nekirin û derneketin ji derveyî ew çend kesên ku di van weşanên navborî de dinivîsandin û bi awayekî berbelav nebûn afirînerên nivîskarên nû. *Kovara Hawarê* ev yek pêk anî. Him di warê afirandina wêjeya modern de, him di warê afirandina nivîskarên nû de û him jî ji aliyê afirandina tradîsyonekê de roleke sereke list.

*Kovara Hawarê* dijberî wan kovar û rojnameyên berî xwe cih nedaye zimanê Tirkî. Vê yekê jî kiriye ku nivîskarên Kurd di ser zimanê Kurdî re berhemên xwe bidin û nivîsandin û derbirîna bi zimanê Kurdî di nav nivîskarên Kurd de bibe wek adetê û pê re jî hiştiye ku nivîskarên nû yên bi zimanê Kurdî dinivîsînin zêdetir bibe. Vê adetê bi xwe re nerîtek jî ava kiriye û hiştiye ku di gelek cureyên edebî de berhemên bî dayîn û belavkîrin. “Hejmara nivîskarên ku di *Hawarê* de xuya dibin nêzî 60î ye û ji hejmara nivîskarên weşanên Kurdî yên berî xwe pirr bilindtir e.”<sup>30</sup> Helbet divê em li vira wê tespîtê jî bikin ku di esasê xwe de ev hejmara nivîskaran ji vê hejmarê zêdetir e. Îbrahîm Seydo Aydogan diyar dike ku hejmara nivîskarên ku di *Hawarê* de hene bi giştî 88 heb in.<sup>31</sup> Ji ber ku Celadet Alî Bedirxan bi gelek kodnavên cuda nivîsandiye ku Aydogan vê hejmarê wek 33 kodnavên cuda diyar dike, ew kodnavanan ne wek kesên cuda lê wek yekî hatine hesabkîrin. Ev hejmara nivîskaran bi tenê jî dide xuya kirin ku êdî nivîskariya bi zimanê Kurdî buyê tevgereke bi giştî. Weşanên berî *Hawarê* tenê bi kesan ve girêdayî bûn û ew kes bi sînor bûn.

<sup>30</sup> Îbrahîm Seydo Aydogan, *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weşanên Rûpel, Stenbol, 2014, rp. 87-88

<sup>31</sup> H.b rp. 88

Em rastî gelek cureyên edebiyatê tên di 57 hejmarên *Kovara Hawarê* de. Helbest, çîrok, nivîsar, name, şano, bîranîn, folklor, werger, danasîn, dîrok, erdnîgarî û hwd. Ji ber ku em di ser çîroka modern a di edebiyata Kurmancî re dimeşin ev cureyên din ew ê nebin mijara lêkolîna me. Çîroka modern yek ji stûnekî girîng û bingeînê avahiya *Kovara Hawarê* ye. Di bawerîya me de sedema herî girîng ya vê fikirê ew e ku çîrok him ji bo avakirina hişmendiyê neteweyî alaveke kêrhatiyê him jî ji bo belavkirin, eşkerekirin û berbiçavkirina baweriyekê yan jî îdeolojiyekê rêyê hêsan û kêrhatî ye. Em vê yekê ji ber wê sedemê dibêjin ku *Kovara Hawarê* hîna di hejmara xwe ya yekemîn de aniye ziman ku ew ê ji siyasetê dûr be. “Wê dê wêjeya Kurdî ya gelerî berhev bikiraya û alîkariya hezkirina zimanê kurdî bikiraya û hewl bidaya ku wêjeyê kurdî ya xurt peyda bibûya. ... *Hawarê* gotibû ku ji bilî karên huner, wêjê û zimani, wê dê qet guh nedaya warên din.”<sup>32</sup> Bi heman rengî Ronayî Önen di maqaleya xwe ya bi navê “*Dilde Bir Modernleşme Öyküsü Celadet Bedirxan’ın Alfabe Serüveni*” (Çîrokeke Modernezîbûna Di Zimên De Serpêhatiya Alfabeyê ya Celadet Bedirxan) de ji Firat Cewerî neqil dike ku Celadet Bedirxan armanca derxistina kovarê wisa beyan dike; “Pêşdexistina çand û nasnameya Kurdî, ji bo bi awayekî berbelav bê bikaranîn pêşdexistina alfabeya Kurdî, pêşdexistina rêzimana Kurdî, weşandina berhem û lêkolînên berhemên klasîk, folklorîk û etnografîk ên Kurdî û weşandina lêkolînên di derbarê dîrok û erdnîgariya Kurdan de.”<sup>33</sup>

Him di serhildana Şêx Sêid de him jî di serhildana Agiriyê de sedemên sereke yê têkçûyîna ew bûn ku tifaqê geşî ya Kurdan çêbûbû û xayîntî bi hevdu re kiribûn. Celadet Alî Bedirxan piştî van serhildanan ku di serhildana Agiriyê de Celadet Alî Bedirxan bi xwe jî di komîteya biryardayînê de bû, gihaşt wê baweriyê ku heta zanîneke bi geşî, hişyariyê bi geşî û têgihîştineke bi geşî çêbûya ew ê bi ser neketina. Bi ser de jî Sûriyê wê demê di destê Fransîyan de bû û heger bi tevgerê siyasî hereket bikira dibû ku ew îmkân nedana wî ku karîbe kovarê derxîne. Di encama van îhtimalan de ji bo ku karîbin ew hişmendîya ku dixwastin ava bikin, ew neteweperwerîya dixwastin saz bikin, ew îdeolojiya ku dixwastin belav bikin fikir û nerînên xwe ne bi gotar û nivîsarên siyasî lê bi çîrok nivîsandinê anîn ziman.

---

<sup>32</sup> H.b rp. 89

<sup>33</sup> Ronayî Önen, *Dilde Bir Modernleşme Öyküsü Celadet Bedirxan’ın Alfabe Serüveni*, Kürt Tarihi Dergisi, Sayı: 25, 2016 rp.41

Ferhad Pîrbal di gotareke xwe de, ya di sala 1994an çap bûye, dibêje di *Kovara Hawarê* de 69 çîrok hatine weşandin.<sup>34</sup> Helbet ev çîrok tev ne ew çîrok in ku em wan wek çîroka modern pênase bikin. Hinin ji van çîrokan çîrokên gelerî ne û nedibû ku em wan wek çîroka modern qebûl bikin. Hinin ji wan rasterast bîranînên nivîskarên xwe ne û di çarçoveya hunera çîroka modern de bi cih nedibûn. Hinin ji wan di nava nivîseke danasînê de hatibûn bi cih kirin û nedibû ku em wan wek çîrokeke serbixwe qebûl bikin. Hinin jî ew meselok bûn ku di nava gel de ji xwe hebûn nivîskar tenê ew neqil kiribûn. Di beşa Analîza Çîrokên Hawarê de sedemên van yekan hatiye destnîşankirin. Çîrokên ku me ew di çarçoveya çîroka modern de tespît kirine bi temamî 50 heb in. Di vê tespîtê de me tenê çîrokên telîf li ber çav girtin. Çîrokên ku werger in û hatine weşandin û çîrokên ku hatine eşkerekirin ku adaptasyon in û hatine weşandin me li ber çavan negirtine.

**Tablo1:** Çîrokên di *Kovara Hawarê* de Hatine Weşandin

Hejmar	Nivîskar	Hejmara Çîrokan
1.	Celadet Alî Bedirxan	10
2.	Kamiran Alî Bedirxan	8
3.	Osman Sebrî	8
4.	Qedrî Can	7
5.	Nûredîn Zaza	5
6.	Cemîlê Haco	2
7.	Ş. Hesên	2
8.	Sibhî Resûl	1
9.	Fiad Cemîl Paşa	1
10.	Telet Qedîr Hec Elî Begzade	1
11.	Derketîkî Dêrsîmî	1
12.	Cegerxwîn	1
13.	Dilistan	1
14.	Şêx Abid	1
15.	M. Emîn Silêman	1

<sup>34</sup> Ferhad Pîrbal, Bibliografya û Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû, Kovara Nûdem, Hejmar 11, Sweden, 1994 rp. 102

Di 11 sal û 57 hejmarên *Kovara Hawarê* de 15 nivîskaran ew çîrok nivîsandine ku em wan di çarçoveya çîroka modern de qebûl dikin. Ji van nivîskaran Celadet Alî Bedirxan bi 10 çîrokan serî dikişîne. Di pey wî re Kamiran Alî Bedirxan û Osman Sebrî ne ku her yekî ji wan 8 çîrok nivîsandine. Her weha Qedrî Can bi 7, Nûredîn Zaza jî bi 5 çîrokan serkêşîya çîrokê ya di *Hawarê* de kirine.

Wek me li jorê jî got *Kovara Hawarê* çawa bingeha çîroknûsiya Kurmancî daniye her weha wê nerîtek jî ava kiriye. Hinin nivîskar di *Kovara Hawarê* de tenê bi çîrokekê xuya bûne û jê pê ve hew xuyabûne. Lê hinin nivîskarên ku di *Hawarê* de çîrok nivîsandine, di kovarên piştî *Hawarê* weşiyane de jî nivîsandina çîrokê berdewam kirine. Bi ser de di kovarên piştî *Hawarê* de hin nivîskarên nû xuya dibin ku wan jî dest bi nivîsandina çîrokê kiriye. Ev yek jî dibe selmandina ew nerîna me ya ku em dibêjin *Kovara Hawarê* nerîtek ava kiriye. Yek ji çîroknûsên *Hawarê* Osman Sebrî di *Kovara Ronahiyê* de jî çîrok nivîsandine. Yekî din Qedrî Can him di *Kovara Ronahiyê* de him jî di *Kovara Roja Nû* de çîrok nivîsandine. Her weha Cemîlê Haco jî piştî *Hawarê* di *Ronahiyê* de jî nivîsandiye.

Ferhad Pîrbal di gotara xwe ya bi navê “*Bibliografya û Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû*” de dide zanîn ku di *Kovara Ronahiyê* de 41 çîrokên hunerî hatine nivîsîn. Her weha dîsa di heman gotarê de dibêje di *Kovara Roja Nû* de jî 19 çîrok hatine weşandin. Heger em tevan têxin ser hev bi ser sed çîrokî dikin ku ev hejmar ne hejmareke hindik e. Bi ser de jî divê em ji bîra nekin ku di nav van nivîskaran de ji bilî Celadet û Kamiran Alî Bedirxan pê ve tu paşxaneyeke yekî ji wan a nivîskariyê tune. Van nivîskaran bi van kovaran re û gelekên wan jî bi piştgirî û teşwîqkirina Celadet Alî Bedirxan re dest bi nivîsandinê kirine. Ji ber vê jî asteke kûr ya xeyalî di afirandina çîrokên van çîroknûsan de xuya nake. Ji serpehatî û bîranînên xwe sûd wergirtine. Temayên çîrokên wan bela wela ne. Di piraniya çîrokên wan de ew xem heye ku peyamekê bidin. Ji xwe me di serî de jî gotibû çîrok ji bo dayîna peyaman û ji bo avakirina hişmendiyeke ku dil dixwaze bike alaveke kêrhatî ye. Nivîskarên van çîrokan jî bi wê mîsyonê tevgeriyane û di heman çîrokê de xwastine gelek tiştan bibêjin.

Çîrok û çîroknûsiya di kovarên wek *Hawarê*, *Ronahiyê* û *Roja Nû* de ji bo serdema xwe her çiqas girîng û hêja bin jî, her çiqas em îro wek bingeh û destpêka çîroka modern a Kurmancî qebûl dikin jî divê em vê yekê jî qebûl bikin ku heta bi demeke nêzîk jî nivîskarên Kurd hay ji van çîrokan tunebû. Ew kesê ku hayê wî jê hebû

jî ew çîrok nexwendibûn. Piştî ku ji hêla *Weşanxaneya Nûdemê* ve hemû hejmarên *Kovara Hawarê* di sala 1998an de li Stockholmê hat çap kirin û belavkirin hîna nû bi awayekî erênî sûd ji wan çîrokan hat wergirtin.

### 1.2.3. Çîroka Kurdî Di Bin Sîwana Fermiyetê De

Li Başûr çîroka pêşîn ji aliyê Cemîl Saîb ve hatiye nivîsîn. Navê çîrokê *Le Xewma* ye. Ev çîrok wek 23 beş û di du rojnameyên cuda, *Jîyanawa* û *Jiyanê* de hatiye weşandin. Li dû *Çîroka* Fuad Temo ew çîrok e ku di xwe de taybetiyên sereke yê hunera çîroka modern dihewîne. Ji hêla wê ya taybetî ve em dikarin bibêjin ku çîroka pêşî ya modern e ku huneriya çîrokê tê de serdest e.

Ev çîrok bi naveroka xwe ve rexneyî ye ku li hember qralê kurd Şêx Mehmûd û îktîdara wî ye. Wê serdemê wek serdemêke bi xwînî û desthilatdariyê jî wek desthilatdariyeke dîktatorî nîşan dide. Qedera vê çîrokê jî wek qedera *Çîroka* Fuad Temo ye û ew jî nîvce maye.

Piştî wê di navbera salên 1927-28an de Ahmed Muxtar Caf çîroka bi navê *Meseley Wijdan* nivîsiye. Ev çîrok heta bi sala 1970î jî wek destxet maye û ancax wê salê çap bûye. Her çiqasî sûdgirtina ji wê dereng be jî ji ber nivîsandina dîroka wê xwedî qîmet e ev çîrok. Ev çîrok jî temam nebûye.

Naveroka vê çîrokê dîsa li ser desthilatdariya wê serdemê ye ku teqabulî piştî ketina hikûmeta Şêx Mehmûd dike. “Rexneyên tund li berpirsiyaran û desthilatdariyê dike. Piştî ketina hikûmeta Şêx Mehmûd, pergala burokratîk a riziyayî ya ku ji terefi Îngîzan ve hatibû avakirin radixe ber çavan û mehkûm dike.”<sup>35</sup>

Çîroka bi navê *Awatî Dil* ku ji aliyê Pîremêrd ve hatiye nivîsîn heman qedera çîrokên berî xwe dişopîne û ew jî nîvce dimîne. Di sala 1933an de di sê hejmarên kovara *Jiyanê* de hatiye weşandin û dewama wê nehatiye.

Bi derketina kovara *Gelawêjê* ya di sala 1939an de li Başûr pêşketineke mezin çêbû di warê çîrokê de. Bi *Gelawêjê* re temekekî xurt ê çîrokê hate avêtin. Teva ku giringî daye çîrokên nivîskarên nû jî di warê wergera çîroka cîhanê de zêdetir derdikeve pêş. Gava di sala 1949an de di dehsaliya xwe de dest ji weşanê berdide 105 hejmaran li

---

<sup>35</sup> Ferhad Shakely, *Modern Kürt Öykü Sanatı*, Wer: Rohat Alakom, *Weşanên Avesta*, İstanbul, 1998 Rp. 29



dû xwe dihele. Di van hejmaran de li ser hev 114 heb çîrok hatine weşandin. “Ji vana 82 heb werger in û 32 heb jî ji hêla nivîskarên Kurd ve hatine nivîsîn.”<sup>36</sup>

Li Kurdistana Iraqê zimanê Kurdî piştî salên 1930î dibe zimanê fermî. Bi ser de jî li dibistanan perwerdehî bi zimanê Kurdî dibe. Ev yek him di hêla pêşketina ziman de bandora xwe heye him jî di hêla berhemdayînê de. Gava bi awayekî giştî em bala xwe didinê di warê weşan û çapemeniyê de em geşedanake mezin dibînin. Vê yekê jî bandora xwe rasterast li ser berhemdayînê kiriye û hiştiyê ku li vî beşê welêt pêşketineke berbiçav çêbibe. “Heta bi sala 1988an li Başûr 166 pirtûkên çîrokan ên bi Kurdî hatine weşandin. Di vê serdemê de 62 heb pirtûkên çîrokan ên ku werger in jî hene.”<sup>37</sup>

Çîroknûsên ji Başûr ên bi zaravayê Kurmancî nivîsandine yên xuya em dikarin bi vî awayê rêz bikin. Enwer Mehemed Tahir (1949), Fazil Umer (1962), Hesenê Silêvanî (1957), Husein Muhammed (1980), Nizar Mehemed Seîd (1952), Serfiraz Neqşebendî (1952), Sidqiyê Hirorî (1956) û Xelîl Duhokî (1951).

#### 1.2.4. Çîroka Modern Di Edebiyata Kurdî Ya Kafkasyayê De

Kurdên Sovyetê yan jî wek binavkirina gelemperî Kurdên Kafkasyayê ji wê civaka Kurdên Êzîdî pêk tê ku piştî şerê di navbera Osmanî û Rûsyayê de xwe li Rûsyayê girtine. “Di erdnîgariya Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê de nêzîkî 500 hezar kurd ji destpêka damezrandina sîstema Sovyetê (1922) heta belavbûna Sovyetê (1991) jiyane.”<sup>38</sup> Di vê serdemê de bi derfetên çandî yên Sovyetê dest davêjin edebiyatê jî helbet. Bi derketina rojnameya bi navê *Riya Teze* ya di 25ê Adara 1930î de pêngava herî xurt hatiye avêtin. Wek çawa pexşana di rojnameya Kurdistanê de bûbe bingeh di avakirina edebiyata Kurdî ya modern de bi heman awayî *Riya Teze* jî ji edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê re bûye bingehê û deriyê edebiyata modern ji kurdên wê derê re vekiriyê. Helbet divê em bêjin ku di destpêkê de dest ji hêla wê ya edebî berde di warê xwendin û nivîsandinê bi xwe de jî bingehê saxlem a wê civakê tune. “... Civaka kurdên êzîdî wê serdemê ji bilî folklorê xwedî tu sermiyan û nerîteke edebî nînin. Loma jî gava bi saya derfetên çandî yên Sovyetê dest bi dahênana edebiyateke nivîskî dikin

<sup>36</sup> H.b Rp. 31

<sup>37</sup> Haşîm Ahmedzade, *Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma*, Wer: Azad Zana Gündoğan, Pêri Yayınları, İstanbul, 2004 Rp. 190

<sup>38</sup> Sedat Ulugana, *Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî (1922-1991)*, Kovara Wêje û Rexne, Hejmar 9/10, 2017, Rp. 36

tevî paşxaneyê xwe ya dîrokî û folklorîk bi xurtî dikevin bin karîgeriya rêbaza realîzma sosyalîst a Sovyetê û vegêrana wan di bin sîbera van hokaran de teşe digire.<sup>39</sup>

Gava navê edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê tê gotin rasterast romana Kurdî dikeve bîra mirov. Ji ber ku romana yekemîn a Kurdî di sala 1935an de li wê derê ji aliyê Erebe Şemo ve hatiye nivîsîn. Navê romanê *Şivanê Kurd* e. Ev roman pêşî di sala 1931an de bi Rûsî tê nivîsîn. "... heman berhem di 1935an de bi Kurdî tê nivîsandin ku ev dîrok, destpêka romana Kurdî ye."<sup>40</sup> Roman jiyana şivanekî kurd a di nav zor û zahmetyê de vedigêre. Feqîrî, belengazî, tunebûnî di nav bûyerên civakî de hatine hûnandin. Eskerê Boyik ji bo vê romanê dibêje "Şivanê Kurd, bi temamî çîroka jiyana nivîskar bi xwe ye."<sup>41</sup> Piştî vê romanê bi salekê Erebe Şemo vê carê *Kurdên Elegezê* dinivîsîne. Her çiqas wek berdewamiya romana *Şivanê Kurd* tê dîtîn jî "mîrov dikare vê berhema biçûk wek çîrokekê bihesibîne."<sup>42</sup> Ji bilî van berheman romanên wî yên bi navê *Berbang, Jiyana Bextewar, Dimdim* û *Hopo* jî hene. Ji bilî Erebe Şemo nivîskarên wek Heciyê Cindî, Casimê Celîl, Qanadê Kurdo, Wezîrê Nadir, Eliyê Evdilrehman, Fêrikê Êsiv, Tosinê Reşîd, Seîdê Îbo, Eskerê Boyik û hwd. jî mîrov dikare bijmêre ku gelek behrem dane û bûne hîmên edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê.

Ji bo edebiyata Kafkasyayê her çiqas di serê pêşî de roman bikeve bîra mirov jî di cureyên din ên edebiyatê de jî gelek berhem hatine dayîn. Helbest ji van cureyan ya herî li pêş e. Nivîskarên wek Fêrikê Êsiv, Şikoyê Hesên, Çerkezê Reş, Karlanê Çaçanî di warê helbestê de gelek berhem dane. Yek ji cureyên din ku ew jî derdikeve pêş bi taybetî jî di serdema pêşîn de cureya pîyesê ye. Ev yek jî bi wê ve girêdayî ye ku wê demê "Tiyatroya Kurdî ya Elegezê" heye. Tiyatro bi awayekî ji ber zilma pergale filitiye lê zext û zordariyên siyasî yên sîstemê li ser nivîskarên kurd hene. Wê serdemê gelek ji wan tînan girtin û sirgûnkirin. Ev yek jî li ber pêşketina cureyên din ên edebiyatê dibe asteng.

"Piştî avakirina sîstema Sovyetê, ji bo netew û kêmanetew dibistan û enstîtu tînan vekirin."<sup>43</sup> Di sala 1921an de li Ermenîstanê dibistanên Kurdî tînan vekirin. Ji bo van

---

<sup>39</sup> Zülküf Ergün, *Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê*, Mukaddime, 2018, Hejmar:9 rp. 134-135

<sup>40</sup> Remezan Alan, *Bendname, Weşanên Peywend*, Stenbol, 2013, Rp. 186

<sup>41</sup> Mehmed Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş, İthaki Yayınları*, İstanbul, 2006 rp. 71

<sup>42</sup> Remezan Alan, *Bendname, Weşanên Peywend*, Stenbol, 2013, Rp. 186

<sup>43</sup> Sedat Ulugana, *Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî (1922-1991)*, Kovara Wêje û Rexne, Hejmar 9/10, 2017, Rp. 42

dibîstanan pirtûkên dersdayînê tèn çapkirin. Ji bo di van pirtûkan de bi kar bînin çîrok tèn wergerandin. Yek ji vana “Çîrok û Helbestên Pûşkîn” e.

Heger em berhema Erebê Şemo ya bi navê “*Kurdên Elegezê*” wek çîrok qebûl bikin ev çîrok dibe yek ji çîroka pêşîn a edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê. *Morofa* Eliyê Ebdilrehman di sala 1957an de tê çap kirin. Sehîdê Îbo xwediyê pirtûkeke çîrokan a bi navê *Duryanê* ye ku di sala 1966an hatiye weşandin. “Wezîrê Eşo kurteçîrokên bi navên *Mizgînî* (1976), *Dengbêj Kal Bûbû* (1983), *Pampa Sîpan* (1986) nivîsîne.”<sup>44</sup>

Sîma Semend yek ji nivîskara jin e ku di nava edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê de berhem daye. Berhema wê ya ji sê çîrokan pêk tê di sala 1961ê de li Êrîvanê bi alfabeya kirîlî çap bûye. Her sê çîrokên wê bi navên *Xezal*, *Reva Rîhanê*, û *Mizgîn* di pirtûkê de cih digirin. Temaya çîrokên wê bi gelemperî li ser jinê ye. Ji ber vê yekê jî lehengên çîrokên wê piranî jin in. Di çîrokên wê de pêkutî û zordariya civakê û malbatê ya li ser jinê derdikevin pêş. Bi vê yekê re ew cih dide jinên qehreman jî. “Di çîrokên wê de tesîra serdema Sovyeta Sosyalist, temayên netewî û çîmî, jiyana gundî û bajariyan, karkerên erd û zeviyên derdikevin pêş.”<sup>45</sup>

Çîroknûsên ku di nava edebiyata Kurdî ya Kafkasyayê de cih digirin em dikarin bi vî awayî rêz bikim. “Bi alfabetîk ev çîroknivîs in: Babayê Keleş (1947), Eliyê Ebdilrehman (1920), Emerîkê Serdar (1935), Erebê Şemo (1897-1978), Eskerê Boyîk (1941), Rizaliyê Reşîd (1929), Sîma Semend (1933), Têmûrê Xelîl (1949), Şemsî (1933-2002), Tosinê Reşît (1941), Wezîrê Eşo (1934) û Xelîlê Çaçan (1924).”<sup>46</sup>

### 1.2.5. Çîroka Kurmancî Li Dîasporayê

Di wê serdema ku li Şamê Kovarên wek *Hawar* û *Ronahîyê*, Li Beyrûdê Kovara *Roja Nû*, Li Kafkasyayê rojnameya *Riya Teze*, Li Başûr Kovarên *Jîyanewe* û *Jîyan* derdiket bi giştî di warê edebiyatê de û bi taybetî jî di warê çîrokê de ji Bakur û kurdên li nav Tirkiyeyê dijiyan tu deng dernediket. Ev bêdengî di taybetiya çîrokê de 66 salan dewam kir. Ji çîroka pêşîn a di sala 1913an weşîya û heta bi sala 1979an çîroka Kurdî li piyaseyê xuya nake. Di sala 1979an de M. Emin Bozarşan bi navê *Meyro* çîrokekê

<sup>44</sup> H.b Rp. 50

<sup>45</sup> Songül Keskin, Lênêrînek Li Çîroka *Xezala* Sîma Semend: Li Gel Şoreşa Sovyetê Pirsgirêka Jinê, Kovara Wêje û Rexne, Hejmar 9/10, 2017, Rp. 163-164

<sup>46</sup>[http://www.nefel.com/articles/article\\_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319](http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319)

diweşîne. Ev yek bi tenê nîşan dide ku bê qedexe û zordariyeke çawa li ser zimanê Kurdî hebûye.

Di warê edebî de li Tirkîyeyê yekem kovara ku tenê bi Kurdî derketiye *Kovara Tîrêjêye*. *Tîrêj* di sala 1979an de dest bi weşanê kiriye û tenê 4 hejmaran derketiye. Sê hejmarên wê li Îzmîrê hejmareke wê jî li Swêdê çap bûye. Zimanê wê bi Kurmancî û Zazakî ye. Di vê kovarê de piştî Çîroka Fuad Temo cara ewil çîrokên Kurmancî diweşin. Firat Cewerî di pêşgotina xwe ya di *Antolojiya Çîrokên Kurdî* de di der heqê çîrokên ku di *Kovara Tîrêjê* de cih girtine û polîtakaya wê ya li hember çîrokê de wisa dibêje:

*Gava di sala 1979an de kovara Tîrêjê dest bi weşana xwe kir, di kovarê de dîsa bi giranî helbest dihatin weşandin, lê kovarê cih dida şaxên edebiyatê yên din jî. Di kovarê de bi herdu zaravayên kurdî; kurmancî û zazakî nivîs hebûn û di nav van nivîsan de mirov êdî pêrgî çîrokan jî dihat. Çîrokên Rojen Barnas ko di bin naznavê Flît Totanî de diweşand çawa di warê helbestê de Rojen Barnas bédengiyek dişikand, di warê çîrokê de jî ew bédengî dişikand. Barnas dabû dû şopa Hawarê. Rojen Barnas bi zimanekî mîzahî rewşa welêt ya civakî, siyasî û psîkolojî radixist ber çavan. Ew bêtir çîroknivîsekî bajarî bû. Lê di eynî salê de kitêba Mehmed Emîn Bozarşan ya bi navê Meyro (1979) jî derket. Bozarşan bêtir motîvên xwe ji jiyana gundiyan distand, di siya jiyana gundiyan de hem rabûn û rûniştina kurdan, urf û adetên wan, hem jî tirs û tesîra leşkerên tirkan dianî zimên.<sup>47</sup>*

Yek ji girîngiya kovara *Tîrêjê* jî ew e ku çîroka modern a pêşîn a bi zaravayê Zazakî di nav rûpelên wê de cih girtiye. Çîroka modern a pêşîn a bi Kirmanckî (Zazakî) çîroka bi navê *Engîştê Kejê* (Tilîyên Kejê) ye ku Malmîsanîj ew nivîsiye û di sala 1980'yî de di kovara *Tîrêjê* hejmar 2yan de weşiyaye.

*Kovara Tîrêjê* bi derbeya leşkerî re ji mecbûrî dawî li weşana xwe tîne. Ji xwe hejmar 2yan wê ya 4an jî li derveyî Tirkîyeyê tê çap kirin. Piştî derbeyê li nava Tirkîyeyê ew azadiya nivîsîn û belavkirina berhemên Kurdî bi yekcarî nema. Nivîskar û rewşenbîrên Kurd mecbûr man ku derkevin ji derveyî Tirkîyeyê. Ev derketina wan deriyekî nû vekir ji edebiyata Kurdî re. Ew edebiyata ku îro em wek edebiyata dîasporayê bi nav dikin ji wan nivîskar, rewşenbîr û siyasethêderan ji ber derbeya

<sup>47</sup>[http://www.nefel.com/articles/article\\_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319](http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319)

leşkerî mecbûr man derkevin ji derveyî Tirkiyeyê û berê xwe bidin Ewrûpayê ava bûye. “Kurdên ku ji ber derbeya eskerî ya 12’ê Îlonê ji Tirkiyeyê koç kiribûne Ewrûpayê, li gelek welatên Ewrûpayê dest pê kirine xebatên xwe yên li Kurdistan û Tirkiyeyê yên nîvcomayî yên sîyasî bi nivîsîna berhemên bi Kurdî tacîdar kirine. Bêtir jî kesên li Swêdê bicîbûyî ji şertên erênî yên wî welatî sûd wergirtine û bi Kurdî nivîsîne. Bi vî awayî, berhemên nivîskî yên zimanê Kurdî ji aliyê nivîskarên her wekî Mehmed Uzun, Mahmut Baksi, Firat Cewerî, Hesenê Metê, Mistefa Aydoğan, Silêman Demir û Malmîsanij ve hatine nivîsîn. Ev rewşa erênî, digel ku li Ewrûpayê heta serê salên 1990’î berdewam bûye jî, ji ber bandora derbeya eskerî li Tirkiyeyê deng venedaye.”<sup>48</sup>

Li Ewrûpayê û bi taybetî jî li Swêdê ji ber azadiya heyî ya di warê weşana bi zimanên cuda de ji bo kurdên li wê derê bi cih bûbûn wek nimetekê bû. Di warê pêşxistina ziman de û pê re jî di warê berhemdayîna edebî de kurdan derfetek mezin bi dest xistin. Bi weşandina kovaran û bi avakirina weşanxaneyan re hejmareke zêde ya berhem û nivîskaran peyda bû. “Gava ez navên hin çîroknivîsên wan salan bi bîr bînim divê ez behsa Şahîne Bekirê Soreklî, Hesenê Metê, M. Alî K., Lokman Polat, Fewaz Husên û Ridwanê Alî bikim. Lê heta sala 1985an jî ev çîroknivîsên me ne xwedîkitêb bûn. Di sala 1985an de kitêbeke Torî ya bi navê *Qolinc* li Stockholmê derket, di sala 1986an de kitêbeke min bi navê *Girtî* derket û piştî avakirina weşanxaneya Welat (1988-1995) kitêbên Hesenê Metê, M. Alî K., Ridwanê Alî û Fawaz Husên derketin. Ji aliyê din ve kitêbên Şahîne Bekirê Soreklî û Lokman Polat jî derketin.”<sup>49</sup> Edebiyata Dîasporayê heta bi destpêka salên 2000î jî lokomotifî ji edebiyata Kurdî ya Kurmancî re kiriye.

### 1.3. Çîroka Kurmancî Ya Nû

Berî derbeya leşkerî ya di sala 1980î de bikaranîna zimanê Kurdî bi awayekî defacto qedexe bû. Ev defactobûn ji ber wê bû ku di zagonên Tirkiyeyê de qanûneke ku zimanên din qedexe bike tunebû. Desthilatdarên ku piştî derbeyê hatin ser hikum ji bo vê valahiyê dagrin di sala 1983an de qanûna bi hejmarê 2932an derxistin û ji bilî Tirkî bikaranîna zimanekî din qedexe kirin. Ev qedexe heta bi sala 1991ê dewam kir. Di 25ê Rêbendana 1991ê de ew qedexe ji dolê rabû. “Di şertên wê serdemê de ku wek

---

<sup>48</sup>[http://www.nefel.com/articles/article\\_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319](http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319)

<sup>49</sup> H.b

bûyereke mezin hat dîtin û bertek jî hatin nîşandayîn rakirina vê qedexeyê di encama sekna Özal de pêk hat.”<sup>50</sup>

Di esasê xwe de ev qedexe li ser axavtina bi zimanên din ên ji bilî Tirkî rabûbû. Lê vê carê jî Kurdan bi awayekî defacto ev yek li ser weşana bi Kurdî jî tetbîq kirin. Yanî ji wê valahiya ji hêla qanûnî ve sûd wergirtin û dest pê kirin zimanê Kurdî di warê weşanê de bikar bînin. Di dawiya sala 1991ê de rojnameya bi zimanê Kurdî ya bi navê “*Rojname*” dest bi weşanê kir. Piştî wê êdî weşanên Kurdî yek bi yek dest bi xebatên xwe kirin.

Di 22ê Sibata 1992an de rojnameya bi navê “*Welat*” dest bi weşanê kir. Ew rojname heftane û bi zimanê Kurdî bû. Her çiqasî rojnameyeke siyasî jî be di nav rûpelên wê de nivîsên edebî jî cih digirtin. Di heman salê de kovara “*Nûbihar*”ê jî dest bi weşanê kir. Piştî wê li Stenbolê saziya çandî û hunerî ya bi navê “Navenda Çanda Mezopotamyayê” hat ava kirin. Bi avabûna “Navenda Çanda Mezopotamyayê” re kovara edebî ya bi navê “*Rewşen*”ê jî dest bi weşanê kir. Him di rûpelên rojnameya “*Welat*” de him di rûpelên kovara “*Nûbihar*”ê de him jî di kovara “*Rewşen*”ê de bi têra xwe çîrok hatin weşandin. Bi taybetî kovara *Rewşen*ê hêzeke xurt da wêjeya Kurdî û berhemdariyeke hêja ya piştî hewqas bêdengiyê diyarî wêjeya Kurdî kir. “Bi derçûna van kovaran re, livdariyeke dîtir bi ber çavên me dikeve ku duyem *Tevgera Zimên* e ku piştî şêst salî ji tevgera zimên a *Kovara Hawarê* li dar dikeve...”<sup>51</sup> Piştî salên 2000î nivîskarên di wê kovarê de nivîsandine wek “Nifşê *Rewşen*” tên bi nav kirin.

Salên 90î ji hêla siyasî û civakî ve ji salên dijwar ên dîroka Kurdan e. Li temamê Tirkiyeyê û bi taybetî jî li Bakur bandora serhildana nû ya ji hêla “Partiya Karkerên Kurdistanê” ve hatibû destpêkirin, bi hemû dijwariya xwe û ji her hêlê de dihat hîs kirin. Vê yekê pêkutî, tundî û rewşa awarte ya aşkere û veşartî ya desthilatdariyê bi xwe re dianî. Li ser her tiştê bi Kurdî re eleqedar zextinin mezin hebû. Teva vê yekê jî di warê çandî û edebî de qe nebe toleransin hebûn. Wek me li jorê jî got kovar û rojnameyên di vî warê de ji xwe re rêyek dîtibûn dest bi afirandina berhemên nû dikirin.

---

<sup>50</sup> Fuat Uçar- Osman Akandere, Turgut Özal'ın Kürt Sorununa Yaklaşımı, Ankara Üniversitesi Türk İnkılâp Tarihi Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi, Sayı: 61, 2017, rp. 365-392

<sup>51</sup> Dilawer Zeraq, Rajena Kurdî Nivîsarên Libarey Ziman û Wêjeyê, Weşanên Lis, Diyarbakır, 2014, rp. 51

Xwendin û nivîsandina Kurdan li gor demên berê zêdetir bûbû. Derfetên bi dest ketibûn, berê nivîskar û siyasetmedarên Kurd dabû nivîsandina bi Kurdî. Vê tevgerê bi xwe re berhemdariyeke hêja ya edebî û pêngaveke xurt ya zimên anî. “Nîşaneyên bikaranîna xweser û orjînal a Kurdî, hatin kişfîkirin; ziman ji aliyê van nivîskaran ve di ast û radeya bilindtirîn de hate bikaranîn û hewla firehtirîna sînor û delîveyên zimên hat dayîn...”<sup>52</sup> Ji xwe ew ê ku di van kovar û rojnameyan de dinivîsandin ji bilî Kurdî bi kêmanî bi zimanekî din jî dizanîbûn. Bi taybetî nivîskarên Kurdên ji Bakur bi Tirkî zanîbûn. Ji ber vê yekê jî edebiyata cîhanê di ser zimanê Tirkî re bi hêsanî dişopandin. Vê yekê jî dikir ku nivîskarên vê serdemê ew qalibên berê yên çîroknûsiya Kurdî bişkînin û berê xwe ber bi nêzîktêdayînên cihanî yên çîroknûsiyê de bizîvirînin. Çîrok di kovara Hawarê de wek me berê jî gotibû wek alaveke pêwendiyê dihat dîtin û meqseda wê çîrokê ne ew bû ku di warê edebî de hunerî û pêşketî be. Meqsed jê ew bû ku peyama bihata dayîn. Lê çîroka serdema nû heger ne bi temamî be jî xwe ji vê nerînê bi dûr xist. Di çîroka nû de “romantîzma îdeal û perçivandina ku di nifş û serdemên pêşî de hebûne, cîyê xwe dane maqûlî û ramîna rasyonel û avakirina rastiya hundirîn a deq û berhemê.”<sup>53</sup> Vê yekê bi xwe re di taybetiya naverokê de mijarên nû û di taybetiya teknîkê de jî celebên nû yên çîroknûsiyê jî anî. Çîroka ku mijara wê ew bû yekîtiyekê di nava gel de ava bike, gel hişyar bike, qîmetê zanîne pê bide nasîn, dest pê kiribû mijarên nû hilibijartibû wek pirsgerêkên takekesî, cîhana hundirîn a kesan.

Bobelatên salên 90î hêdî hêdî wek tema di çîrokê de hatin bikaranîn. Şer, serdegirtin, tûndîtî, valakirina gundan, kuştinên qesas nediyar, koçberî, penaberî, ji axa xwe qetîn, çalakiyên bi xwînî, girtin, îşkence, cerdewanî ew bobelat bûn ku Kurd bi wan re rû bi rû diman. Ev şert û mercên nerênî di çîrokan de hatin derbirîn û wek temayên sereke yên çîrokên vê serdemê hatin bikaranîn. Lê ferqa mezin a çîroka nû ji çîroka berî xwe ew bû ku bûyer an jî rewş ne di ser gel an miletekî re lê di ser takekesekî re dihat dayîn. Çîroka bi navê “*Kul*”<sup>54</sup> a Enwer Karahan yek ji wan çîroka ye ku li ser kuştinên qesasnediyar hatiye ava kirin. Çîroka “*Her! Qomitan Cerdewan*”<sup>55</sup> a Çiya Mazî temaya xwe ji zilm û zordariya cerdewanan girtiye. Yek ji çîroknûsên destpêka salên 2000î Sîdar Jîr ji bo temaya çîroka xwe ya bi navê “Aboneyê

<sup>52</sup> H.b rp. 53

<sup>53</sup> Zeraq, 2014 H.b rp. 53

<sup>54</sup> Enwer Karahan, Şevbihêrkên Şevên Xalî, Weşanên Doz, Stenbol, 2001, rp.87

<sup>55</sup> Çiya Mazî, Mistek Jiyan, Weşanên Sî, Stenbol, 2003, rp. 106

Rojnameyê”<sup>56</sup> serpehatiya gerilayekî bijartiye ku dê û bavê wî gerilayî ji hêla hêzên kontra ve tîn kuştin ji ber ku hiştine lawê wan derkeve çiyê û bibe gerîla.

Vê pêla nivîsandina bi kurdî bi xwe re sazîyên nû yên bi nivîsandinê re têkildar jî derxist holê. Wek weşanxaneyan. Weşanxaneya Nûdemê ji xwe di sala 1992an de li Ewrûpa hatibû avakirin û dest pê kiribû pirtûkên bi zimanê Kurdî diweşandin. Li Tirkiyeyê jî weşanxaneyên wek Weşanên Doz, Weşanên Deng, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê dest bi weşandina pirtûkên Kurdî kiribûn. Lê rêjeya bêtir a çapkirina pirtûkan piştî nêveka salên nodî bû. Di sala 1995an de Weşanên Avesta hat avakirin. “Weşanxaneya Avesta bêtir nivîskarên berê; yên li Ewrûpa, Kurdîstana Sûrî, Iraq û Îranê gihandin xwendevanên kurmanç. Kitêbên Avesta yên çîrokan ko di destên me de hene, ev in; Hesên Qizilcî, *Kenê Parsek*; Ferhad Pîrbal, *Çolistan*; Helîm Yûsiv, *Jinên Qatê Bilind*, *Mirî ranazin*, *Mêrê Avis*, *Memê bê Zîn*; Hesên Metê, *Epîlog*, *Smîrnoff*; Fawaz Husên, *Amîdabad*; M. Alî. K., *Mehkûm*; Kamîran Haco, *Kelevajî*... Weşanxaneya Sîyê jî piranî meyla xwe berda ser nivîskarên ciwan an jî nivîskarên nû û wê jî di hundirê kurtedemekê de gelek kitêbên kurteçîrokan gihandin ber destên xwendevanên kurd. Çîroknivîsên ko Sîyê kitêbên wan ên çîrokan derxistin ev in: Yaqob Tilermenî, *Êşbazî*, *Bermeqlûb*; Dilawer Zeraq, *Kakil*; Sedat Yurtdaş, *Xelat*, Enwer Karahan, *Şevbuhêrkên Şevên Xalî*; Çiya Mazî, *Mistek Jiyan*; Fewzî Bîlge, *Jidilara*; Roşan Lezgîn, *Li Bin Dara Bîşengê*...”<sup>57</sup>

Wê serdemê jî dîsa navenda rewşenbîriya Kurdî Stenbol e. Yanî pêla nû ya edebiyata Kurdî dîsa li derveyî axa xwe kok vedida. Helbet ev yek bi konjoktura wê serdemê ve girêdayî bû. Bakur di salên 90î de di nava şerekî nebinavkirî de bû. Pêşxistina zimên û berhemdayina bi zimanê Kurdî li wê derê bi têra xwe xeternak bû. Ji ber vê yekê jî bajarekî wek Stenbol ji bo bikaranîna van xebatan li gora Bakur ewletir bû. Vê yekê heta bi salên destpêka 2000î berdewam kir. Piştî ku weşanxaneyên nû li Amedê hatin ava kirin û dest pê kirin li Amedê dest bi weşana xwe kirin berê edebiyata Kurdî jî dageriya bi ser Amedê de û ji zemanê mîrekiya û vir ve li Bakur cara ewil bû ku bajarekî Kurdan dibû navenda edebiyata wê jî.

Di warê çîroknûseyê de heta wê demê nivîskarên ji bakur ku piraniya wan li dîasporayê dinivîsandin hêdî hêdî navên nû li xwe zêde dikirin. Heta bi destpêka salên

<sup>56</sup> Sîdar Jîr, Ariya Giyanên Stewr, Weşanên Bajar, Stenbol, 2004, rp.15

<sup>57</sup> Cewerî, H.b



2000î çîroknûsên ji Bakur em dikarin bi vî awayê rêz bikin. “Abidin Parilti (1977), Adar Jiyan (1962), Bûbê Eser (1955), Çiya Mazî (1960), Dilawer Zeraq (1965), Dr. Cuwan Batû, Edîp Karahan (1930), Edîb Polat, Enwer Karahan (1962), Felat Dilgeş (1965), Fewzî Bîlge (1962), Fîrat Cewerî (1959), Fûad Temo, Hasan Kaya (1964), Hesenê Metê (1957), Hêvîdar Zana (1976), Îbrahîm Seydo Aydoğan (1976), Lokman Polat (1956), Mahmûd Baksî (1944), M. Alî K. (1964), Mehemed Dehsiwar (1959), Mehmet Sanri (1967), Mustafa Aydoğan (1957), Rojan Hazim, Rojen Barnas, Roşan Lezgîn (1964), Sedat Yurtdaş (1961), Serdar Roşan (1958), Serkan Birûsk (1969, Silêman Demir (1956), Suut Kiliç (1967), Evdile Koçer (1977), Torî, û Yaqob Tilermenî (1972).”<sup>58</sup> Piştî wê êdî hêdî nivîskarên nû li çîroknûsiya Kurdî zêde dibin. Pirtûkên çîrokan bêtir tîn çap kirin û sal bi sal ev yek zêdetir dibe. Malpera Diyarnameyê ku ji sala 2005an û vir ve îstatîstîka pirtûkên ku her sal derketine diweşîne, ji bo sala 2005an dibêje 9 pirtûkên çîrokan hatine weşandin.<sup>59</sup> Di sala 2006an de 10<sup>60</sup>, di sala 2007 an de jî Weşanxaneyê Lîsê koleksiyoneke klasîk çap kir ku di wê koleksiyonê de ji nivîskarên Hawarê bigire heta bi yê dîasporayê, ji nivîskarên Kurdên Kafkasyayê bigire heta bi yê Başûr û Rojhilat cih digirtin. Cara ewil bû ku bi awayekî giştî xwendekarên Kurd berhemên ev pêşengên edebiyata modern a Kurdî didîtin. Gava em digihêjin sala 2018an hejmara çîrokên ku wek pirtûk çap bûne digihêje li dor 30 hebî. Ev hejmara wan e ku wek pirtûk tenê yê li Bakur û li Tirkîyeyê hatine çap kirin. Helbet çîrokên hatine nivîsîn ji vê hejmarê zêdetir in. Di gelek kovar, rojname, malper, medyaya civakî û blogên şexsî de jî çîrok hatine weşandin.

Di roja me de çîroka Kurmancî roj bi roj li xwe zêde dike û ji hêla teknîk, vegêran, tema, leheng, şêwaz û celebên çîrokê yê nûjen de, di çarçoveyê fireh de şax vedide û roj bi roj dibe rengê xweser. Ev yek jî bi xwe re cîhanbûna wê pêşdetir dixê û dihêle ku bibe rengê ji rengê çîroka nûjen a cîhanê.

---

<sup>58</sup> Cewerî, H.b

<sup>59</sup><http://diyarname.com/news.php?Idx=301>

<sup>60</sup><http://diyarname.com/news.php?Idx=302>

## BEŞA DUYEM

### 2. KOVARA HAWARÊ Û ÇÎROKA KURMANCÎ DÎ KOVARA HAWARÊ DE

Kovara Hawarê ji bo çanda Kurdî xwedî girîngiyeye gelekî taybet e. Ji bo çîroka Kurmancî jî em dikarin vê yekê bibêjin. Çîroka Kurmancî ya tekûz cara ewil di Kovara Hawarê de hatiye weşandin. Di navbera yanzdeh salan de bi pêncî çîrokên modern ve bingeha çîroknûsiya Kurmancî daniye. Herwiha bi werger û adaptasyonan jî bergehên nû ji çîroknûsiya Kurdî re vekirîye. Hawarê ji kovarên beriya xwe cuda cara ewil e ku zimanê Tirkî bi kar neanîye. Vê yekê bi xwe re nivîskarên nû yên Kurdînivîs aniye û hiştiye ku nerîteke nivîskariyê jî derkeve holê.

#### 2.1. Kovara Hawarê

Kovara Hawarê hejmara wê ya ewil di 15ê Gulana 1932an de derket. Xwedî û berpirsiyarê wê Celadet Alî Bedirxan e. Kovar li Şamê dihat weşandin û li nav Kurdan dihat belavkirin. Di serî de ji panzdeh rojan carekê derdiket. Lê ew yek zêde dewam nekir. Bi navberan û bi derengketinan bi temamî 57 hejmar çap bûne. Wek di nivîsarekê de dibêje, ev nivîsar di hejmara 27an de ku li ser navê Xwediyê Hawarê hatiye weşandin, sê tarîxên Hawarê hene.<sup>61</sup> Yek jê tarîxa weşana wê ye. Yek jê 18ê Tebaxa 1935an e ku hejmara 26an belav bûye û weşana wê hatiye sekinandin. Tarîxa sisêyan jî tarîxa hejmara 27an e ku di 15ê Nîsana 1941an de hatiye weşandin. Yanî di navbera hejmara 26an û 27an de nêzîkî şeş salan wext derbas bûye. Hejmara wê ya dawî piştî destpêka weşana wê bi 11 salan di 15ê Tebaxa 1943an de hatiye weşandin.

Heta 23 hejmaran di Kovara Hawarê de tîpên “q” û “k” ji dêvla hev dihatin bikaranîn. Van tîpan ji hejmara 24an û vir ve bi awayê em îro bi kar tînin cih guhertine.

---

<sup>61</sup> Hawar, Hj. 27 Amadekar : Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, 1998, rp. 688

Her weha dîsa heta bi hejmara 23an jî di çend rûpelên dawî de bi elfabeya erebî nivîs dihatin weşandin. Ev yek bi wê ve girêdayî bû ku wê serdemê xweşikî kesek tunebû ku karîbe elfabeya latînî bixwîne û fam bike. Nivîsên bi elfabeya erebî jî piştî hejmara 24an bes hatine weşandin. Ji ber ku Fransî wê serdemê li Sûriyeyê serdest in hinin nivîs bi Fransî jî dihatin weşandin. Lê nivîsên bi zimanê Fransî heta bi dawiya weşana kovarê jî berdewam kiriye.

Kovara Hawarê wek me berê jî gotiye dijberî wan kovar û rojnameyên berî xwe cih nedaye zimanê Tirkî. Vê yekê jî kiriye ku nivîskarên Kurd di ser zimanê Kurdî re berhemên xwe bidin û nivîsandin û derbirîna bi zimanê Kurdî di nav nivîskarên Kurd de bibe wek adetekê û pê re jî hiştiye ku nivîskarên nû yên bi zimanê Kurdî dinivîsînin zêdetir bibe. Gelek ji nivîskarên berdewamî yên kovarê bi teşwîq û alîkariya Celadet Alî Bedirxan dest bi nivîsandinê kirine. Wek Osman Sebrî, Qedrî Can, Cegerxwîn.

Yek ji girîngiyeke din a ku *Kovara Hawarê* li xwe bar dike jî elfabeya Kurdî ye. Heta wê demê jî Kurdan bi alfabayên wek Osmanî, Erebi, Farişî û Kirîlî bi kar dianîn. Lê bi *Hawarê* re Kurd bûn xwedî elfabeyeke xweser û dest pê kirin bi elfabeya xwe berhemên xwe nivîsandin. Her weha bi bi elfabeyê re bingeha rêziman û rastnivîsina Kurmancî jî hate danîn. Vê yekê jî hişt ku ziman bi awayekî bi rêk û pêk bê bikaranîn û li ser wê bingehê pêşdetir biçê û xwe nûjen bike.

Di rûpelên Hawarê de gelek berhemên cureyên edebî cih girtine. Hinin ji van berhemên ji nava gel hatine berhevkrin û belavkirin wek çîrok, çîrçîrok, lawje, stran payîzok û hwd. Hinin ji berhemên klasîk yên edebiyata Kurdî ne û ji nû ve hatine weşandin wek Dîwana Melayê Cizîrî û hinin jî bi temamî nû hatine nivîsandin û berhemên telîf in wek helbest, çîrok û nivîsaran. Em ê bi giştî li ser van nivîsan nesekinin û tenê li ser çîroka modern a Kurmancî analîza xwe bikin.

### **2.1.1. Çîrok di Kovara Hawarê de**

*Kovara Hawarê* di warê çîrokê de qonaxeke girîng e di edebiyata Kurdî ya Kurmancî ya modern de. Wek me berê jî got piştî çîroka ewil a di sala 1913an de li Stenbolê di kovara Rojî Kurd de hat weşandin û pê ve cara ewil çîroka Kurmancî di Hawarê de hatiye weşandin. Heger em bi awayekî din bêjin çîroka Kurmancî ya tekûz û

temambûyî, ji ber ku “Çîrok” a Fûad Temo ne temambûyî bû, cara ewil di Hawarê de hatiye weşandin. Di 57 hejmarên *Kovara Hawarê* de ji hêla 31 nivîskarî<sup>62</sup> ve li ser hev 77 çîrok hatine weşandin.

Ji nav 57 hejmarên *Kovara Hawarê* de di hejmarên 3, 13, 17, 23, 25, 32, 34, 40, 41, 53 û 54an de çîrok qet nehatine weşandin. Her weha hejmarên 29, 30, 51 û 52an jî her hejmarek bi çar çîrokan hejmarên herî dewlemendin ji hêla çîrokê de.

**Tablo 2:** Çîroknûsên Çîrokên Wan di *Kovara Hawarê* de Weşiyane

1.	Bekir Qotreş
2.	Bişarê Segman*
3.	Cegerxwîn
4.	Celadet Alî Bedirxan*
5.	Cemîlê Haco
6.	Cemşîd*
7.	Çîrokbêj*
8.	Çiyayê Agirî
9.	Derketîkî Dêrsîmî
10.	Dilistan
11.	Ewdirehman Fewzî
12.	Farisîxanîn*
13.	Farisîxwîn*
14.	Fiad Cemîl Paşa
15.	Herekol Azîzan*
16.	Ji Devê Hecî Hemze*
17.	Kamiran Alî Bedirxan
18.	Koçerê Botan*
19.	M. Emîn Silêman
20.	Mustafa Ehmed Botî
21.	Nûredîn Êsîf(Zaza)
22.	Osman Sebrî
23.	Qedrî Can
24.	Rasteder*
25.	Seydayê Gerok*

<sup>62</sup> Di vê hejmarê de kodnavên ku Celadet Alî Bedirxan bikaranîne jî heye. Gava em wan kodnavan wek yek hesab bikin hejmar dadikeve 20 heban.

26.	Sibhî Resûl
27.	Silêmanê Ferho
28.	Ş. Hesen
29.	Şevger*
30.	Şêx Abid
31.	Telet Qedûr

Navên ku “\*” li ber hene wek kodnavên Celadet Alî Bedirxan tèn qebûlkin.

**Tablo 3:** Çîrokên di *Kovara Hawarê* de Weşiyane

Hejmar	Nivîskar	Navê Çîrokê		
Hejmar 1	<b>Qedri Can</b>	<b>Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye</b>		
Hejmar 2	Qedri Can <b>Kamiran Alî Bedirxan</b>	Gundê Nûava <b>Du Egîd</b>		
Hejmar 3				
Hejmar 4	Celadet Alî Bedirxan <b>Kamiran Alî Bedirxan</b>	Ber Tevna Mehfûrê <b>Lawikê Min</b>		
Hejmar 5	Qedri Can <b>Kamiran Alî Bedirxan</b>	Besreka Zêrîn <b>Dildiziya Gulekê</b>		
Hejmar 6	Çîrokbêj <b>Çîrokbêj</b> Qedri Can	Dîk û Rovî <b>Mar û Mirov</b> Hêva Çardeşevî		
Hejmar 7	<b>Kamiran Alî Bedirxan</b>	<b>Mêrê Min Di Şerî De Ye</b>		
Hejmar 8	Celadet Alî Bedirxan	Şêraniya Zimanê Kurdmançî		
Hejmar 9	<b>Cemîlê Haco</b> Koçerê Botan <b>Koçerê Botan</b>	<b>Melayê Gulê</b> Mîr û Mar <b>Mîr û Keşe</b>		
Hejmar 10	Kamiran Alî Bedirxan <b>Koçerê Botan</b>	Leylana Rastiyê <b>Mîr û Kund</b>		
Hejmar 11	Herekol Azîzan	Çîrçîroka Bîngolê		
Hejmar 12	<b>Celadet Alî Bedirxan</b> Mustafa Ehmed Botî <b>Koçerê Botan</b>	<b>Gazinda Xencera Min</b> Kew û Qitik <b>Ker Gur û Rovî</b>		
Hejmar 13				
Hejmar 14	Cemîlê Haco	Biserhatiya Reşoyê Darê		
Hejmar 15	<b>Bekir Qotreş</b>	<b>Kîroşk û Kûsî</b>		

	Mustafa Ehmed Botî	Cuhabên Koçerî		
Hejmar 16	<b>Ewdirehman Fewzî</b>	<b>Zerêle</b>		
<b>Hejmar 17</b>				
Hejmar 18	Mustafa Ehmed Botî	Şêr û Gayê Zer		
<b>Hejmar 19</b>	<b>Ş. Hesên</b>	<b>Xewna Rastiyê</b>		
Hejmar 20	Çîrokbêj <b>Kamiran Alî Bedirxan</b>	Xurtiya Bînahiyê <b>Du Dengbêj</b>		
<b>Hejmar 21</b>	Kamiran Alî Bedirxan <b>Osman Sebrî</b>	Eyloyê Pîr <b>Li Goristanek Amedê</b>		
Hejmar 22	Kamiran Alî Bedirxan <b>Ş.Hesên</b>	Nivîsevan <b>Tirba Spî û Marê Qut</b>		
<b>Hejmar 23</b>				
Hejmar 24	Mustefa Ehmed Botî	Çûk û Fil		
<b>Hejmar 25</b>				
Hejmar 26	<b>Ji Devê Hecî Hemze</b>	<b>Ehmedê Zeydan</b>		
<b>Hejmar 27</b>	Nûredîn Êsif(Zaza)	Xurşîd		
Hejmar 28	<b>Çiyayê Agirî</b>	<b>Şivan û Beran</b>		
<b>Hejmar 29</b>	Nûredîn Êsif(Zaza) <b>Nûredîn Êsif(Zaza)</b> Sibhî Resûl <b>Fiad Cemîl Paşa</b>	Derketî* <b>Gulê</b> Dilawerê Çardesalî <b>Dilgirsî û Dilovanî</b>	*Adpts	De Lammenneais
Hejmar 30	Nûredîn Êsif(Zaza) <b>Telet Qedûr</b> Rasteder <b>Derketîkî Dêrsîmî</b>	Keskesor <b>Kulîlkên Ku Ji Kurdistanê Tê</b> Bi Xwehên Guherz Re <b>Kurd Yek In</b>		
<b>Hejmar 31</b>	Cegerxwîn	Behramê Gor		
Hejmar 32				
<b>Hejmar 33</b>	<b>Nûredîn Êsif(Zaza)</b>	<b>Stêrk*</b>	*Adpts	<b>D'Alphonse Daudet</b>
Hejmar 34				
<b>Hejmar 35</b>	Dilistan <b>Nûredîn Êsif(Zaza)</b> Qedrî Can	Melik û Koçer <b>Perîşanî</b> Sond		
Hejmar 36	<b>Rastedar</b>	<b>Kevirê Mûsayê Ehmed</b>		
<b>Hejmar 37</b>	Nûredîn Êsif(Zaza)	Hevîna Perîxanê		
Hejmar 38	<b>Seydayê Gerok</b>	<b>Zerdeşt</b>		
<b>Hejmar 39</b>	Qedrî Can	Guneh		
Hejmar 40				
<b>Hejmar 41</b>				

Hejmar 42	<b>Şevger</b>	<b>Îşê Paqij</b>	Ji Rojnam ekê	
<b>Hejmar 43</b>	Mustefa Ehmed Botî	Hilbîna Çiran		
Hejmar 44	<b>Nûredîn Êsif(Zaza)</b>	<b>Xatûn An Piling</b>	Werg.	<b>Frank Stockten</b>
<b>Hejmar 45</b>	Şêx Abid	Segê Jar		
Hejmar 46				
<b>Hejmar 47</b>	<b>Silêmanê Ferho</b> Nûredîn Êsif(Zaza)	<b>Mehfûr</b> Dê An Xûşk?	Werg. Werg.	<b>Maurice Bouchor</b> Frank Stockten
Hejmar 48	<b>Osman Sebrî</b>	<b>Nêçira Hirçan</b>		
<b>Hejmar 49</b>	Osman Sebrî	Li Pêşberê Yarê		
Hejmar 50	<b>Bişarê Segman</b>	<b>Klêopatre</b>		
<b>Hejmar 51</b>	M. Emîn Silêman <b>Bişarê Segman</b> Bişarê Segman <b>Osman Sebrî</b>	Mîr û Nêçirvan <b>Selahedîn û Rîçardê Şêrdil</b> Şûşa Dilan <b>Warê Min Ne Î Kor E</b>		
Hejmar 52	Bişarê Segman <b>Farisîxwîn</b> Osman Sebrî <b>Qedrî Can</b>	Keleha Şahîn <b>Şahê Ecem Her Du Jin û Cêriya Wî</b> Pira Genderê û Hemûşê Kulik <b>Rojên Derbasbûyî</b>		
<b>Hejmar 53</b>				
Hejmar 54				
<b>Hejmar 55</b>	Osman Sebrî	Şetanqûnî 1		
Hejmar 56	<b>Osman Sebrî</b> M. E. Botî <b>Cemşîd</b>	<b>Şetanqûnî 2</b> Mêşhingivî <b>Kitêba Totê Reb*</b>	*Çîrok eke Misira Kevn	
<b>Hejmar 57</b>	Osman Sebrî <b>Farisîxanîn</b>	Şeytanqûnî An Tabûta Şeşcendek <b>Gulîstan*</b>	*Werg.	<b>Sadiyê Şîrazî</b>

Helbet ev çîrok tev ne ew çîrok in ku em wan di çarçoveya hunera çîroka modern de bihesibînin. Wek me berê jî gotiye hinin ji van çîrokan çîrokên gelerî ne û nedibû ku em wan wek çîroka modern qebûl bikin. Ji xwe ew nivîsên di hin cihan de wek çîrok derbas dibin lê di esasê xwe de nakevin çarçoveya çîroka modern me bi yekcarî cih neda wan wek “*Li Ber Tirba Şêx Seîd*”a Kamîran Alî Bedirxan. Hinin ji

wan rasterast bîranînên nivîskarên xwe ne û di çarçoveya hunera çîroka modern de bi cih nedibûn. Wek “*Silêman Beg Bedir-Xan*” û “*Buhara Dêrikê*”ya Qedrî Can û “*Yekîtiya Kurdan*”a Şahîn Mistefa Şahîn. Hinin ew meselok bûn ku di nava gel de ji xwe hebûn nivîskar tenê ew neqil kiribûn. Wek “*Çîrçîroka Bîngolê*”ya Herekol Azîzan Hinin jî werger û adaptasyon in ku em nikarin wan wek çîrokên telîf qebûl bikin.

**Tablo 4:** Çîrokên Gelerî Yên di Kovara Hawarê de

1	Hejmar 6	Çîrokbêj	Dîk û Rovî
2	Hejmar 6	Çîrokbêj	Mar û Mirov
3	Hejmar 9	Koçerê Botan	Mîr û Mar
4	Hejmar 9	Koçerê Botan	Mîr û Keşe
5	Hejmar 10	Koçerê Botan	Mîr û Kund
6	Hejmar 11	Herekol Azîzan	Çîrçîroka Bîngolê
7	Hejmar 12	Mustafa Ehmed Botî	Kew û Qitik
8	Hejmar 12	Koçerê Botan	Ker Gur û Rovî
9	Hejmar 15	Bekir Qotreş	Kîroşk û Kûsî
10	Hejmar 15	Mustafa Ehmed Botî	Cuhabên Koçerî
11	Hejmar 16	Ewdirehman Fewzî	Zerêle
12	Hejmar 18	Mustafa Ehmed Botî	Şêr û Gayê Zer
13	Hejmar 20	Çîrokbêj	Xurtiya Bînahiyê
14	Hejmar 24	Mustafa Ehmed Botî	Çûk û Fil
15	Hejmar 28	Çiyayê Agirî	Şivan û Beran
16	Hejmar 35	Dilistan	Melik û Koçer
17	Hejmar 43	Mustafa Ehmed Botî	Hilbîna Çiran
18	Hejmar 51	M. Emîn Silêman	Mîr û Nêçirvan
19	Hejmar 56	M. E. Botî	Mêşhingivî

Çîrokên gelerî yê di Hawarê de hatine weşandin piranî ji bo şîretan hatine bikaranîn. Ji xwe di esasê çîrok û meselokên gelerî de armanc ji wê çîrok û meseleyê ders wergirtin e. Wek di tabloyê de jî xuya dike ji van 78 çîrokan 19 heb jê gelerî ne û ne di çarçoveya çîroka modern de ne. Ji van çîrokan 6 heb jê ji aliyê Mustafa Ehmed Botî ve hatine nivîsandin. Koçerê Botan 4, Çîrokbêj 3, Bekir Qotreş, Dilistan, Çiyayê Agirî, M. Emin Silêman, Herekol Azîzan û Ewdirehman Fewzî jî her kê bi çîrokekê di



rûpelên Hawarê de cih girtine. Navên wek Koçerê Botan, Herekol Azîzan û Çîrokbêj wek ji sê kodnavên Celadet Alî Bedirxan tên qebûlkin. <sup>63</sup>

**Tablo 5:** Çîrokên Werger û Adaptasyon Ên di Kovara Hawarê de

1	Hejmar 29	Nûredîn Ûsif(Zaza)	Derketî	Adaptasyon	De Lamenneais
2	Hejmar 33	Nûredîn Ûsif(Zaza)	Stêrk	Adaptasyon	D'Alphonse Daudet
3	Hejmar 42	Şevger	Îşê Paqij	Werger	Ji Rojnamekê*
4	Hejmar 44	Nûredîn Ûsif(Zaza)	Xatûn An Piling	Werger	Frank Stockten
5	Hejmar 47	Silêmanê Ferho	Mehfûr	Werger	Maurice Bouchor
6	Hejmar 47	Nûredîn Ûsif(Zaza)	Dê An Xûşk?	Werger	Frank Stockten
7	Hejmar 56	Cemşîd	Kitêba Totê Reb	**	Çîrokeke Misira Kevn
8	Hejmar 57	Farisixanîn	Gulîstan***	Werger	Sadiyê Şîrazî

Di kovara Hawarê de 2 heb çîrokên adaptasyon cih digirin. Her du çîrok jî ji aliyê Nûredîn Zaza ve li Kurmancî hatine adaptekirin. Ji van çîrokan a bi navê *Derketî* ji De Lamenneais, *Stêrk* jî ji D'Alphonse Daudet ku her du jî Fransî ne hatine adaptekirin. Çîroka *Îşê Paqij* ji aliyê nivîskarê bi navê Şevger ku ev nav jî wek kodnavê Celadet Alî Bedirxan tê qebûlkin <sup>64</sup>, hatiye wergerandin. Çavkaniya çîrokê tenê wek *Ji Rojnamekê* hatiye dayîn. Wekî din tu nav û nîşan tune. Çîrokên bi navê *Xatûn An Piling* û *Dê An Xûşk* ji aliyê Nûredîn Zaza ve ji Frank Stocktenê Amerîkanî hatine wergerandin. Silêmanê Ferho çîroka bi navê *Mehfûr* ji Maurice Bouchor ji zimanê Fransî wergerandiye. Çîroka bi navê *Kitêba Totê Reb* wek agahî tenê em zanin ku çîrokeke Misira kevn e û nivîskarê wê jî Cemşîd e. Navê Cemşîd jî dîsa yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan tê qebûlkin. <sup>65</sup> Çîrokên di bin sernavê *Gulîstan* de hatine

\*: Agahî tenê ev e. Navê rojnameyê nehatiye diyarkirin.

\*\* : Nehatiye diyarkirin ku werger e yan hatiye bihîstin

\*\*\*: Sê çîrokên ji Gulîstana Şîrazî hatine wergerandin. Ji ber ku di bin sernavê Gulîstan de hatine nivîsîn me ew yek hesabandin.

<sup>63</sup> Aydogan 2014, rp. 174-175

<sup>64</sup> Hb.

<sup>65</sup> Aydogan 2014, rp. 174-175

wergerandin 3 heb in. Ji Gulistana Şîrazî sê çîrokên kin in û ji hêla nivîskarê bi navê Farisîxanîn ve hatine wergerandin. Farisîxanîn jî dîsa ji kodnavê Celadet Alî Bedirxan tê qebûlkirin.<sup>66</sup> Çîroka bi navê “*Ehmedê Zeydan*” bê nivîskar e û agahî tenê ew e ku dibêje ev çîrok ji Hecî Hemze guhdar kiriye û wek ku guhdar kiriye neqil kiriye. Lê ji gotina wî û ji bo lehengekî çîrokê referansdana nivîseke xwe bi me dide zanîn ku yê ev çîrok nivîsiye yan jî neqil kiriye Celadet Alî Bedirxan e. Ji ber ku ew nivîsa referanskirî ji aliyê Celadet Alî Bedirxan ve hatiye nivîsîn.

### 2.1.2. Çîroka Modern Di Kovara Hawarê De

Çîrokên di çarçoveya hunera modern de hatine nivîsîn û di Hawarê de cih girtine li gor tespîta me 50 heb in. Ev çîrok ji hêla 15 nivîskarên cuda hatine nivîsîn. Di esasê xwe de gava em li navan binerin em ê bibînin navên ku çîrok nivîsandine ji vê hejmarê zêdetir in. Celadet Alî Bedirxan bi kodnavên cuda nivîsiye. Çîrokên ku bi wan kodnavan hatine nivîsîn û ew kodnav wek ên Celadet hatine qebûlkirin, me li ser navê wî qeyd kirine. Ji ber vê sedemê jî hejmara nivîskaran dadikeve heta bi 15 heban. Hin ji van nivîskaran bi çîrokekê, hin jî wan bi du çîrokan û hinin jî bi zêdetir çîrokan cih girtine. Ji van nivîskaran ê herî zêde çîrok nivîsiye bi 10 çîrokan Celadet Alî Bedirxan e. Li dû wî bi 8 çîrokan Osman Sebrî û Kamiran Alî Bedirxan tînin. Qedrî can bi 7 çîrokan, Nûredîn Zaza jî bi 5 çîrokan serkêşiya çîrokê dikin di Hawarê de. Cemîlê Haco û Ş. Hesen her yek bi 2 çîrokan li pey van nivîskaran in. Sibhî Resûl, Fiad Cemîl Paşa, Telet Qedîr Hec Elî Begzade, Derketîkî Dêrsîmî, Cegerxwîn, Dilistan, Şêx Abid û M. Emîn Silêman jî her yek bi çîrokekê ketine nava lîsteya çîrokên modern ên di hawarê de.

**Tablo 6:** Çîrokên Modern Ên Kurmancî di Kovara Hawarê de

	<b>Nivîskar</b>	<b>Navê Çîrokê</b>	<b>Hejmar</b>
1	Qedrî Can	Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye	Hejmar 1
2	Qedrî Can	Gundê Nûava	Hejmar 2
3	Kamiran Alî Bedirxan	Du Egîd	Hejmar 2
4	Celadet Alî Bedirxan	Ber Tevna Mehfûrê	Hejmar 4
5	Kamiran Alî Bedirxan	Lawikê Min	Hejmar 4
6	Qedrî Can	Besreka Zêrîn	Hejmar 5
7	Kamiran Alî Bedirxan	Dildiziya Gulekê	Hejmar 5
8	Qedrî Can	Hêva Çardeşevî	Hejmar 6

<sup>66</sup> Hb.

9	Kamiran Alî Bedirxan	Mêrê Min Di Şerî De Ye	Hejmar 7
10	Celadet Alî Bedirxan	Şêraniya Zimanê Kurdmancî	Hejmar 8
11	Cemîlê Haco	Melayê Gulê	Hejmar 9
12	Kamiran Alî Bedirxan	Leylana Rastiyê	Hejmar 10
13	Celadet Alî Bedirxan	Gazinda Xencera Min	Hejmar 12
14	Cemîlê Haco	Biserhatiya Reşoyê Darê	Hejmar 14
15	Ş. Hesen	Xewna Rastiyê	Hejmar 19
16	Kamiran Alî Bedirxan	Du Dengbêj	Hejmar 20
17	Kamiran Alî Bedirxan	Eyloyê Pîr	Hejmar 21
18	Osman Sebrî	Li Goristanek Amedê	Hejmar 21
19	Kamiran Alî Bedirxan	Nivîsevan	Hejmar 22
20	Ş.Hesen	Tirba Spî û Marê Qut	Hejmar 22
21	Nûredîn Êsif(Zaza)	Xurşîd	Hejmar 27
22	Nûredîn Êsif(Zaza)	Gulê	Hejmar 29
23	Sibhî Resûl	Dilawerê Çardesalî	Hejmar 29
24	Fiad Cemîl Paşa	Dilgirsî û Dilovanî	Hejmar 29
25	Nûredîn Êsif(Zaza)	Keskesor	Hejmar 30
26	Telet Qedûr	Kulîlkên Ku Ji Kurdistanê Tên	Hejmar 30
27	Rasteder	Bi Xwehên Guhderz Re	Hejmar 30
28	Derketîkî Dêrsîmî	Kurd Yek In	Hejmar 30
29	Cegerxwîn	Behramê Gor	Hejmar 31
30	Nûredîn Êsif(Zaza)	Perîşanî	Hejmar 35
31	Qedrî Can	Sond	Hejmar 35
32	Dilistan	Melik û Koçer	Hejmar 35
33	Rastedar	Kevirê Mûsayê Ehmed	Hejmar 36
34	Nûredîn Êsif(Zaza)	Hevîna Perîxanê	Hejmar 37
35	Seydayê Gerok	Zerdeşt	Hejmar 38
36	Qedrî Can	Guneh	Hejmar 39
37	Şêx Abid	Segê Jar	Hejmar 45
38	Osman Sebrî	Nêçira Hirçan	Hejmar 48
39	Osman Sebrî	Li Pêşberê Yarê	Hejmar 49
40	Bişarê Segman	Klêopatere	Hejmar 50
41	Bişarê Segman	Selahedîn û Rîçardê Şêrdil	Hejmar 51
42	Bişarê Segman	Şûşa Dilan	Hejmar 51
43	Osman Sebrî	Warê Min Ne Î Kor E	Hejmar 51
44	M. Emîn Silêman	Mîr û Nêçirvan	Hejmar 51
45	Bişarê Segman	Keleha Şahîn	Hejmar 52
46	Osman Sebrî	Pira Genderê û Hemûşê Kulik	Hejmar 52

47	Qedrî Can	Rojên Derbasbûyî	Hejmar 52
48	Osman Sebrî	Şetanqûnî 1	Hejmar 55
49	Osman Sebrî	Şetanqûnî 2	Hejmar 56
50	Osman Sebrî	Şeytanqûnî An Tabûta Şeşcendek	Hejmar 57

Çîrokên di vê tabloyê de heger em li ser navên nivîskarên wan bisenifînin tabloyeke wek a li jêrê derdikeve pêşberî me.

Çîrokên Celadet Alî Bedirxan:

- |                               |           |
|-------------------------------|-----------|
| 1- Ber Tevna Mehfûrê          | Hejmar 4  |
| 2- Şêraniya Zimanê Kurmancî   | Hejmar 8  |
| 3- Gazinda Xencera Min        | Hejmar 12 |
| 4- Bi Xwehên Guhderz Re       | Hejmar 30 |
| 5- Kevirê Mûsayê Ehmed        | Hejmar 36 |
| 6- Zerdeşt                    | Hejmar 38 |
| 7- Klêopatre                  | Hejmar 50 |
| 8- Selahedîn û Riçardê Şêrdil | Hejmar 51 |
| 9- Şûşa Dilan                 | Hejmar 51 |
| 10- Keleha Şahîn              | Hejmar 52 |

Celadet Alî Bedirxan di Hawarê de bi deh çîrokan di rêza yekemîn de ye di warê çîroka modern a Kurmancî de. Wî ev çîrok bi pênc navên ji hev cuda nivîsîne. Celadet Alî Bedirxan, Rasteder, Rastedar, Seydayê Gerok û Bişarê Segman ew navin ku di van çîrokan de wek îmze xuya dikin.

Bi navê Celadet Alî Bedirxan çîrokên bi navê *Ber Tevna Mehfûrê*, *Şêraniya ZimanêKurdmancî* û *Gazinda Xencera Min* nivîsiye. Bi navê Rasteder çîroka Bi navê *Bi Xwehên Guhderz Re* û bi navê Rastedar *Kevirê Mûsayê Ehmed* û bi navê Seydayê Gerok jî çîroka bi navê *Zerdeşt* nivîsiye. Çîrokên xwe yên tarîxî yên bi navê *Klêopatre*, *Selahedîn û Riçardê Şêrdil*, *Şûşa Dilan* û *Keleha Şahîn* jî bi navê Bişarê Segman nivîsiye.

Çirokên Qedrî Can:

1- Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye	Hejmar 1
2- Gundê Nûava	Hejmar 2
3- Besreka Zêrîn	Hejmar 5
4- Hêva Çardeşevî	Hejmar 6
5- Sond	Hejmar 35
6- Guneh	Hejmar 39
7- Rojên Derbasbûyî	Hejmar 52

Çirokên Osman Sebrî:

1- Li Goristanek Amedê	Hejmar 21
2- Nêçira Hîrçan	Hejmar 48
3- Li Pêşberî Yarê	Hejmar 49
4- Warê Min Ne î Kor e	Hejmar 51
5- Pira Genderê û Hemûşê Kulik	Hejmar 52
6- Şeytanqûnî I	Hejmar 55
7- Şeytanqûnî II	Hejmar 56
8- Şeytanqûnî An Tabûta Şeş Cendek	Hejmar 57

Çirokên Kamiran Alî Bedirxan:

1- Du Egîd	Hejmar 2
2- Lawikê Min	Hejmar 4
3- Dildiziya Gulekê	Hejmar 5
4- Mêrê Min Di Şerî De Ye	Hejmar 7
5- Leylana Rastiyê	Hejmar 10
6- Du Dengbêj	Hejmar 20
7- Eyloyê Pîr	Hejmar 21
8- Nivîsevan	Hejmar 22

Çirokên Nûredîn Zaza:

1- Xurşîd	Hejmar 27
2- Gulê	Hejmar 29
3- Keskesor	Hejmar 30

- 4- Perîşanî Hejmar 35  
5- Hevîna Perîxanê Hejmar 37

Çîrokên Cemîlê Haco:

- 1- Melayê Gulê Hejmar 9  
2- Biserhatiya Reşoyê Darê Hejmar 14

Çîrokên Ş. Hesen:

- 1- Xewna Rastiyê Hejmar 19  
2- Tirba Spî û Marê Qut Hejmar 22

Çîroka Sibhî Resûl:

- 1- Dilawerê Çardesalî Hejmar 29

Çîroka Fiad Cemîl Paşa:

- 1- Dilgirsî û Dilovanî Hejmar 29

Çîroka Telet Qedîr Hec Elî Begzade:

- 1- Kulîlkên Ko Ji Kurdistanê Tên Hejmar 30

Çîroka Derketîkî Dêrsîmî:

- 1- Kurd Yek In Hejmar 30

Çîroka Cegerxwîn:

- 1- Behramê Gor Hejmar 31

Çîroka Dilistan:

- 1- Melik û Koçer Hejmar 35

Çîroka Şêx Abid:

- 1- Segê Jar û Şêxê Teyles Hejmar 45

Çîroka M. Emîn Silêman:

1- Mîr û Nêçirvan

Hejmar 51

## **2.2. Kurteyên Çîrokên Di Kovara Hawarê De**

Gelek çîrokên di Kovara Hawarê de hatine weşandin di wira de mane û li cihekî din nehatine weşandin. Ev yek bi xwe re zehmetiya gihîştina wan a yekser tîne. Me bi nivîsnadina kurteyên van çîrokan re hewl da ku wê zehmetiyê ji holê rakin. Em bawer dikin ku bi alîkariya van kurtayan re analîza me kiriye ew ê bêtir şênber bibe.

### **2.2.1. Çîrokên Celadet Alî Bedirxan**

Celadet Alî Bedirxan di warê çîrokê de nivîskarê herî berhemdar ê Kovara Hawarê ye. Wî him çîrokên gelerî, him jî ên telîf nivîsandine. Çîrokên ku wî wergerandine Kurmancî jî hene. Li gora her cûre çîrokê kodnavêkî cuda bi kar aniye. Ji bo çîrokên gelerî “Koçerê Botan”, “Çîrokbêj”, “Herekol Azîzan” ji bo yên tarîxî “Bişarê Segman” ji bo yên telîf “Rasteder”, “Rastedar” ew kodnavin ku wî bi kar aniye. Çîrokên wî yên tarîxî ji aliyê fiksîyonê de xurt in.

#### **2.2.1.1. Ber Tevna Mehfûrê**

Çîrok serpehatiya du xwişkên dişixulin da ku wesiyeta bavê xwe bînin cî dike. Rindî û Zîzê ji bo birayê xwe yê biçûk bidin xwendin dişixulin. Bavê wan Bengî axa di serhildana Şêx Seîd de hatiye kuştin. Wesiyeta wî ew e ku kurê wî Cefo bidin xwendin. Piştî ku gundê wan talan dibe bi diya xwe re ji mecbûrî diçin cihekî ku kes wan nas nake. dêya wan bi roj diçe paqijiyaya malan, bi şev jî goreyan dirêse lê dîsa jî pereyên derdixe tenê têra debara wan dike. Ji bo Cefo bidin xwendin pere lazim e. Ji ber vê sedemê herdu keçikên xwe, Rindê û Zîzê dişîne kar da ku karibin Cefo bidin xwendin. Herdu xwişk di şertên pir dijwar de dixebitin. Rojekê gava Zîzê ji serma diricife û nema dikare bişixule ji xwişka xwe Rindê re dibêje ma ne bes e. Xwişka wê jî piştî vê bûyerê ji wê re sedema şixulina wan bi hurgilî vedibêje. Piştî ku Zîzê bi temamî li ber dikeve bêtir ji dil dişixule û ji xwişka xwe zêdetir kar dike. Li gor wê zêdetir pereyan jî distîne. Gava diya wan bi meseleyê dihese hêsir dikeve çavên wê û bi hevdu re diçin xencera Bengî axa ya bi dîwar ve daliqandî ziyaret dikin û dikevin hembêza hev.

### **2.2.1.2. Şêraniya Zimanê Kurmancî**

Çîrokji çavdêriya vegêr ya gerekê ye. Vegêr ji bo karê xwe li Bêrûdê ye. Ji bo hinekî bêhna xwe derxe li qehwexaneyekê rûdinê û dûdirêj şayesandina ew meydana li hember xwe dike. Piştî ku radibe ji bo ku here lazimiyên xwe bistîne li çend heban rast tê ku bi kurmancî dipeyivin. Bang yekê ji wan dike ji bo alîkariya wî bike. Piştê jê dipirse bê ji ku ye. Xort dibêje ez Bedlîsî me. Lê vegêr ji wî re dibêje ku zarê wî ne zarê Bedlîsê ye yê Mêrdînê ye. Xort jî dibêje ez muhacirim û hatime li dora Mêrdînê bi cî bû me. Piştî wê yê xort dipirse ku ew ji ku ye. Vegêr jî dibêje tu jî ji zarê min pê derbixe ez ji ku me. Yê xort jî dibê li gora zimanê te tu Botî yî. Pişt re gava hinekî difikire nas dike bê ew kî ye. Lêborîna xwe jê dixwaze û dibêje min bihîstibû yek ji we li vê derê ye lê min fedî fikir ku herim cem. Pişt re vegêr (Celadet) dibê ew birayê min e. Di dawiyê de xort qala şêrînbûna zimanê kurmancî dike û dibêje heger milletên din zanîbûna ku zimanê kurmancî hewqasî şêrîn e bi tu zimanê din nedipeyivîn.

### **2.2.1.3. Gazinda Xencera Min**

Ev çîrok li ser diyalogeke di navbera vegêr (C.A.B) û xencera wî de ye. Vegêr ji bo serê qelema xwe tûj bike li kêrikekê digere lê nabîne. Piştê xencera wî tê bîra wî. Li jora refika wî ya kitêban e. Ji zû ve ye ranehiştiye xencera xwe. Xencera wî jeng girtiye. Wê hinekî paqij dike û dixwaze pê serê qelema xwe tûj bike lê xencer nake. Vegêr jê dipirse ma ji wî xeyidiye qey. Xencer tê ziman û gazina jê dike ku wî ew ji bîra kiriye. Dibêje piştî te rahiştiye qelemê te ez ji dest xwe danîme û nema rahiştiye min. Dibêje pêşiyên te ez bi goşt û dil û cergî bi xwedî dikirim tu dixwazî min bi dar û qaşulan bi xwedî bike. Dixwaze bi wî bide bawer kirin ku bêyî wê ew ê bi ser nekevin û negihêjin armanca xwe. Dibêje heger heta îro tu û zimanê te sax maye bi xêra min e ku pêşiyên te ez bi kar anîme. “Li dora xwe binere tê bibînî ku herçî ji min dûr mane, hatine ketine bajaran zimanê xwe winda kirine û îro ne dizanin bêjin “lo!” ne jî “lê!” Ji ber peyayên bêçek wek mirovên bê neynok in, kêç jî bi wan dikarin.” Piştî van gotinan vegêr dixwaze lê vegevine lê Xencer naxwaze lê guhdar bike û dikeve kalanê xwe.

### **2.2.1.4. Bi Xwehên Guhderz Re\***

Çîrok di navbera vegêr û Songula qîza wî de derbas dibe. Qîzik ji bavê xwe pirsar kovarê dike, dibê ev çi ye. Vegêr jî lê vedigerîne û dibêje ew Hawar e. Qîzik dîsa dipirse bê ew Hawara kê ye. Vegêr dibê ew Hawara kurdan e. Dipirse dîsa heta niha



çima gazî nedikir. Ew jî dibersivîne û dibêje gava bê xwendin ew ê bê fam kirin. Pişt re ji wê re çend rêzan dixwîne. Di dawiya sohbeta wan de vegêr pê dide zanîn ku gerek pir bixwînin û binivîsin. Heta gava mêvan hatin jê dêvla çay û qehvê divê pirtûkan pêş wan bikin. piştî ku qîzîk li hember derdikeve ku ev yek çawa dibe, vegêr pê dide zanîn ku neyar dikarin bigirin ser malê û çay û qehwê talan bikin lê nikarin zanîne talan bikin.

\*: Ev çîrok bi navê “Rasteder” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

#### **2.2.1.5. Kevirê Mûsayê Ehmed\***

Çîrok meseleya kevirê vedigêre ku li Şêrwanê li biniya qesra Şebistanê ye. Gava fermana Şêrwanê radibe Saîd beg ku mîrê wê derê ye li hemberî romê şer dike û wan dişikîne. Şêrik berdevkê Seîd begî ye. Bi wî re xayintiyê dike. Şêrik diçe Stenbol û derdikeve cem siltan. Bi alîkariya Şêrik romî eskerên Şêrwanî dişikînin û Seîd beg hêsir digirin. Wî dişînin sirgûniyê. Li wira dimire jî. Piştî wê Şêrik dibe Şêr beg û dibe mîrê Şêrwan. Piştî dibe mîr dixwaze ji xwe re qesrekê çêke. Ji bo vê jî kevirê qesra Şebistanê yê şeh kirî radike û li piştî insanan dike da ji çiyê daxin beriyê. Mûsayê Ehmed yek ji wan insanan e ku kevir li piştî xwe dike û dadixe. Di rê de li cihekî kevir ji piştî xwe datîne û li ser pal dide. Gava Şêr beg wî dibîne darekî li paş guhê wî dixîne û dibêje tu betilî ye ya tu dil nakî kevir bibe. Kevirkêş lê vedigerine û dibêje ma ez ji ku diwestim tenê ez texmîna tiştê dikim. Şêrik darekî din lê dixê û dibêje tu texmîna çî dike. Mûsayê Ehmed dibêje felek li Seîd beg geriya û tu kevirên qesra wî li ser piştî peyayên wî dibî destê. Berê me li jêr e. em diqedînin. Heger rojekê felek li te jî geriya û hinin din ew ê rabin kevirên Şebistanê bidin piştî çêlî û peyayên te û wan vegeînin cihê berê. Ez difikirim gava berê wan bikeve kêş ew ê çî bikin. piştî van gotinan wek zingînî ji srî were Şêrik kevir ji destê Mûsayê Ehmed davê xwarê û kişandina keviran dide betal kirin. Ew kevir hê jî li wê derê ye û bi navê Kevirê Mûsayê Ehmed tê bi nav kirin.

\*: Ev çîrok bi navê “Rasteder” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

#### **2.2.1.6. Zerdest\***

Çîrok bi meseleya Zerdest ya ku derdikeve çiyê û deh salan li wira dîmîne dest pê dike. Zerdest piştî deh salan bi rojê re dipeyive û biryarê distîne ku ji çiyê dakeve

xwarê. Gava dihihêje daristanê li mirovekî pîr rast tê. Ew mirovê pîr yekî miqedes e. Bi hevdu re dipeyivin. Mirovê pîr ji wî re dibêje tu hatiye nav insanan çi. Zerdeşt lê vedigerîne û dibêje ez ji insanan hez dikim. Mirovê pîr dibêje ma ji bo çi ez di van deran re derketime. Min jî ji mirovan hez dikir. Lê Hew mabû wan ez bikuştama. Aniha ez ji Xwedê hez dikim û ji mirovan hez nakim. Zerdeşt dibê ez ji mirovan hez dikim û jin wan re diyariyekê tînim. Mirovê pîr dibêje dest ji diyariyê berde ya baş ew e ku tu tiştêkî ji wan bibe û barê wan hineki sibik bike. Ew ê bêtir kêfa wan were. Ji wî re dibêje neçe nav mirovan. Ji xwe re li daristanê li nav dehban bimîne çêtir e. piştî wê Zerdeşt ji mmirovê pîr dipirse bê ew çi dike li daristanê. Mirovê pîr dibêje ew stranan çêdike û wan dibêje. gava ew strana çêdike dikene, digirî û dinehwirîne û pesnê Xwedê dide. Bi wî girî, ken û nehvirandinê pesnê Xwedê dide. Gava ji mirovê pîr xatir dixwaze û diçe difikire ku ma gelo dibe ku li nav vê daristanê hê hayê mirovê pîr jê tunebe ku Xwedê miriye.

\*: Ev çîrok bi navê “Seydayê Gerok” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

### **2.2.1.7. Klêopatre\***

Klêopatre melîka Misrê ye. Jiyana xwe bi evîn hezkirinê derbas dike. Gelek caran jî gelek kesan hez dike û zû ji wan aciz dibe. Evînê wê demî ne. Heta şevêkê ne. Di nav xulam û koleyan de kesê ku dilê wê dibijê dineqîne bi şev pê şa dibe û bi dû re wî dikuje. Sîdonye berdestka wê ye ku Klêopatre di wextê xwe de ew azad kiriye alîkariya wî dike di van karan de. Evîna wê ya dûdirêj bi Antonyo re ye. Antonyo femandarekî romanî ye. Bi Oktavyayê re zewicî ye. Antonyo derketiye sefêrê û gelek wext bi ser çûna wî re ketiye. Klêopatre nema yeqîn dike vegere. Hêviya xwe jê qut kiriye. Lê Antonyo piştî seferê vedigere. Jina xwe Oktavya berdide û bi Klêopatreyê re dizewice. Meclîsa Roma piştî vê bûyerê dibihîse wî wek xayin îlan dike. Oktavyo, birayê Oktavyayê, bûrayê Antonyo ye. Piştî vê bûyerê dibê serokê Romayê. Oktavyo dixwaze heyfa xwişka xwe jî hilîne. Dide pêşiya eskerên xwe û berê xwe dide Misirê. Di nav eskerê wî û yê Antonyo de şer dest pê dike. Piştî şerekî dûdirêj Oktavyo digihêjî heta bi deriyê Skenderiyê. Di wê navberê de hezkirina Klêopatreyê li hember antonyo kêr dibe û çavê xwe bera Oktavyo dide. Femandarê eskerî temî dike ku li hember eskerên Oktavyo dernekevin. Ji qesrê xwe vedidize û direve cihekî veşartî. Antonyo lê digere lê wê nabîne. Di wê navberê de Oktavyo dikeve nava bajêr. Antonyo xwe dikuje.

Oktavyo ferman dide ku Klêopatre were girtin û ji porê xwe li dû erebeya wî were girêdan û li nav bajêr bê gerandin. Gava Klêopatre vê yekê dibihîze bi marekê ku berê hazir kiribû xwe dide kuştin.

\*: Ev çîrok bi navê “Bişarê Segman” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

#### **2.2.1.8. Selahedîn û Riçardê Şêrdil\***

Çîrok di ser serpêhatiya Marî û birayê wê Pîkon re qala mezinahiya Siltan Selahedîn dike. Tiştê Selahedîn kirine ku temamê kirinên wî di bin ala îslamiyê de kiriye û tiştek ji bo Kurdaniyê tê de xuya nake ji bilî navê kelehekê ku wek “Keleha Kurdan” tê bi navkirin. Berî ku eskerê Selahedîn bikevin kelehê şevalyeyên Ewrûpî tê de bûn.

Pîkon eskerekî qehreman yê artêşa Riçardê Şêrdil e. Gava ji bo şer tev li ordiwê dibe xwişka wî Marî jî bi wî re tê. Di şerekî de Marî hêsîr dikeve û dikeve dest eskerên Selahedîn. Navê Sireya lê dikin û di qesra Selahedîn de di nav nedimeyên qesrê de wê bi cî dikin. Piştî birayê wê Pîkon bi vê yekê dihesê ji Riçardê Şêrdil alîkariyê dixwaze. Riçardê Şêrdil bi Selahedîn bawer e. Nameyekê dinivîse û dide destê Pîkon. Pîkon bi xwe derdikeve pêşberî Selahedîn û nameya fermandarê xwe dide Selahedîn. Piştî Selahedîn nameyê dixwîne Marî dide birayê wê. Riçardê Şêrdil di nameyê de gotineke Hz. Omer bi bîra Selahedîn dixê. Selahedîn jî gava bersiva nameya wî dide gotineke Hz Îsa bi bîra wî dixê.

\*: Ev çîrok bi navê “Bişarê Segman” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

#### **2.2.1.9. Şûşa Dilan\***

Vêna nedîmeyerê Klêopatrayê ye. Di qesra wê de dijî. Kes nizane kî ye û ji kî hatiye. Yekî bi tenê bi sira wê dizanîbû ew jî miribû. Şênîyên qesrê di nav xwe de digotin hatin jahrî kirin û ev yek jî Vêna kiriye. Şênîyên qesrê jê didexisin. Di kurt û pistan de hinan digotin ew xwişka melîkê ye, bavê melîkê bi jineke ereb re ketiye têkiliyê û Vêna jê çêbûye.

Balkêşiya Vênayê ew e ku di heman demê de ji du heban hez dike. Lokûsê Romanî û Lagosê Yewnanî herdu evîndarê wê ne. Ji herduyan jî bi heman awayî hez dike û hazir e di ber wan de her fedakariyê bike. Berî şerekî herdu evîndarên wê tên ji wê xatir dixwazin. Ji herduyan re jî dibêje ez ji te hez dikim û evîna min sadiq û abadîn e. Vê yekê ne ji bo xatirê wan bixapîne dike. Bera jî wisa hîs dike. Herdu hezkiriyên wê diherin şer. Ew jî ji wan re dia dike. Piştî sê hefta qasidek ji qada şer tê û wan agahdar dike ku ordiwa misirê bi ser ketiye lê Lokûs miriye. Vêna jî vê yekê dibihîse. Piştî dibihîse radihêje xencerê û di sînga xwe de radike. Dilê wê nema diavêje lê Vêna hîna sax e û bi dora xwe re dide û distîne. Milet jê ecêbmayî dimînin. Hinin jê ditirsin. Çend hefteyên din dikeve navberê qasidekî ji qada şer ê ku Lagos lê şer dikir tê qesrê û xebera mirina Lagos dide. Vêna gava bi vê yekê dihese radihêje xencerê dîsa û di sînga xwe de radike. Vê carê di aliyê rastê de radike. Piştî bîskeke nema kare li şîpiya bisekîne û dikeve dimre. Klêopatrê li ber wê dikeve. Emir li bijîşkan dike ku dilê Vênayê ji wê re bînin ku wek yadîgarekê hilîne. Gava bijîşk sînga wê vedikin ecêbmayî dimînin. Du dil di sînga wê de hene. Wê gavê herkes fam dike bê çawa di her dilekî xwe de evîneke din xwedî dikir. Oktavyo gava Misirê zeft kiribû li wê şûşê rast hatibû. Bijîşkan ji wî re mesele qal kiribûn. Wê şûşa dlan dişîne Romayê.

\*: Ev çîrok bi navê “Bişarê Segman” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

#### **2.2.1.10. Keleha Şahîn\***

Yemame, nedîmeya Zeynoya melîkeya Tidmîrê ye. Romaniyan bi ser Tidmîrê de girtine. Ordiwa Tidmîrê şikestiyê. Romanî yek bi yek kelehan bi dest dixin. Melîka Tidmîrê bi fikar e. Gava çav bi Yemame dikeve ew tiştê lê difikire jê re dibêje. Zeyno naxwaze Keleha Şahîn bikeve zû bi zû. Ji Yemame dixwaze ku here wê kelehê ku fermanarê wê evîndarê Yemameyê ye. bi wan bide zanîn ku heta ku yekî zindî hebe divê kelehê teslîm nedin. Yemame bi vê peyvîrê diçe kelehê. Sondê ji yarê xwe Rebî kurê Cabir distîne ku heta ku yekî zindî hebe kelehê teslîm neke. Yarê wê sozê didiyê. Piştî Romanî tên û dora kelehê dorpêç dikin bi qederekî zad û cebilxaneyên wan namîne. Bêhizûrî dikeve nava leşkeran. Carekê Rebî bi Yemame re dipeyive. Ji wê re dibêje ku tîrên wan nemane û halê kelehê ne tu hal e. Romaniyan qasidek şandine ku bi awayekî bi rûmet derketina ji kelehê pêşniyarî wan kirine. Leşker jê de ne. Gava Yemame ji Rebî dipirse ew çirûskên teslîmbûnê di çavên wî de jî dibîne. Bi wî dide

zanîn ku serê sibê ew jî qasidekî bişînin ji Romaniyan re. Lê bi şev jehrê dixê nav ava kelehê. Serê sibê ji wê pê ve kesekî zindî tuneye di qesrê de. Piştî saxtî dike ku kesekî zindî nemaye ew jî li cem cendekê Rebî xencerê di sînga xwe de radike û xwe dikuje. Piştî deh rojan gava romanî dikevin kelehê tenê li meytan rast tên.

\*: Ev çîrok bi navê “Bişarê Segman” weşiyaye. Ji ber tê qebûl kirin ku ev nav yek ji kodnavên Celadet Alî Bedirxan e me ev çîrok li ser navê wî hesab kir.

### **2.2.2. Çîrokên Qedrî Can**

Qedrî Can ew çîroknûs e ku di çîrokên xwe de bêtir bîranînên xwe bi kar tîne. Şopa jiyana wî hema bêje di her çîroka wî de xuya dike. Di hin çîrokan de vê yekê vegêrê wî, ku xuyaye ew bi xwe ye, bi xwe tîne ziman. Çîrokên wî di warê bikaranîna zimên û fiksiyonê de ne zêde serketî ne.

#### **2.2.2.1. Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye**

Vegêr xewnekê dibîne. Di xewnê de li welatekî sar û biberf e. Ev çend roj e dimeşe lê dawî lê nayê. Wê şevê dîsa dimeşe û bi sê dangan dike gazî û hawar. Çavên xwe vedike li mal di nav nivînê xwe de ye. dengêk tê wî. Nas dike dengê kurê wî ye. Ji kurê dipirse bê li ku ye. kurê wî dibêje ku ew li mal e. Kurê wî li ber serê wî rûdinê û ji wî re meselê qal dike. Dibêje gava ko romo welatê me dişewitand me xort û canan hev girt û dijminên xwe qels kir. Me welatê xwe ava kir. gerek tu jî bihata lê tu nehat. Min xewna te dît ku tu di tengesiyê de Bû û li me “Hawar” fikir. min xwe şidand û ez hatim. Min dît ku tu ji serma qefiliye tenê dilê te davêje. Min tu girt û min te anî malê. ev çend roj e em hatine. Çîrok bi helbetekê bi dawî dibe.

#### **2.2.2.2. Gundê Nûava**

Vegêr bi hesreta welatê xwe ye. Teva ku gundekî nû yê ji panzdeh malan ava kirine û her tiştê wan e û pirs û galegalên şênîyan bi hevdu xweş e jî kula dîtina axa bav û kalan di dilê wî de ye. Dibêje heger hûn dilê min bi kêrekê parçe parçe bikin û ew parçeyên dilê min bipeyivin û hûnê pê re bigirîn ji ber wê kulê.

#### **2.2.2.3. Besreka Zêrîn**

Meks, mîrê Besreka Zêrîn e. Ji Mîrzoyê Burca Metînan nameyek jê re tê û canê wî aciz dike. Mîrzo daxwaza keça wî jê dike. Nameya dawî bi zaimanekê tewş nivîsiye.

Meks vê nameyê bi lawê xwe dide xwendin. Lawê wî jî hêrs dibe. Meks dibê em çi bikin. Lawê wî jî dibê desthilanîn mifta xêrê ye. Ew jî nameyekê ji Mîrzo re dişîne û haziriya şer dike. Mîrzo piştî nameyê dixwîne biryar dide ku şer bike. Dêrika Çiyayê Mazî û Baniya Kanîhinarê û Çiyayê Turcelê dibe qada şer. Wê navberê qîza Meks Pîroz li ser banê qesrê bi dilekî çargopal lêdixe diçe û tê. Ji bav û bira û pismaman bêtir bi xurtiya Mîrzo dilxweş e. Mîrzo bi ser dikeve. Mekso piştî wenda dike serê xwe li zinarekî dixê û xwe dikuje.

#### **2.2.2.4. Hêva Çardeşevî**

Vegêr pala xwe daye balgîfa xwe û di xew re dihere. Xewnekê dibîne. Di xewna wî de heyv bi wî re dipeyive. Ji wî re dibêje ku tu diqefilî min tu ji mirinê xelas kir. Tu jî berdêla vê yekê bide. Lê bi dû re li xwe mikur tê ku wê ev yek ji bona xwe kiriye ji ber ku evîndarî wî bûye. Vegêr li xwe mikur tê ku ev sarbûna wî ne ji qeşa û berf û pûkê ye ji bêkesî û rebenîyê ye. Nema zane ew ê çi bersivê bide heyvê. Tam xwe hazir dike ku bipeyive ewrekê reş tê û ser heyvê digire. Gotina wî di qirika wî de dimîne. Şiyar dibe. Piştî şiyar dibe mikur tê ku ev yek ne xewn bû serhatiyêke wî bû. Ê gazinan li ewr dike ku ew ji evîndara wî qetandiye. Bang heyvê dike û dibêje ez jî evîndarê te me.

#### **2.2.2.5. Sond**

Vegêr qala serpehiatiyêke xwe ya zarokatiyê dike. Zemanê ew zarok e adetek di nav zarokan de heye ku bi hevdu re sond dixwin û xwîna hevdu ji zendên hevdu dimijin û dibin xwînbirayên hev. Ev yek berê dîtiye lê lê nefikiriye. Rojekê gava yek ji hevalên wan yê polê curmekê dike û ew dibîne û gava mamoste dipirse navê xwediyê yê curm kiriye ji mamoste re dibêje û ji dêvla wî hevalekî wan ê dinê xwe dide ber wî curmî û cezaya wî curmî dikşîne pê dihesê ku xwînbirayetî tişteki bi kêrhatî ye. ew jî dixwaze bi yekî re bibe xwînbira. Rojekê gava bi kêrê darikê destê xwe dibire kêr li tiliya wî dikeve û xwîn dibe. Ji hevalê xwe Sindik Havînê re dibêje ku tu jî zendê xwe xwîn bike û bibin xwînbirayên hev. Sindik Havînê zendê xwe xwîn dike û xwîna hevdu dimijin û dibin xwînbirayên hev.

Di navberê de gelek wext derbas dibe. Vegêr vê xwînbiratiyê ji bîra dike. Rojekê gava ji dibistanê derdikevin dibînin ku millet li pey kûçikê ye ku ew kûçik ber bi wan de tê. Ditirse. Xwînbirayê wî wî di paş xwe de vedişêre. Kûçik tê û êrîşî wî dike. Bi Kûçik re şer dike. Kûçik har e. Hevalê wî birîn dike. Piştî wê rojê hevalê wî hew tê

dibistanê. Bi dû re pê dihese ku nexweş ketiye. Wî dibin Diyarbekir, ji wira jî wî dibin Stenbolê lê dimire. Vegêr vê yekê her carê bibîr tîne.

#### **2.2.2.6. *Guneh***

Çîrok bîranîneke vegêr e. berî vê bîranînê qala wextê xwe yê dibistanê dike ku heyşt mehan wek di zindanekê de be jê aciz e. Bi hatina havînê re dibistan jî dikeve betlaneyê. Wan çar mehên betlaneyê bi zarokên hevalên xwe re dilîze û li kaş û zinaran li hêlînên çivîkan digerin.

Rojekê biryar didin ku herin şkeftêkî nêçira çêlkewan. Şkefta Bîrxêrê ji gundan pir dûr e û ne xalî ye. Li gor gotinan cihê pîrebok, cin û periyar e. Çar heval bi hevdu re diçn wê şikeftê çend heb çêlkew jî digirin û derdikevin ber deriyê wê li ber sîya darekê xwe rehet dikin. Cemo yek ji hevalên wan e. Tî bûye. Dixwaze here hundirê şikeftê ji kaniyê avê vexwe lê newê re jî. Vegêr pê dihese. Bi dizî dikeve hundirê şikeftê û xwe vedişêre. Gava Cemo tê hundirê şikeftê pix dike wî. Cemo dikeve erdê, dev û diranê wî dikevin tev û hew devê wî digere. Hawara xwe bi şivanekî ve digihînin. Şivan tê wî dibe gund. Cemo bi ser hişê xwe de nayê. Bavê wî wî dibe cem şêx. Şêx bi sextekarî çend cerîbinan dike û dibêje cinê şeytanî ketiyê canê wî, ez ê wî bikujim. Bi şivên ter li binê lingê Cemo dixê. Cemo çiqas diqire jî şêx dibe ev ne dengê wî lê yê cin e. Ew roj li Cemo nabe êvar û dimire.

Di navberê de di ser bist salan de wext derbas bûye vegêr hîna jî ji bîra nekiriye û gelek caran Cemo di xewna xwe de dibîne ku ji wî re dibêje bêbext.

#### **2.2.2.7. *Rojên Derbasbûyî***

Çîrok ji serpêhatiyên vegêr pêk tê. Vegêr li Amûdê mamoste ye. rojekê cewrikekî kûçikan bi hêta wî digire û ji bo tedawî bibe divê berê xwe bide Endîwerê. Gava ji Amûdê diçe bi wî zor tê. Ji dost û hevalên wê derê vediqete û ev yek jî dilê wî diêşîne. Gava wesiyeta wî bi rê dikeve digirî.

Li Endîwerê diçe cem bijîş û tedawî dibe. Li wê derê jî mamostetîyê dike. Ji ber nêzîkî sînor e û Cizîra Botan, Çiyayê Cûdî xuya dikin kêfa wî tê. Heval û dostên wî li wira jî çêdibin. Bi hevdu re derdikevin seyranan.

Wextê girtina dibistanan tê. Rêyeke nû li pêşiya wî ye. Ew ê biçe Şamê. Gava ji Endîwerê derdikeve jî wek gava ji Amûdê derketibû bi wî zor tê. Li Şamê êşa tenêtiyê dikşîne û tunebûna axavtina bi zimanê wî wî tengezar dike.

### **2.2.3. Çîrokên Osman Sebrî**

Osman Sebrî ew çîroknûs e ku çîrokên xwe bêtir li ser şer û adetên eşirtiyê û baweriyên gel ên batil ava dike. Problema bi hin çîroknûsên din re heye di Osman Sebrî de jî em dibînin. Ya di serê çîrokê de yan jî di dawiya wê de dide xuyakirin bê ew çîrok ji ke bihîstiye. Ev yek nîrxê çîrokê dixîne û fiksiyonê zêdetir barê neqilîkirinê dixê ser navê nivîskêr. Çîroka bi navê “*Li Goristanek Amedê*” di warê fiksiyonê de çîrokeke herî serketî ya di Kovara Hawarê de ye.

#### **2.2.3.1. *Li Goristanek Amedê***

Vegêr şevêkê bêhna wî teng e. Wek her carê berê xwe dide kêleka bahrê. Kêfa wî ji dengê pêlên behrê re tê. Gava ew deng tê wî wek bifire hîs dike. Wê şevê ev hîsa wî dibe rastî û bera jî difire. Gava difire berê xwe dide Amedê. Gava digihêje Amedê li hêla Deriyê Çiyê çav bi ronahiyekê dikeve. Berê xwe dide wê derê. Ew cihê ronahî jê difîre gaoristanek e. Teva ku du apên wî li wê erdê veşartî ne jî ew bang Şêx Seîd dike û dixwaze ji wî re tiştêkî bêje ya jî pirsekê jê bike. Bi Pesindayîn çend caran bang dike ku bersivêkê bidê lê tu deng nayê wî. Cara dawî gava bang dike deriyekî mezin ji erdê vedibe û jê Ezîz Axayê Silopî derdikeve ku zemanekî ew û vegêr bi hevdu re di zindanê de mane. Li wî diqîre ku neke qêrîn û wî bi avêtina dojhê ditirsîne. Ji ber ku wê şevê civîna mezin heye. Piştî di ber hevdu de didin û pê ve Vegêr dixwaze bikeve hundir û here civîna mezin. Piştî wek referans herdu mamê xwe dide derbasî hundir dibe. Ji bo here civînê divê kaxezêke destûrê ji mamê xwe bistîne. Axa bi yekî re wî dişîne cem mamê wî. Mamê wî bi zimanekî guherî ye bi wî re dipeyive. Mamê wî vê yekê bi hatina şêx Esedê Hewlêrî ve girê dide ku wî standartiyek aniyê bi xwe re. Li wê derê gava bi mamê xwe re dipeyive fam dike xebateke mezin heye. Rojname tê derxistin û lêkolînên zimanî pêk tên. Hayê wan ji dinyaya din jî heye. Kovara hawarê jî dixwînin. Dawiya şevê de melekek tê wî hişyar dike ku divê ji goristanê derkeve. Piştî şefeqê heger li wira bimînî ew ê bi temamî li wira bimînî. Vegêr vê yekê dixwaze lê ji ber hevalên li wira bê dilê wan e biryarê dide ku nemîne. Radihêje rojnameya Hişyariyê ku bixê bêrika xwe ruhstîn devê wî digire. Bi rojnameyê li destê ruhstîn dide û dikeve rê.



Bi hilweşandina destê xwe re bi êşekê hişyar dibe. Destê xwe li kuçekî daye û xwîn bûye. Şefeqê hîna nuh gewr kiriye.

### **2.2.3.2. Nêçira Hirçan**

Vegêr qala meseleyeke qewimî ye dike. Meseleyê ji devê xwediyê meselê dide gotin. Xwediyê meselê Mela Elî ye û meseleya xwe dibêje. Rojekê diçe nêçira kewan. Sê heb kew dikuje û berê xwe dide malê. Di vegeerê de li ser kaniyekê disekine ku bêhna xwe derxe. Hirçek tê û li pêşberî wî disekine. Kewên neçir kirine yek bi yek davêje ji hirçê re ji bo xwe xelas ke lê pere nake. Hirç êrîşî wî dike. Ew jî bi têra xwe xurt e. Ewû hirç hevdu dibin û tînin. Dawiyê hirç keysê lê tîne û wî li bin guhê erdê dixê. Piştî wê nema xwe dibîne. Hirç bi pençe û lêxistinê wî ji hal de dixê. Xwe li mirîti datîne û hirç dest jê berdide. Hirç ji bo bi dû re wî bixwe wî binax dike û diçe. Hirç diçe û pê ve ji binwê axê derdikeve û diçe malê. Xwe derman dike û piştî bi du rajan ji bo heyfa xwe hilîne ew û birayê xwe diçin wî cihê ku hirçê ew binax kiriye. Kozikekê çê dikin û li benda hirçê dimînin. Piştî heş rojan hirç tê. Ew cihê ku Mela Elî tê de binax kiriye dikole gava wî nabîne radibe ser du lingan û borîn pê dikeve. Wê gavê ew û birayê xwe bi tîfingan bera wî didin. Potê hirç tîne li dîwana axê radixê. Kî dibîne dibêje me hirçekî wisa mezin nediye. Ev gotin hinekî dilê wî rehet dike ku bindestiya wî ne ji pîsîtiya wî lê ji pîrxurtiya hirçê bûye.

### **2.2.3.3. Li Pêşberî Yarê**

Çîrokeke nameyî ye. Vegêr di vê çîrok-nameyê de bi hezkiriya xwe dide zanîn ku cara duduyan e ew evîndar dibe. Her wisa bi wê dide zanîn ku evîna wî ya pêşîn welatê wî ye. Vegêr ji hezkiriya xwe re dide zanîn ku ew ê wek kesên din pesindariya wê neke û tenê pesnê ku bide ew e ku jê re bêje “her tu daylana min î.” Vegêr bi hezkiriya xwe dide zanîn ku vî zemanî êdî baweriya wî bi rabûna miriyan nemaye lê piştî ew dîtiye êdî ji vê yekê bawer dike ji ber ku deriyê dilê wî yê wek tehta bi nerîneke wê vebûye. Mîsalê bi pêxember Mesîh tîne ku wî mirî li jînê vedigerand lê hezkiriya wî saxekî li ber mirinê li jînê vegeerandiye. Ji wê re dibêje heger tu ne jîn bi xwe bî tu ferîşteha jînê yî.

#### **2.2.3.4. Warê Min Ne î Kor e**

Hemê Qadir axa mêrekî di ser xwe re ye. bi mêranî û desthılanînê nav daye û herkes jê ditirse. Qadir axa bavê wî ye. Ji bilî Hemê du kurên din ên Qadir axa hene. Mistefa biçûkê bira ye. Delaliyê bavê xwe ye û ew jî ji aliyê mêranî û desthılanînê ne kêmkî Hemê ye. Rojekê Mistefa ji bo ji Ferêt derbas bibe li gemiyê siwar tê. Seyid Weqas ku ew jî ji malmezinan e jî li wê gemiyê siwar tê. Di navbera her du malbatan de neyariyeke biçûk heye. Mistefa û Seyid Weqas radibin hev û bi şaşaran bera hev didin. Seyid Weqas, Mistefa dikuje. Qadir axa tê cendekê lawê xwe dibe û şînê datîne. Seyid Weqas direve mal lê ji tirsê Hemê rêya revê şaş dibe. Piştî çar rojan Seyid Weqas bêhêvî dibe û berê xwe dide mala Qadir axa ji bo dexaletê. Diçe hewşa mala Qadir axa. Xulam hayê Qadir axê ku li hêla odê bû û hayê Hemê ku li aliyê malê bû jê çê dikan. Di vê navberê de Qadir axa û Hemê her yek ji yê din ditirse ku xetayekê bike. Bav ditirse ku Hemê serhişkiyê bike û tiştêkî bi Seyid Weqas bike, Hemê jî ditirse ku bavê wî ji ber rehma bavîtiyê dexaleta Seyid Weqas qebûl neke û navê camêrî û dilgirsîyê ji ser mala wan rake. Di navbera qesra ode û malê de li hev du rast tên. her du bi hev du re dibêjin Seyid Weqas hatiye dexaletê divê em wî efû bikin. Qadir axa piştî vê yekê dibihîse hêsir bi çavên wî dikevin. Ji Hemê heye ku ji ber borîna ji xwîna kurê xwe hêsir bi çavan ketiye lê bavê wî jê re dibêje ne ku borîna xwîna kurekî bi min zor tê lê gava min ev camêrtiya te dît ji kêfxweşiyê hêsir bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşiya min ew e ku ez zanim warê min ne î ko re.

#### **2.2.3.5. Pira Genderê û Hemûşê Kulik**

Çîrok qala serokeşîrekî leheng Hemûşê Kulik dibe. Di navbera du eşîran de dijminahî heye. Gelek caran rê li hev du birîne û gelek mêt ji hev du kuştine. Lê teva ku sê çar caran rê li Hemûşê Kulik dibirin jî nikarin wî bikujin. Bi ser de Henûş her carê du sê mêran ji wan dikuje. Carekê neyarên wî dibihîsin ku Hemûş çûye nav eşîreke din û mecbûr e ku ji pira Genderê derbas bibe. Pira Genderê jî pireke dîrokî ye ku di navbera du çiyayan de hatiye avakirin û bi qasî sed metroyî bilindahiya wê heye. Ji ber ku di navbera du çiyayan de ye pir ne rast e. Bi pêlikan mirov derdikeve heta bi nêvî û dîsa bi pêlikan dadikeve heta aliyê dinê. Neyarê Hemûş jî hesabê vê yekê kirine ku Hemûş li ser pirê nikare bi hespê xwe tev bigere. Li her du aliyên prê kemînê datînin û dimînin li benda Hemûş. Gava Hemûş tê her du aliyên pirê digirin û berê tivingan didin wî. Ji wî re dibêjin tê îja bi ku de here. Hemûş jî berê hespê xwe dide çem û dibêje vê carê jî bi

vir de. Zengû diavêje hesp û hesp xwe davêje çem. Hemûş bîaqil e. berî hesp bikeeve çem bi çend metroyan xwe ji ser hesp çeng dike jor. Hesp dimire lê tiştêk bi wî nayê.

#### **2.2.3.6. Şeytanqûnî I**

Çîrok li ser xerafeyên Kurdan meseleyek e ku vegêr dibêje çîrokeke qewimî ye. Du feqeyên ji bo herin Îranê xwendina xwe biqedînin û îcazetê ji melayên wê derê bistînin dikevin rê û li gundekî dibin mêvan ev mesele di serê van feqeyan re derbas dibe. Feqe Emer û Feqe Hesên ev her du feqe ne. Vegêr rê dide gotina Feqe Emer ku çîrokê ew vedigêre. Li gundekî dibin mêvan. Gundî mêvanên xwe li camiyê didin razandin. Ji wan re şîvê tînin dixwin. Pişt re dengê girî û şîvê bi gund dikeve. Lawê mixtar çûye rahmetê. Piştî wî dişon û dixin tabûtê mixtar ji wan dixwaze ku xitmekê li ser bixwînin. Ji ber ew ê her kê du zêran bide wan qebûl dikin. Gundî diçin mal û pê ve dest pê dikin Quranê dixwînin. Piştî bîskekê. Xirte xirt bi tabûtê dikeve. Çend caran dubare dike ev yek. Feqe Emer vê yekê dibîne lê hayê Feqe Hesên jê tune ye. Feqe Emer bi behaneyê ku here destmêja xwe nû bike ji odeyê derdikeve û derî li ser wan digire. Piştî bîskekê dîsa deng bi tabûtê dikeve û Feqe Hesên vê yekê dibîne. Dixwaze ji odeyê derkeve lê derî girtiye. Bi carekê re devê tabûtê vedibe û mirî radibe rûdinê. Kefen ji ser serê xwe davêje û bi destan tiştinan dibêje. Çavên wî sor bûne. Feqe Hesên ziravê wî diqete. Mirî ber wî de dimeşe û ew jî bi vî alî wî alî de direve. Çiqas dike gazî û hawar jî hevalê wî derî lê venake. Dawiyê gava mirî nêzikî wî dibe derbekê lê dixê û dev û pozê wî di xwîne de dihêle. Piştî wê Feqe Emer wî di pixêrîkê re derdixe. Mirî hey bang wan dike û dixwaze tiştêkî ji wan re bêje. feqe Emer dixwaze bi wî re bipeyive lê Feqe Hesên nahêle û dibêje ew Şeytanqûnî bûye. Bi dû re ji fam bikin bê şeytanqûnî bûye ya na Qurana xwe û tûrê nanê xwe jê dixwaze. Lawê mixtar wan di pixêrîkê re dirêjî wan dike. wê gavê lawîk ji wan re dibêje ku ew bi xwîne ketiye. Heger gundî bi wî bihesin ew ê wî bikujin. Her du feqe alîkariyê pê re dikin hiek cilên xwe datînin li wî dikin û heta sibê disekin. Gava serê sibê gundî tînin dibînin ku miriyê wan di nav wan de ye û rûniştiye. Mixtar gelekî kêfxweş dibe û ji wan re dibêje heger ne ji we bûya me yê bi destê xwe lawê xwe bikuşt. Wan sê rojan dike mêvan û her kê pênc zêran dide wan.

#### **2.2.3.7. Şeytanqûnî II**

Elo ji çar kuran yek eku kurê Ebês e. Her çar bira pir ji hev du hez dikin û tifaqa wan heye. Ev hezkirin û tifaqa wan li derdorê nav daye. Ev tifaq û bextewariya wan bi

mirina Elo re bi dawî dibe. Elo dimire û wî binax dikin. Bi şev jina wî Zêzê şîna wî dikişîne û digirî. Nîvê şevê ji paş derî dengêk tê. Bang wê dike ku derî veke. Zêzê ditirse û dibêje tu şeytanqûnî bûye. Derî asê dike û Elo çiqas di ber xwe dide jî nikare derî veke. Vegêrê çîrokê dibê Elo û qala çîroka xwe dike. Piştî wî biax dikin û pê ve xwîn ji pozê wî tê û bi xwe dihesê. Dinere ku di gorê de ye. Ji bo xwe xelas bike di ber xwe dide lê dinêre ku taqek di gorê de vdibe. Cinawirek ji bo cendekê wî derxe tirba wî kolaye. Dibê ez dibêm qey hirçek bû. Berê xwe dide malê. Zêzê derî lê venake. Ji pixêriyê dikeve hundir. Gava ew dikeve hundir jina wî derdikeve û bi nav gund ve direve. Fam dike ku ew ê çî bela bê serê wî. bira û pismamên wî bi ser malê de digirin û ew jî di pêxêrikê re dikevin hundir. Elo radihêje kurê xwe yê di dergûşê de û bi wî xwe ji derbên merên bira û pismamên xwe diparêze. Cîranê wî Qasim bi dengên şiyar dibe û tê mala wan. Ji wî rica dike ku alîkariya wî bike. Qasim bira û pismaman ji hundir derdixe û li wî guhdar dike û pê ve bawer dike ew şeytanqûnî nebûye û bi xwînê ketiye.

#### **2.2.3.8. Şeytanqûnî An Tabûta Şeş Cendek**

Çîrok di qaseya qemyonekê de derbas dibe. Zemanê berê rêwî ji bobîçûna cihekî li Qemyonan jî siwar dibûn û bi heqekî hindik rêwitiya xwe dikirin. Di qaseya qemyona ji Şamê diçe Der'ayê de tabûtek jî heye ku sîparîşa gundiyekî ye. Dinya sar e û ezman tije ewr e. Rêwiyek li qemyonê siwar tê. Piştî bîskekê baran dest pê dike. Rêwî ji bo şil nebe dikeve tabûtê û derê wê li ser xwe digire. Piştî bîskekê di xew re dihere. Pênc heb rêwiyên din jî li qemyonê siwar dibin. Ji wan heye ku miriyek di tabûtê de ye. Pala xwe didin tabûtê û ji xwe re dipeyivin. Gava qemyon dikeve rêya gundan li kortekê dikeve û çeng dibe. Rêwiyê di tabûtê de şiyar dibe û devê tabûtê vedike û rûdinê. Ew her pênc rêwî ji tirsan xwe ji qemyonê davêjin erdê. Rêwiyê di tabûtê de lê dinere ku rêwiyên tevan xwe atêtin ew jî xwe davêje. Ji ber ku qemyon bi lez e ew ê xwe jê davêjin dest û lingên wan dişikê. Rêwî lê dinere ku ew ê di tabûtê de jî xwe ji qemyonê avêt û bera pê wan dide xwe bi erdê re kaş dikin ji bo ku ji wî bi dûr bikevin. Şifêrê qemyonê lê dinere ku rêwiyên tev de xwe ji qemyonê avêtin disekine û diçe cem wan. Ji wan dipirse bê çima xwe avêtine. Rêwî dibêjin me got qey di tabûtê de mirî heye lê gava rabû rûnişt em tirsyan me got qey şeytanqûnî bûye. Piştî wê şifêr ji ew ê di tabûtê de dipirse ku wî çima xwe avêtiye. Ew jî dibêje ku tevan xwe avêt min got belkî agir bi qemyonê ketiye loma min jî xwe avêt.

#### **2.2.4. Çîrokên Kamiran Alî Bedirxan**

Kamiran Alî Bedirxan ji çîroknûsên din cudatir berê paşxaneyêke wî ya nivîskariyê heye. Ev yek di çîrokê wî de heger ne ji bo bikaranîna zimên be jî di warê fiksiyon û hîlbijartina temayan de xwe nîşan dide. Çîrokên wî bêtir xwedî keresteyên avakirina nasnameya neteweyî ne. Ew di çîrokên xwe de balê dikşîne ser dagirkirina welatê xwe û wê hişmendiyê dixwaze di nav gel de belav bike. Lehengên wî çi jin çi jî mêr welatperwer in û daxwazan wan tenê ew e ku welatê xwe bi dest bixin.

##### **2.2.4.1. *Du Egîd***

Çîrok qala du leşkerên Kurd dike ku di şerê ji bo welat de dîl hatine girtin. Gava fam dikin ku Kurdistan wenda bûye, eskerên Kurdan şikestine û serekên wan hatine girtin dilê wan diêşe û li ber xwe dikevin ku ketine dest dijmin. Yek ji wan dibêje ku ew pir diêşe û birîna wî dişewite. Yê din jî dibêje divê ez jî bi te re bimirim lê di stûyê min de jin û zarok hene. Yê dinê lê vedigerine ku ma jin û zarok çi ne. Pêteke ji ya wan mezintir di dilê min de heye ku welatê min wenda bûye. Hevalê ji wî dazwaz dike ku heger bimire wî bibe li erdê Kurdistanê de veşêre. Kolos, tîfing û xencera wî jî bi wî re veşêre da ku gava hespên Kurdan di ser tîrba wî de biborin ew jî rabe bi wan re şer bike da ku welatê xwe bistîne.

##### **2.2.4.2. *Lawikê Min***

Çîrok bi awayê nameyê hatiye nivîsîn. Jinek nameyê dişîne ji mêrê xwe re ku di şerê gava fermana Kurdan de rabûye, miriye. Gurgîn gava haziriya şer dike ji jina xwe re dibêje dawet dest pê dike. Şeş mehan ew şer berdewam dike. Kurdên ku di serî de bi ser dikevin bi bêbextiyê re dişikên û wenda dikin. Gava Gurgîn li şer e kurekî wî çêdibe. Êvarekê tê malê Gurgîn. Birîndar e. Ji jina xwe re dibêje dijmin li dû min e. Diçe ser dergûşê lawikê xwe radike û ji wî re dibêje ku dilê te ji bo alîkariya Kurdistanê ye, xwîna te ji bo şer û rijandinê ye. Pê re dijmin dikevin hundirê malê. Di dawiya çîrokê de vegêr dibêje ku ev pênc sal e ji hev dûr ketine. Bi Gurgîn dide zanîn ku lawikê wî her şev berî here rakeve ji wê re dibêje ku dayê ji bavê min re binivîsîne ku dilê min ji bo hezkirina ji Kurdistanê ye, xurtiya min ji bo alîkariya Kurdistanê ye û xwîna min ji bo şer û rijandinê ye.

#### **2.2.4.3. Dildiziya Gulekê**

Çîrok qala guleke bi efsûn dike. Ew gul li ber deriyê Diyarbekirê di nav erdekî mezin de, di wê kortala mezin û bêdeng de ku di wê kortalê de Şêx Seîd û hevalên xwe veşartî ne, vedibe. Rengê wê gulê xweşik, pelên wê bel û geş in. Gava destekî biyanî dirêjî wê gulê dibe pelên gulê tên hev. Şevkê zabitekî dijmin dikeve nav wî erdî û qesta wê gulê dike. Berî ku gul pelên xwe bigire wê diçine. Gul çawa dikeve nav destên wî sînga xwe vedike û xwe geş dike. Zabit û delala xwe çawa wê bêhn dikin, dimirin.

#### **2.2.4.4. Mêrê Min Di Serî\* De Ye**

Zend û Zîn Evîndarên hev ê deh salan e. Şeva ku dizewicin dahola serxwebûneke mezin jî lê dide. Zend tenê şevkê bi jina xwe re dimîne. Roja din serê sibê tev li şerkeran dibe. Zivistan e. Berf û ba ye. Zend debar nake tîfinga xwe dide hevalê xwe û berê xwe dide malê. Tê li deriyê malê dixê. Zîn dipirse bê ew kî ye. Zend ban wê dike ku ew e, mêrê wê ye. Zîn derî vedike, bi mahdekî tîrş û dengê tîhl ji wî re dibêje “Mêrê min Zend bi welatîyên xwe ve di şerî de ye!!!” û derî digire.

\*: Di kovarê de ev peyv di sernavê de wek “Serî” hatiye nivîsîn lê di çîrokê de em fam dikin ku ew wek “Şerî” hatiye bikaranîn. Em difikirin ku ev yek şaşîyeke çapî ye.

#### **2.2.4.5. Leylana Rastiyê**

Çîrok qala komek mirov dike ku di rêyekê de ne û bi salan dimeşin. Hawirdor reş û tarî ye. Ne xwarin heye ne vexwarin heye. Zarok birçî, pêsîrên dayikan zuha û mirov birîndar di halekî perîşan de ne. Ji dûr ve gund û bajarên ava dibînin, roj li wan hiltê lê di ew rêya ew tê de ne ne roj hiltê ne jî ronahî xuyaye. Rêwî di wê tariyê de rêya xwe wenda dikin û di kortal û çalan de wer dibin. Bi ssalan ev rêwîti berdewam dike. ew koma mirovan şevkê digihêjin zozanekî xweşik. Ronahiyeke zelal jê diçirûse. Hawirdor hêdî hêdî xuya dike. Birînen birîndaran rehet dibin, şîr dikeve pêsîrên dayikan, pîr û yextiyar xwe ciwan hîs dikin. Govendê digirin û ji hevdu dipirsin bê çi bûye. Pîrek û zilamekî yextiyar bi gopalên xwe serê çiyê nîşan didin. Mirovên komê li serê çiyê dinerin. Xortekî bi bejn û bal, çeleng û jêhatî dibînin ku çavên xwe digemirîne û vekêşa tîne xwe. kom ji her du yextiyaran dipirsin bê çi bûye. Dibêjin em dibînin ku ronahiya me ne ji rojê ye lê ji wî xortî ye eev çi mesele ye. yextiyar li wan vedigerînin û dibêjin Kurdistan ji xew rabû.

#### **2.2.4.6. Du Dengbêj**

Di wextekî kevn de qesreke xweşik û hawirdora wî bi gul û sosinan xemîlandî hebûye. Di wê qesrê de mirovekî zalim rûdinê. Wî zalimî qesr ne bi xurtiya xwe girtiye lê Kurdistanê bi destê xwe ew qesr daye wî û gotiye em ê bindestiya wî bikin. Hikum di destê wî zalimî de ye. Lê tenê karê xirabiyê dike. rojekê du heb dengbêj tên qesrê. Yek ciwan yek yextiyar e. Yê yextiyar ji yê ciwan re dibêje ku divê em bi stranên xwe dilê vî zalimî nerm bikin. Dikevin dîwanê. Dest pê dikin û distrên. Di dîwanê de tenê jina yê zalim Sînemxan kurd e. Kêfa xwe ji wan re tîne. Piştî distrên û pê ve ji ber sînga xwe gulekê vedike û davêje ber wan. Zora yê zalim diçe. Ji wan re dibêje ku ji ber we ye mîlet dest ji jinên xwe berdidin û xwe davêjin mirinê. Dibêje ji jinên min tenê ev ma di destê min de wekî din we her tişt jehr kir. radihêje şûr û di sînga dengbêjê ciwan de radike. Her du dengbêj ji dîwanê derdikevin. Dengbêjê ciwan li baxçe dikeve û dimire. Yê yextiyar jî nifiran li qesrê dike û tiştê jê nemîne û bibe xirbe. Vegêr wê yekê dide zanîn ku ev çend salin her carê dîwarekî qesrê tê xwarê û kî çi dike jî nikare rê li ber vê yekê bigire.

#### **2.2.4.7. Eyloyê Pîr**

Mîr Tacîn zilamekî pîr e. Di qesra wî de sêsed carî hene ku her yek bi awayekî din xweşik e. Lê mîr Tacîn dil ketiye Perîxana Şingarî. Tehmê tenê ji wê distîne û û zewqê jê distîne ku wext bi wê re derbas bike. Kurê wî Gûrgîn merxasekî zilaman e. Mîr bi Wî serbilind e. Gûrgîn li talanan dixê û wan talanan tîne qesrê. Rojekê Gûrgîn li hember tirko di şerekî mezin de bi ser dikeve. Xelkê Kurdistanê pê şa dibin û heft ro heft şevan şahiyê li dar dixin. Şeva dawî Mîr ji kurê xwe re dibêje ku ez bi te serbilind im. Ez dixwazim diyariyekê bidim te. Tu çi ji min dixwazî. Gûrgîn jî dibêje ez Perîxana Şingarî ji te dixwazim. Kizîni ji dilê mîr tê. Lê dibêje Perîxan a te ye. Piştî dawet belav dibe Mîr û Gûrgîn ber bi aliyê malê ve diçin. Mîr ji kurê xwe re dibêje ku Perîxan tenê bû ku ez bi jiyane ve girê didam. Kêlî bi kêlî ez hîs dikim ku qewet di canê min de namîne. Gûrgîn van peyvên bi xwe xweş nîne. Ji bavê xwe re dibêje ji roja min xwe dîtiye ez ji wê hez dikim. Mêi dibêje ew ji min hez dike û ji te hez nake. Piştî di ber hevdu de didin û pê ve Gûrgîn ji bavê xwe dipirse “Dixwazî em wê bikujin?” Mîr ji kurê xwe re dibêje ez nikarim wê bidim te. Kurê wî jî dibêje ez bê wê nikarim bisekinim. Ji bavê xwe re dibêje dixwazî em wê bavêjin avê. Bavê wî dibêje tamam. Diçin odeya Perîxanê. Di xew de ye, wê şiyar dikin û jê re dibêjin bide pê me. Perîxan

di rê de fam dike ku çî li pêşiya wê ye. Gava digihêjin serê zinarekî mezin Perîxan diçe serê zinêr û ji wan re dibêje min bavêjin. Mîr wê dixê hembêza xwe maçî dike û wê davêje avê. Piştê wê bi qederekî nema kare tev bigere. Di halekî perîşan de ye. Gurgîn her carê ji bavê xwe re dibê em herin lê Mîr tevnaleqe.cara sisêyan gava kurê wî dîsa dubare dike dibê em herin dest bi meşê dike lê piştî çend gavan disekine û dibêje ma ez ê bi ku ve biçim. Dibê ez zilamekî pîr im û kes nema ji min hez dike. Ma jiyana bê evîn ma ne dînîtiye. Her çiqas kurê wî dixê bîra wî ku we mezinek e, dewlemend e û bi nav û deng e jî, ew dibêje tenê maçêke ji lêva wê bide min bila ev dewlemendiya min ji te re be. Piştî van gotinan berê xwe dide zinar û ew jî xwe davêje avê.

#### **2.2.4.8. Nivîsevan**

Rojek ji rojên payîzê bêhna Iblîs teng dibe û dibêje ez ê herim goristanê miriyekî şiyar bikim û pê re biaxivim. Diçe goristanê û bang yekî dike. Yê di tirbê de nivîsevanek e. Iblîs bang dikê lê Nivîsevan dibêje ez drnakevim. Ji wî dipirse ku ew waliyê tirko ye ya na. Iblîs dibê na. Dibê belkî tu qumandarê wê ye. Iblîs dîsa dibê na. Gava dibê ez Iblîs im dibêje tamam û gorê derdikeve. Berê xwe didin bajêr. Di rê de Nivîsevan ji wî re qala jiyana di gorê de dike. Bizmarek çawa di mejiyê wî de kutane gava ku tabût bizmar kirine, kurmên ku hêdî hêdî goştê canê wî xwarine û kesên ku dihatin ser tirba wî û hwd. Ji Iblîs hîn dibe ku çar sal di ser mirna wî re derbas bûye ketiya sala pêncan. Nivîsevan gazinan dike ku kesên tîn ser tirba wî navê li ser kêlê dixwînin û wî nas nakin teva ku wî ji bo wan xizmet kiriye jî. Piştî digihêjin bajêr gava di ber dibistanekê re derbas dibin dibihîse ku xwendekar yek ji helbestên wî distirên. Gava digihêjin ber kitêbxaneyê mezin dibînin ku xelk li ber kom bûne. Dibîne ku kitêbeke wî bi herfên zêr û zîv nivîsandiye û nîşanê xelkê dikan. Iblîs piştî ku dibîne kêfa wî gelek hat jê re dibêje ku du bixwazî em dûrtir herin. Nivîsevan dibêje na. Min fam kir ku mirin ji bo min tune. Gava vedigere tirba xwe dîsa deng tê wî ku zarokên Kurdistanê helbestên wî dixwînin.

#### **2.2.5. Çîrokên Nûredîn Êsif (Zaza)**

Nûredîn Zaza yek ji wan nivîskaran e ku bi teşwîq û alîkariya Celadet Alî Bedirxan dest bi nivîsandinê kiriye. Di temenkî pir ciwan de dest bi nivîskariyê kiriye. Di destpêka nivîskariya wî de Celadet wî wek Çexovê Kurdan daye naskirin. Temayên



çîrokên wî bi giranî li ser qîmetdayina xwendin û zanînê û welatperweriyê ne. Ji zimanê Faransî çîrok adapteyî Kurmancî kirine û ji zimanê Îngilîzî jî çîrok wergerandine.

### **2.2.5.1. Xurşîd**

Xurşîd dewlementirê gund e. Bi bejn û bal e. Rojekê tê cem mela û jê re dibêje kurekî min çêbû ji bo wî navekî dixwazim ji te. mela dibê bila navê wî Cemşîd be. Kêfa wî ji nav re tê. Piştî şanzdeh salan dîsa rojekê li deriyê mela dixê û ji wî rica dike ku mewlûdekê bixwîne ji ber ku kurê wî xwendina xwe qedandiye. Heyşt sal şûn de dîsa Xurşîd tê li deriyê mela dixê û dibêje min keçikek ji kurê xwe re xwastiye ez dixwazim tu mehra wan bibire. Her cara ku tê cem mela ciwantir û xurtir xuya dike. gava mela sebeba vê yekê jê dipirse dibêje ez bê derd im. Rojekê ew û kurê xwe Cemşîd ji bo kirîna cilên bûk û zava diçin bajêr. Di kelekê de ne. Cemşîd sekanên kelekê dizîvirîne û kelek li ser avê dihere. Ji nişkan ve sekanek ji destê wî dişemite û dikeve golê. Ji bo wê bigire xwe dirêjî wê dike lê ew jî dikeve golê. Bi avjeniyê nizane. dikeve binê avê û hew xuya dike. Piştî sê rojan Xurşîd cendekê wî radihêjê û wî dibe gund vedişêre. Piştî salekê bi şev li deriyê mela dikeve. Mela derî vedike. Mela li devê derî mirovekî dirêj, yextiyar û piştixwar dibîne. Pêşî wî nas nake. gava baş bala xwe didiyê fam dike ku Xurşîd e. Xurşîd kîsek pere aniye ji mela re ji bo ku zarokên gund bide xwandin. Mela ji wî re dibêje Cemşîd kurekî baş bû. Xuyaye tu pir li ber wî dikeve. Ev tişt hat serê min jî. wer em ê hezkirina xwe bidin zarokên gund. Xurşîd malê xwe mela jî zanîna xwe dabûn millet. Piştî şanzdeh salan di gund de daweta çil xortên xwenda û milletperwer li dar dikeve. Xurşîd di serê govendê de ye.

### **2.2.5.2. Gulê**

Dijmin nêzîkî li gund kiriye. Gundî li mêvanxaneyê rûniştine û li çareyekê digerin. Qoço ku wek qiralê çîyan tê naskirin dikeve hundir. ji wan re dibêje ev panzdeh sal e min gelekî guneh kirin. Lê ji bo ez dijmin ji welêt derxim min sond xwariye. Gundî tev dibên em jî bi te re ne. Gulê dibêje ez jî bi te re me. Gulê ji gund e. berî bi çend salan bavê wê ew bi zorê daye yekî, wê jî rojekê mêrê xwe kuştiye û bera pê Qoço daye. Qoço tahdê lê dike, lê dixê lê dîsa jî dest ji wî bernade.

Qoço bi gundiyan re li pêşiya dijmin kemînê datînin. Li bendê ne ku dijmin bi ser wan de werin. Nêrevanek carekê dibêje ji aliyê dijmin yek tê. Yek dibêje ew Gula qehbik e. Cihê me ji dijmin re gotiye. Qoço berdidê wê dikuje. Piştî wê dikuje bi ser

dijmin de digirin. Lê dijmin li ber xwe nade bê berxwedan direve. Kurd dikevin asegehê kes tune. Tenê li odeyekê serê zabitê dijmin ji laşê wî hatiye birîn dibînin. Li ser nivînê jî xenderek heye. Ew xencer ya Qoço ye ew daye Gulê. Di destê zabitê dijmin de gurzek porê Gulê heye. Wê gavê fam dikin ku neheqî li Gulê kirine. Qoço xwe li derî diqelibîne û berê xwe dide dijmin.

### **2.2.5.3. Keskesor**

Çîrok di serdema serhildana Şêx Seîd de derbas dibe. Vegêr zarok e. li bajêr tevliheviyek heye. Herkes li benda wê rojê ye ku biqewime. Di devê herkesî de peyvên wek; şer, Kurd, Tirk, standin, top, kuştin, hatin hene. Mamoste û memûrên Tirk bêzar in. stranên tirkî nema tên gotin û ala Tirkan nema tê çikandin. Leşker direvin. Heta rojekê leşkerên Kurd dikevin bajêr. Li serayê ala Kurdan tê hildan. Milet tev sermest e. Piştî demekê dijmin dora bajêr digire û bi topan li bajêr dixê. Ew sermestbûna millet zû belav dibe. Dijmin bi alîkariya bêbextiya hin Kurdan dikevin bajêr û dest bi kuştinan dike. Ala rengîn ya li ser serayê dadixin û davêjin erdê. Li şûna wê ya xwe dadiliqînin. Bavê vegêr roja ku bajar zêft kiribûn alayêke biçûk dide wî û dibêje wê deyne ser dilê xwe. Vegêr piştî bi şanzdeh salan qala wê bûyerê dike û dibêje ala rengîn di dilê min û di dilê hezar xortên Kurd de pêl dide.

### **2.2.5.4. Perîşanî**

Vegêr li Şamê li ber pencereyekê ye û zozanên Kurdistanê dikevin bîra wî. Bi carekê re xwe li wira dibîne. Li ser kaniyekê bi dengê bilûrekê sermest dibe. Ji nişka ve du heb jendermeyên Romî peyda dibin û ji şivanê xwediyê bilûrê berxekî dixwazin. Şivan bi zimanê wan nizane. Bi Kurmançî bi wan re dipeyive. Jenderme hêrs dibin û bera wî didin wî dikujin. Pişt re vegêr berê xwe dide Cizîrê. Wexta paleyiyê ye, millet paleyiyê dikin. Ji dûr ve wan dişibîne heywanan. Halê wan perîşan e. cilên wan qetiyayî û bêhna pîs jê tê. Zarok pêxwas û nîvtazî ne. Xaniyên wan wek pînikên mirîşkan in. Li aliyekê nexweş li aliyê din heywan di heman odeyê de ne. millet di wî halê perîşan de bê mal û milk e. Ji azayan re dişixulin. Bi nanê tisî û sawarê debara xwe dikin. Axa û şêx keda wan dixwin. Milet ji bo şêx memnûn bikin dikevin dorê û diyariyan ji wî e dibin. Vegêr ji bo qiyasê bike vê carê berê xwe dide Şamê û qala hawirdoreke parqê ya paqij dike, tramway di nav bajêr de digere, li jor balafirek xuya dike. Vegêr vê yekê bi nezanîne ve girê dide û dibêje nezanî perîşanî ye.

### 2.2.5.5. *Hevîna Perîxanê*

Perîxan zarokeke donzdehsalî ye. gava bi hevalên xwe re dilîze bi lîstika şer dilîzin. Ew dibe leşkerê Kurd û hevla wê jî leşkerê Romî. Bavê wê mîletperwerek e. Ji ber wê jî jiyana wî timî di xetereyê de ye. rojekê gava apê wê tê wê ji nav lîskê digire û dibe malê pê dihesa ku bavê wê miriye. Birayê wê tune ye ji ber wê jî bavê wê ew wek kurekî mezin kiriye. Perîzan jêhatî ye. Mem û Zîna Xanî jiber kiriye, ji dîrokan Kurdan pir tiştî dizane û xeriteya Kurdistanê mezin tevî baja û gundan xêz dike. bavê wê bi hevalên xwe re civînekê datîne. Bi bêbestiya yekî Romî wan digirin û dibin qîşleyê wan dikujin. Perîzan piştî mirina bavê xwe dest bi xwendinê dike. piştî şeş salan dibistanê xelas dike. bi evîna armanca bavê xwe tev digere. Rojekê cejneke Romîyan e. Leşker li meydana mezin hatine rêz kirin. Kurd bi plansazî tev digerin. Hawirdor dorpêç kirine û li bendê ne ku îşaret bê dayîn. Perîxan bimbeyekê dixê bin kulîlkan ku ew ê bide hakim. Gava dihere cem wî bimbê diteqîne. Piştî ku hakim dimire Kurd êrişê dikin. Ji ber ku bê serek in Romî xwe li ber wan nagirin. Kurd bi ser dikevin.

### 2.2.6. *Çîrokên Cemîlê Haco*

Cemîlê Haco bi du çîrokan din av çîroknûsên Hawarê de cih digire. Çîroka *Melayê Gulê* nîşanên meselokan di xwe de diheve. Herwiha çîroka *Biserhatiya Reşoyê Darê* jî dîsa ew nîşanên meselokan di hundirê de. Di van her du çîrokan de baweriyeke wisa bi me re çêdibe ku ev çîrok ji sêwirandinê bêtir rengê neqilîkirine didin.

#### 2.2.6.1. *Melayê Gulê*

Wextekî li bajarê Hesenkêfê belengazek heye. Rojê qewdek êzing dibe bajêr difiroşe û debara xwe pê dike. Gulê jina wî ye. Rojekê Gulê ji bo cilan bişo diçe ser avê. Berî wê jina qazî û miftî li wir in. Ji ber Gulê di ser wan re cilan dişo bi zora wan diçe û ji Gulê re xeberan didin, êrişî we dikin û porê wê digirin. Gulê bi girî tê malê. meseleyê ji mêrê xwe re dibêje. Mêrê wê dibêje ew xurt in û ez belengaz im. Tiştêkî em bikin tune ye. Gulê qebûl nake û ji mêrê xwe re dibê divê tu bibî mela ya na tê min berde. Belengaz dike nake xwe ji jinikê xelas nake. Radibe şaşikekê dide serê xwe û diçe ser pira bajêr. Li wira ji jinikê re nivîstekê çêdike û jê re li hevdu tê. Bi nav û deng dibe. Rojekê teyrekî hakimê bajêr heye wenda dibe. Dibêjin ne Melayê Gulê be kes nikare wî bibîne. Tê bang wî dikin. Mela gava di rê de dihere teyr dibîne. Deng ji xwe dernaxe. Gava digihên cem hakim li kitêba xwe dinihere û dibêje teyr li filan derê ye. Bi vî rengî

çi dike ji wî re li hevdu tê. Xişrên qîza hakim, sepetek pereyên hakim bi lihevhatinan dibîne û navdartir dibe. Heta rojekê hakim bang wî dike ku li pêşiya wan li mêja îne bike. Mela ne zane azan bide ne jî qametê bîne. Ji ber ku nizane li mêjê bike ji camiyê direve. Hakim û cemaet jî bi wî re direvin. Çawa ji camiyê derdikevin camî tê xwarê. Vê carê jî ji wî re li hevdu tê. Hakim xwe davê destê wî û dibêje ez koleyê te me tu çi bixwazî ez li bendî te me. Mela jî ji wî dixwaze ku qazî û miftî bispêre wî. Hakim qazî û miftî dispê re wî. bi vî awayî heyfa xwe ji wan hiltîne.

#### **2.2.6.2. Biserhatiya Reşoyê Darê**

Li gundê dara şikefteke mezin û tarî heye. Zemanê berê wek zinadanê hatiye bikaranîn. Şevkê gundî li oda gund rûniştine. Axa ji wan re dibêje kî here şikeftê û darikekî di nava wê de bikute ez ê qîza xwe bidim wî. Reşo radibe û dibêje ez ê herim. Reşo radibe diçe şikeftê. Darikê xwe dikute lê dengê ji dawiya şikeftê tê. Bi wî alî de dihere. Tiştêk tê li ber wî dikeve. Radihêje lê dinere ku destekî jêkirî ye. bi şûnd de davêje dîsa tê li sînga wî dikeve ew dest. Piştî wê nav di xwe dide. Jina wî ye ya ku ew dest avêtiye wî. Jina wî meselê ji wî re dibêje ku pismamê axê hatiye mala wan û doza nebaşiyê ji wê kiriye. Wê jî ew kuştîye û hûr kiriye û aniya şikeftê ji bowî veşêre. Reşo tê odê. Bê mad e. Axa dibêje belkî tirsîyaye. Lê Reşo meselê ji wî re dibêje û ew jî dibêje te baş kiriye.

#### **2.2.7. Çîrokên Ş. Hesên**

Ş. Hesên jî bi du çîrokan di nav van çîroknûsan de cih digire. Zimanê wî ne xurt e. Di warê fiksiyonê de jî ne serketî ye. Çîroka wî ya bi navê *Tirba Spî û Marê Qut* çîrokeke bûyerî ye û di encamê dexwediyê xwe û şîretekê ye. Di çîroka xwe ya *Xewna Rastiyê* de jî lehenga vegêr di xewna xwe de dibîne bi zimanekî propagandîst rewşa ku Kurd tê de ne tîne zimên û gazinan ji wê rewşê dike.

##### **2.2.7.1. Tirba Spî û Marê Qut**

Mirovekî bi navê Muhammed rojekê diçe gerê. Li cihekî bi av û giya de komeke maran dibîne. Dixwaze wan tevan bikuje lê çavên wî di wan de nabire. Di dilê xwe de dibêje heger ez bi aqilmendî vê civatê belav nekim ew ê rojekê bi min bikujin. Li ser vê yekê bang mezinê maran dike û ji wî re dibêje ya şahê maran kêfa min pir ji civata we re hat û ez dixwazim bi te re biratiyê deynim. Şahê maran kêfa wî tê û bi wî re dibe

destbirak. Ji wî re dibêje defneyeke min heye ez ê rojê zêrekî bidim te. Piştî wê her roj Muhammed diçe ber qula mêr û radihêje zêrekî. Bi wan zêran dewlemend dibe. Dixwaze bi wan pereyên dane ser hev bazirganiyê bike. Rojekê lawê xwe dide tengala xwe û diçe ber qula mêr. Ji mêr re dibêje ev kurê min e. Ji îro û bi şûn de tê rojê zêrekî bide wî. Mar dibêje tamam. Roja din lawik diçe ber devê qulê û radihêje zêrê xwe. Difikire ku mar bikuje û zêran tevan bi carekê de bi dest bixe. Roja din şûr di paş xwe de vedişêre û tê bang mar dike. Gava mar derdikeve şûr davêje serê wî. Mar du serî ye. Seriyekî wî difirîne. Mar bi serê xwe yê din pê vedide û wî dikuje. Piştî bi çend rojan şivanek cendekê wî dibîne û hayê mala wî jê çêdike tên wî dibin û vedişêrin. Tirbeke spî ji bo wî çê dikin. Bavê wî ji bazirganiya xwe vedigere. Perê xwe tev wenda kiriye. Piştî u meselê fam dike berê xwe dide qula mar. Bang mar dike ku derkeve. Ji mar re dibêje min pir bêriya te kiriye. Mar serê xwe ji qulê derdixe û ji wî re dibêje ji ber deriyê min here, ne tu tirba spî ji bîra dike û ne ez serê qut.

#### **2.2.7.2. Xewna Rastiyê**

Vegêr bi dengêkî ji xew şiyar dibe. Gava serê xwe radike di ser serê xwe re keçikekê dibîne. Keçik bang wî dike û dibêje ji xew rabe û li dora xwe binere. Ji wî re dibêje heval û hogirên te bi mirazê xwe şa bûne hûn tenê şûna xwe mane. Keçik xwe bi wî dide naskirin ku keçikeke Kurd a çarde salî ye. Ji wî dixwaze ew tiştê ew ê bibêje bi herkesî bide zanîn. Ji wî re qala xweşikî û bedewiya xwe dike. Bi wî dide zanîn ku ji bo ku bi wê re bin hemû xortên dinyê dil davêjin. Lê îro ew ketiye destê neyaran. Dide zanîn ku ji felata xwe bi hezaran xort û sergirdeyên Kurdan li sre sînga xwe xwedî kiriye. Û îro dîsa xwedî dike. Li hêviya wê rojê ye ku xelas bibe. Carekê dibêje bireke Kurdan dirêjî neyaran kirin û gelek ji wan kuştin lê bireke din bêbext derketin û nehiştin bi mirazê xwe şa bibin. Îro jî ew li benda xortên Kurd e û bi şev û roj digirî.

#### **2.2.8. Çîroka Sibhî Resûl**

Di çîroka Wî ya bi navê *Dilawerê Çardesalî* de îdealîzekirina leheng derdikeve pêş. Ev îdealîzekirin di gelek çîrokên Hawarê de derdikeve pêş. Wek me berê jî gotibû avakirin û bilindkirina hişmendiyeke tê arezû kirin di lehengên çîrokan de xwe nîşan didin. Dilawer jî yek ji wan lehengan e ku welatperwerî ji bo wî bi qasî canê xwe bide girîng e.

### **2.2.8.1. Dilawerê Çardesalî**

Ceng e. Serhildana Kurdan e. Kurdan çekê xwe hilgirtine û şer dikin. Dilawer çardeh salî ye. Bi zorê diya xwe qaneh dike û çeka bavê xwe radihêjê û ew jî diçe şer. Şervan diçin bi ser kelehê de bigirin. Digihên pêşiya kelehê û haziriya xwe dikin ku bi ser kelehê de bigirin. Dilawer dikeve pêşiya tevan. Şer dest pê dike. Piştî du saetan kelehê bi dest dixin. Dilawer berî herkesî dikeve kelehê. Ala dijmin dadixe û ala rengîn li şûna wê dadiçikîne. Erdê bin lingên Dilawer sor dike. Ji hevalên wî heye ku ala dijmin avêtiye bin lingên xwe lê ew birîndar e. heval tên dora wî dixwazin birîna wî derman bikin. Lê birîna wî xedar e. Dilawer jî bi vê dizane. Ji wan re dibêje birîna min a mirinê ye. Ji bêrika xwe aleke rengîn derdixe, dide hevalên xwe û ji wan re dibêje ku vê alê bikin kefenê min û ji diya min re bêjin ku birîna min ne ji par re ye.

### **2.2.9. Çîroka Fiad Cemîl Paşa**

Çîrokeke naîf e ku li ser temaya camêriyê hatiye avakirin. Zimanê wê qels e û ne xwediyê sêwirandineke xurt e.

#### **2.2.9.1. Dilgirsî û Dilovanî**

Mirovek xwe û zarokên xwe bi keda piyan xwedî dike. Siheta wî û xurtiya wî ji wî re deriyê kar vedike û ji xwe dişixule. Zemanek tê belengaziyeke mezin dikeve nav xelkê. Nema kar peyda dike ku bişixule. Ew pereyên ku di wexta xwe de ji xwe re danine aliyekî jî xelas dibe lê belengazî derbas nabe. Tiştêk di malê de namîne. Jin û zarok nexweş dikevin. Mirovê feqîr heta wê rojê destê xwe li ber kesekî venekiriye. Lê ji bo zarokên xwe radibe dihere cem cîranê xwe. Du heb cîranên wî hene. Her du jî dewlemendin. Diçe li deriyê yekî dixê. Cîranê wî dest vala vedigerîne. Çavên wî tê nabire ku here cem cîranê din jî. Radibe vedigere malê. dizane ku jin û zarok li benda wî ne ku tiştêkî di destê xwe de bîne. Bi dilekî şikestî dikeve hundir. Wê gavê cîranê wî yê din bera pê wî dide. Jina wî ji wî dipirse bê ji cîranan tiştêk bi dest nexistiye, ji jina xwe re dibêje ma dewlemend ji hezkirina peran pê ve çî dizanin. Wan camêrî û dilovanî ji bîr kirine. Wê gavê derî vedibe û ew cîranî wî yê din dikeve hundir û dibêje te ez jî bi agirê dewlemendan şewitandim. Dewlemend tev ne malperest in. Ji îro pê ve tu jî birayekî min î xwediyê para xwe ye. Heta ew belengazî derbas dibe mirovê feqîr û zarokên xwe di mila cîranê xwe yê dewlemend de dijîn.

### **2.2.10. Çîroka Telet Qedîr Hec Elî Begzade**

Yek ji çîrokên balkêş ên di *Kovara Hawarê* de ye. Heger di warê ziman û bikaranîna zimên de ne pir serkeftî be jî di warê fiksiyonê de serkeftî ye. Balkêşiya din a ku bala mirov dikşîne ew e ku lehengên çîrokê bi temamî kulîlk in û çîrok li ser civîna wan kulîlkan a ku her sal li dar dikeve û di wê civînê de ew kulîlka ku wê salê karekî baş kiriye tê xelatkirin ava bûye. Kêf û şahiya wan kulîlkên gava ew kulîlkên ji Kurdistanê tên xelatê dîstînin li dar dixin wek nîşaneke welatperweriyê derdikev pêş.

#### **2.2.10.1. *Kulîlkên Ko Ji Kurdistanê Tên***

Kulîlk her sal li hevdu kom dibin û biserhatiya xwe ya wê salê ji hevdu re dibêjin. Kîjanê emelekî baş kiribe wê mikafat dîkin. Roja civînê ji bilî sê kulîlkan tev tên ser hev. Nergis, Beybûn û Xecxecok negihaştine ser civînê. Kulîlkên din ji ber ku wext dereng e li benda wan namînin. Kulîlk dest pê dîkin biserhatiyên xwe dibêjin. Gul dibê îsal min tenê dersxana zarokan xemilandiye, Rîhan dibê ez li dawetekê hazir bûm û min sînga xweşikê xemiland, Lale dibê ez berî bi çend rojan li ber serê xortekî nexweş sekinîm û demên wî yê dawî geş û sivik kirin, Binefş dibê ez li ser sifra mîr hazir bûm mîr û mezin bi hevdu dişewirîn gotina wan li ser şer û xerabiyê bû. Bi vî awayî her yekçîroka xwe dibêje. Yê tiştên baş kirine tên pesinandin. Kulîlk dişewirin ku mikafatê bidin kê. Wê demê deri vedibe û her sê kulîlkên dereng mabûn, Nergis, Beybûn û Xecxecok, dikevin hundir. Lêborîna xwe dixwazin û dibêjin em ji cihekî dûr, ji çiyayên Kurdistanê hatine. Dibêjin li wê derê em rastî sê cendekên xortên Kurd hatine ku ew di rêya welat de hatine kuştin, em li ber wan sekinîm û me ji wan re sî çêkir heta ku hevalên wan hatin û ew veşartin. Kulîlk piştî vê biserhatiyê dibihîsin van kulîlkan radikin ser milên xwe û ji wan re li çepikan dixin û dibêjin mikafata salê ya we ye.

#### **2.2.11. Çîroka Derketîkî Dêrsîmî**

Derketîkî Dêrsîmî bi çîroka xwe ya temaya wê yekîtiya Kurdan e daxilî nav çîroknûsên Hawarê bûye. Ji devê zarokekî çîrok hatiye vegêrîn. Çîrokê di ser zarokekî re yekîtiya Kurdan kiriye mijar ji xwe re û sembolên neteweyî derxistiye pêş.

### **2.2.11.1. *Kurd Yek in***

Vegêr zarokekî xwendekar e. Gerîenende zarokekî nû tîne sinifa wan. Zarok paqij, rû esmer û çav kesk e. Mamoste Ferîdûn ji wan re dibêje gerek hûn îro kêfxweş bin. Hevalê we ji Kurdên jorîn e. Ji Mûşê ye. Qedrê wî bigirin ji bo ku xeribiyê nekişîne. Ji bo zanibe ku zarokekî Kurd li her dibistaneke Kurd dikare ji xwe re heval û birayan peyda bike. Bi dû re mamoste li ser xerîteya Kurdistanê Mûşê nîşanî wan dide û ji Gurgîn re dibêje di sîmfê de yê pêşîn tu yî. Divê tu li ser navê sîmfê û li ser navê biçûkên Kurd ên Cezîrê silava xêrhatinê li hevalê xwe bike. Gurgîn xerhatinê lê dike û ji wî e dibêje em tev bira ne û ev der jî welatê te ye û wî maçî dike. sîmf tev ji wan re li çepikan dixê. Mamoste wî li cihekî dide rûniştandin. Ji her aliyê sîmfê ji wî re qelem û defter û qaxiz tî. Kurîkekî ji Silêmaniyê ji wî re resmê seraya Silêmaniyê dişîne. Ala rengîn di ser re pêl dide û diçirûsîne.

### **2.2.12. *Çîroka Cegerxwîn***

Cegerxwîn ji bilî helbestên xwe tenê bi vê çîrokê re navê xwe li nav çîroknûsên Hawarê de nivîsandiyê. Ji çîrokeke sêwirandî zêdetir nîşanên çîrokên gelerî di xwe de dihewîne. Xwedî temayeke rêvebirîya xerab e k udi dawiyê de ew rêvebir ji bûyerekê ibretê digire û dikeve rêya rast.

#### **2.2.12.1. *Behramê Gor***

Gava bavê Behramê Gor dimire ew xortekî bengî ye. Ji wî re taca keyanî dimîne. Ew tacê dide serê xwe û li ser text rûdinê. Ji bav û kalan de welatê Faris di destê wan de ye. Behram piştî demekê berê xwe ji keyaniyê diguhere û bera pê saz, lîsk û nêçirê dide. Rêveberiyê dixê destê zalim û xwînxwaran. Roj bi roj belengaziya xelkê zêdetir dibe û welatê Faris roj bi roj zeîf dibe. Dijmin bi rehetî dest davêjinê. Milet di ber lingên dijmin de dihere û gelek mezin ji Faris dievin û dikevin ber destê dijminan. Rojekê bi mopîzan û pêlewanên xwe re diçe nêçirê. Li ser bajarêkî kavil rast tî ku du kund li ser dixwînin. Behram dibêje xwezî min zanîbûya çî dibêjin. Yek ji mopîzanên wî radibe û dibêje heger tu ferman bidî ez ê vê kulê ji dilê te derxim. Behram fermanê dide. Mopîzan dibêje yek mê û ek nêr e. Yê nêr gazî ya mê dike û dibêje êvarî wer cem min razê, em ê li ser gotina Xwedê û pêxember herin ji bo ji me re zarok çêbibin. A mê dibêje qelenê min çil bajarên wêran in ji bo em zivistanan lê bilûsin û biharan li ser bixwînin. Ê nêr dibêje bila serê Behramê Gor sax be ez ê ji neha heta bi deh mehan çar



sed bajarên wêran bidim bavê te. Behram gava van gotinan dibihîse dikeve çadira xwe û bang seydayê xwe dike. Ji wî re dibêje ez ê çawa bikim. Mopîzan ji wî re dibêje te mirovên xwînxwar û zalim kirine rêber û serdar. Vana ji ber deriyê xwe bi dûr bixe û zêr û zîvên wan li belengazan belav bike. Bila guhên te ji dengê belengazan re vekirîbe û çavên te ji wan re belkirî be. Behram van gotinan dixwe serê xwe û nav û nîşanek bilind li dû xwe dihêle.

### **2.2.13. Çîroka Dilistan**

Dilistan jî tenê çîrokek nivîsandiye. Zimanê çîrokê ne xurt e. Fîksiyon zeîf e. Betir dişibe çîrokên gelerî. Ibretgirtina Melikekî ji şivanekî temaya çîrokê pêk tîne.

#### **2.2.13.1. *Melik û Koçer***

Melik Xelîl melikê Hesenkêfê ye. Rojekê bi leşkerên xwe re diçe nêçirê. Birek kovî rakirine. Melik beranekî ji kerî vediqetîne û dajo heta bi gelyekî kûr. Di wî geliyê de şivanek li ber pezê xwe ye. Melik beran wenda dike tê cem şivan silavê dide. Şivan silava wî venagerîne. Melik bi zora wî dihere û ji şivan re dibêje heçî şivan in wek keran in, bala wan li ser kar û berxan in ne li ser silava camêran in. Şivan lê vedigerîne û dibêje ker ew e ku ne li ser karê xwe ne û nêçir ji xwe re kirine kar. Melik dienire ji şivan re dibêje tu şivanê kê yî û navê te çi ye. Şivan ji wî re dibêje çi karê te jê ye tu ji xwe re li karê xwe binere. Wê gavê leşker dora wî digirin. Melik ji leşkeran re dibêje wî bikujin. Şivan destûra peyvê dixwaze, Melik destûrê didiyê. Şivan meseloka çivîk û baz ji wî re dibêje ku dişibe çîroka Melik. Çivîk ji baz re dibêje hero karê te seyran e û tû guh nade karê xwe. Baz hêrs dibe û çivîk dixwe nav pençê xwe. Piştî çivîk dikeve nav pençê baz ji wî re dibêje tu karî min bixwe lê zikê te bi min têr nabe. Baz çivîk azad dike. Melik gava li vê çîrokê guhdar dike kêfa wî ji şivan re tê, xelateke mezin dide wî û ji çîroka wî ibretê digire.

### **2.2.14. Çîroka Şêx Abid**

Şêx Abid jî tenê çîrokek nivîsandiye di Hawarê de. Ne zimanê wî ne jî fîksiyona çîroka wî ne xurt in. Heger mirov di warê mijarê de lê bifikire mirov dikare bibêje ji çîrokin din ên di Hawarê de cudatir e. Zemanê çîrokê vedigere heta bi zemanê Silêman pêxember. Kûçikê ku neheqî lê dibe di dîwana Silêman pêxember de digihêje heqê xwe.

### **2.2.14.1. *Segê Jar û Şêxê Teyles***

Di dema Silêman pêxember de şêxekî teyles heye. Cilên wî kesk in. karê ticaretiyê dike. Serê sibê ji mal bê taştê derdikeve. Qîza wî dû re ji wî re taştêya wî dibe cihê karê wî. Rojekê taştiya wî ser û pê ye. Şêx li ber xwe datîne û dixwe. Kûçikê jar jî li ber wî xwe avêtiye erdê û li bendê ye şêx çend hestiyar bavêje ber wî. Lê şêx navêje. Qîza wî bi çavekî xezebî li wî dinere û dipirse bê çima ew hestiyar navêje ber. Şêx dibê ez bixwim ez ê bavêjim ber. Têr dixwe û pê ve radihêje hestiyar û davêje kûçik. Kûçik bi qêrin û hawar xwe digihîne cem Silêman pêxember. Gilîyê xwe dike. Silêman pêxember dibêje wî şêxê kesk bînin vira. Şêx tînin. Silêman pêxember dipirse ku çima wî hestî avêtine kûçik. Carekê duduyan şêx deng nake. Di ddawiyê de dibêje ew kûçikê heimî û pîs e. Her roj tê cem min. Ji min re ne baş e ku li nêzikî min rûnê û min biherimîne. Silêman pêxember li kûçik vedigere û dibêje ez jî di berdêla destê te destê wî bişkînim. Kûçik dibê na. Silêman pêxember dibêje ez wî ji bo te hebîs bikim kûçik dibê na. Dibêje ka ez ji bo te çi bikim. Kûçik dibêje ez dixwazim tu van cilên şêx en baweriyê jê dînî û yê ji rêzê li wî bike ji bo ku heywanên din bi van cilan nexapin û nêzikî şêx nebin. Silêman ferman dike, cilên şêx jê dîkin û yê adetî lê dîkin.

### **2.2.15. Çîroka M. Emîn Silêman**

Yekemîn çîrok e ku temaya wê rasterast bi xayintiyê ve girêdayî ye. Ji çîrokên din cuda, ku di çîrokên din de tenê gava behsa bûyerekê dibe tê gotin ku hinekan xayintî kirine, rasterast bi semboleke êdî li ser navê xayintiyê bûye semboleke Kurdan çîroka xwe ava kiriye.

#### **2.2.15.1. *Mîr û Nêçirvan***

Rojekê mîrê Botan bi hin hogirên xwe re diçe geştê. Gava digihêjin navsera çiyayekî mezin li ber berekî mirovekî dibînin. Mîr dixwaze fam bike bê ew mirow çi dike. Diçin cem wî. Ji mirov dipirsin bê ew çi dike. Mirov dibê ez nêçirvan im. Ji wî dipirse bê ka tajî û tolên wî. Nêçirvan dibêje ez li ber kewan im. Mîr dipirse bê tiving ew çawa kewan digire. Nêçirvan dibêje kewê min yê ribat heye. Ez dahfa li dora wî vedidim, ew dixwîne, kewên li çiyê tev vê bikevin dehfan û ez ê wan bigirim. Mîr li kew dinêre û dibêje: Hey heywanê bênamûs tu çawan heval û hogir û welatîyên xwe bi destên xwe ji dijmin re dixwe dehfan. Şûrê xwe derdixwe û kew parçe parî dike û ji xelkê li dora xwe re dibêje ez ji wî kesê ku heval û hogirên xwe bi destê xwe dixwe dehfen dijmin

hez nakim. Heqê wî kesî kuştin e. Vegêr vê çîrokê bi meseleya kurdan ve girê dide û dibêje em ew kew in, ji ber wê jî ji me re mîr û şûr lazim e ji bo yekîtiya me çê bibe.



## BEŞA SÊYEM

### 3. TEMAYÊN ÇÎROKÊN DÎ KOVARA HAWARÊ DE

Kovara Hawarê piştî serhildana Agiriyê dest bi weşana xwe kiriye. Berî serhildana Agiriyê jî serhildana Şêx Seîd qewimiye. Her du serhildan jî bi şikestina hêzên Kurd encam bûne. Çîrokên di Hawarê de hatine weşandin herî zêde temaya şer/serhildanê bikar aniye. Di baweriya me de ev yek jî bi wê ve girêdayîye ku ew trawmayên her du serhildanan hiştine ku rewşenbîr û siyasetmedarên wê serdemê li çareyin din bigerin ji bo gihîştina armancên xwe. Wê serdemê tê fam kirin ku di wan şert û mercên heyî de serkftineke neteweyî pir zor e. Yekîtiyeke Kurdan tune, hişmendiyeke neteweyî ya Kurdan tune û zanîneke bi giştî ya ku van nerênîyan jî holê rake jî tune. Ji bo wê jî tiştê lazim ew bû ku Kurd zane bibin, xwende bibin û ji bo karîbin doza xwe bimeşînin bi her awayî gihastî bin.

Hawarê li ser daxwaza avakirina wê hişmendiyê dest bi weşana xwe kir. Di destpêkê de jî ev yek daye xuyakirin û gotiye ku ew ê dûrî siyasetê be. Ji ber vê sedemê jî hema hema temamê nivîskarên ku çîrokên wan di Hawarê de hatine weşandin naveroka çîrokên xwe li gor vê armancê danîne û bilindkirina wê hişmendiyê wek wezîfeyekê ditîne. Avakirina nasnameya neteweyî wek armanca sereke ya çîrokan xuya dike. Pê re hezkirina ji ziman, hezkirina ji nirxên neteweyî, qîmetê zanîne ji bo pêşketina neteweya Kurd, alaya Kurdistanê, yekitiya Kurdan wek paşxaneyekê giştî ya çîrokan hatine bikaranîn.

Ji hêla temayê ve gava em bala didin çîrokan em bi wê yekê dihesin ku hema bêje di temamê çîrokan de di ber temaya xwe ya esasî de temaya avakirin û bilindkirina nasnameya Kurdî jî hatiye bikaranîn. Ev yek nîşan dide ku wan wezîfeya siyasetmedaran jî danîne ser milên xwe û çîrokên xwe xwestine siyaseta xwe jî bikin. Temayên di çîrokên Hawarê de hatine bikaranîn em dikarin bi vî awayê rêz bikin. “şer/serhildan”, “xelaskirina welat”, “Hesret”, “şer/adetên eşîrî”, “evîn”, “fedakarî”, “poşmanî”, “bîranîn”, “zanîn/xwendin”, “hezkirina zimên”, “rêvebir/rêvebirî”, “ol”,

“heyfhilanîn”, “xurafe/baweriyên batil”, “welatperwerî”, “hêvî”, “qedirnasi”, “mêrxasî”, “sedaqet”, “timayî”, “bindestî”, “camêrî”, “yekîfî” û “xayintî”.

### 3.1. Şer/Serhildan

Çîroka “*Lawikê Min*” a ji aliyê Kamiran Alî Bedirxan hatiyê nivîsîn, nameyeke ji şervanekî re ku hevîna wî ji wî re nivîsandiye. Şervan birîndar e. Dijmin li pê ye. Ew diçe di ser serê lawikê xwe yê di dergûşê de disekine û ji wî re dibêje “Tacîn! Dilê te ji bo arîkariya Kurdistanê ye. Xwîna te ji bo şer û rijandinê ye.”<sup>67</sup> Ev yek bi me dide zanîn ku şer hatiye wendakirin û xelasiya Kurdistanê di şer de ye. Di vê derê de em ew trawmaya her du serhildanên têkçûyî dibînin. Leheng xelasiyê wek hêviyekê di nifşê nû de dibîne.

Çîroka Nûredîn Zaza ya bi navê “*Keskesor*” qala serfiraziya serhildaneke Kurdan dike ku em fam dikin serhildana Şêx Seîd e. Di serî de bajar di destê Tirkan de ye. Piştî şer vê carê dikeve destê Kurdan. Alaya ku li ser avahiyên fermî wek nîşana serkeftina wî şerê tê xuya kirin. Lê zêde dewam nake ev yek. Leşkerên Tirkan dîsa digirin ser bajêr û wî bi dest dixin. Di vira de gava leşkerên dijmin bajêr dorpêç dikin û dixwazin têkevin nav bajêr, ji ber ku kesekî çekhilgir di bajêr de nemaye, zarok, jin û pîr û nexweş derdikevin hemberî dijmin û şer dikin. Lê bi ketina dijmin ya bi nav bajêr re serhildan têk diçe.

Di çîroka Nûredîn Zaza ya bi navê “*Hevîna Perîxanê*” de serhildan bi fedakariya lehenga bi navê Perîxanê bi ser dikeve. Perîxan keçeke ku bavê wê bi destê dijmin hatiye kuştin. Xwende ye û bi plansaziyekê çalakiyekê li hember serekê dijmin pêk tîne. Bimbeyekê di nav gulên ji bo pêşkêşî serekê dijmin bike vedişêre û gava dikeve çadira wî diteqîne. Bi xêra vê çalakiya Perîxanê serhildan bi ser dikeve û Kurd ala xwe dadiçikînin.

Bikaranîna vê temayê di çîrokan de bi armanca du tiştan e. Yek jê ew e ku ew trawmaya ji her du serhildanan maye bê sibikkirin a din jî xelasiya Kurdistanê di kirina serhildanekê de tê dîtin.

---

<sup>67</sup> Hawar, hj. 4, Amd. Firat Cewerî, Weşanên Nûdem, 1998, Swêd, rp. 492

### 3.2. Xelaskirina Welêt

Wek me berê jî gotibû ji ber ku di Hawarê de siyaset nayê kirin, nivîskaran fikir û nerînên xwe yê siyasî bi rêya çîrokê anîne ziman. Ji van fikran ya herî xuya û li pêş fikra xelaskirina welêt e. Komara Tirkiyeyê hatiye ava kirin, Kurdan tu maf bi dest nexistine, zane û rewşenbîrên Kurdan hatine sirgûnkirin û serhildanên ku bi wê dozê ve rabûne bi ser neketine. Di destê nivîskaran de ew yek maye ku welatê xwe di çîrokên xwe de xelas bikin û wê hest û ramanê di nav gel de belav bikin.

“*Hawar Hebe Gazî Li Dû Ye*” çîroka yekemîn a di Hawarê de hatiye çapkirin e. Nivîskarê wê Qedri Can e. Di vê çîrokê de vegêr xewnê dibîne ku li cihekî ji berf û pûkê pêk tê dbas dibe. Lê dike û nake dawiya wê nayê heta ku ji ser hişê xwe diçe. Dike hawar. Wî welatê ji berf û bagerê em dikarin wek bêwelatî yan jî welatê dagirkirî jî fam bikin. Ji berk u gava li malê bi dengê kurê xwe şiyar dibe kurê wî jê re dibêje me xort û canan dijminên xwe qels kir me welatê xwe ava kir. Di vira de piştî ku welat ava dibe û pê ve vegêr bi ser hişê xwe de tê. Bindestî wek jiyîna din av berf û bagerê de hatiye temsîlkirin.

Çîroka Osman Sebrî ya bi navê “*Li Goristanek Amedê*” bi mekanê xwe ve çîrokeke balkêş e. Mekan goristanek li Amedê ye û miriyên di wê goristanê de dibin lehengê vê çîrokê. Balkêş e leheng tev ji wan kesan e ku di rêya avakirin û xelaskirina welat de şehîd ketine. Li wê alemê jî vala nasekinin û xebatên ji bo xelaskirina welat didomînin. Civîna mezin tê gerandin û rê û nîşanên xelaskirina welat tînin nîqaşkirin. Di çîrokê de her çiqasî pêşketineke fîzîkî ya mekan xuya bike jî tevger û çalakiyên wan ên ji bo avakirin û xelaskirina welêt balê dikişîne. Gava vegêr ji mamê xwe dipirse bê ev der ne bihişt e, mamê wî lê vedigerîne û dibêje “Na! Hire qada xebata welêt e.”<sup>68</sup> Dîsa bi armanca hişyarkirin û serwextkirina millet rojnameyeke bi navê “Hişyarî”yê derdixin.

Çîroka Kamiran Alî Bedirxan “*Du Egîd*” çîroka diyalogeke di navbera du leşkerên Kurd de ye ku dîl hatine girtin. Yek ji wan birîndar e û ji birîna xwe gazinan dike. Hevalê wî dibêje ez jî dixwazim bi te re bimirim lê jin û zarokên min hene. Gava hevalê wî wisa dibêje yê birîndar ji hevalê xwe re dibêje welat ji dest çûye jin û zarok ji bo min çi ne. Ji ber ku xelaskirina welêt yekem armanca wî ye wesiyata xwe li hevalê xwe dike ku wî bibe Kurdistanê û bi teva çekên wî, wî veşêre. Vê yekê ji bo wê

---

<sup>68</sup> Hb. rp. 587

dixwaze ku gava roj hat û Kurdan dîsa serî rakirin û dest bi şer kirin dîsa rabe û bi wan re şer bike. Vê yekê wisa tîne ziman.

*“Dema reпреpa hespên egîdên kurdan di ser tirba min re biborin û dengê tîfîng û topan bîn, ez bi çekên xwe ve ji tirba xwe, xwe hilavêjim ji bo stendina welatê xwe!! Ji bo stendina welatê xwe!!..”<sup>69</sup>*

### 3.3. Hesreta Welêt

Hesret, bi maneya xwe ya ferhengî bêrikirin e. Hesreta welêt jî ew hesret e ku mirov ji welatê xwe dûr be û bêriya wî bike. Her çiqas gelek ji nivîskarên Hawarê li sirgûnê ne jî ev tema di çîrokên wan de zêde xuya nake.

Di çîroka Qedrî Can a bi navê *“Gundê Nûava”* tenê de hesret wek tema xuya dike. Vegêr di serî de qala xweşî û erênîyên gundê lê ye dike. Her tişt gava ji derve de mirov lê dinere xweş xuya dike. Vegêr bi xwe dibêje ku gund gundê me, baxçe baxçeyê me ye. Her tişt tekûz e. Lê ev xweşî û tekûzî têra wî nake ku bêriya welatê xwe, axa bav û kalê xwe neke. Ji bo mezinbûna wê hesretê bîne ziman dibêje “ Carekê werin, hundirê min verojin dilê min jê derînin û bi kêreke tûj çînî çînî bikin, wê gavê ev çîniyên dilê min ew ê bêne peyivîn û pê re bêne girîn.”<sup>70</sup>

### 3.4. Şer/Adetên Eşîrî

Serdema Hawarê dest bi weşanê kir di nav Kurdan de jiyan û tevgera eşîrî xurt bû. Her çiqas îro em bi çavveki nerênî lê dinerin jî wê serdemê nerîneke bi vî rengî tune. Li dijî wê bi awayekî erênî navê serekên eşîran tên hildan û tên pesinandin. Gelek serekeşîr alîkarî bi Hawarê re kirine ku karîbe weşana xwe bidomîne. Ji nivîskarên ku çîrokên xwe li ser temaya şer û adetên eşirtiyê ava kiriye yek Osman Sebrî ye. Osman Sebrî ji malbateke serekeşîr e. Biraziyê serekeşîr bi xwe ye û di ciwaniya xwe di biryardayîna de peyva wî jî derbas dibe. Ji van çîrokên ku temaya wan çalakiyên eşîrî ne du heb jê mijara wan şer e. Yek jî bi mijara adeteke eşirtiyê ce girêdayî ye.

Di *“Besreka Zêrîn”* de Qedrî Can ji çîroka xwe re çavsoriya serekeşîrekî kiriye mijar. Meksê mîrê Besreka Zêrîn bi nameyeke ji Mîrzoyê Burca Metînan aciz bûye.

---

<sup>69</sup> Hb. rp. 47

<sup>70</sup> Hb. rp. 487

Mîrzo daxwaza qîza wî ji wî dike. Di nameyê de xuya dike ku ev cara çaran e ji wî re dinivîse. Vê carê gotiye cara dawîn e ji wî re dinivîse. Ev yek bi zora Mekso diçe. Giliyê xwe bi lawê xwe dike. Ji ber ku ew tiştên Mîrzo nivîsîne “ne pariyê daqurtîne ye.”<sup>71</sup> Li gor adetên eşîrî ya ew ê ev parî daqurtanda û bi ya Mîrzo bikira qîza xwe bida wî ya jî ew ê şer bikira. Meks vê yekê danaqurtîne û şer dike. Gava şer wenda dike û Besreka Zêrîn xera dibe û qîza wî ji dest diçe vê yekê ranagire û xwe dikuje.

Di eşirtiyê de helbet ne tenê şer û tiştên nerênî hene. Pergala eşirtiyê xwediyê xwe û urf û adetên erênî ye jî. Yek ji wan adetan ku wek nîşana mezinantiyê jî tê qebûlkirin efûkirin e. Heger tu karîbe yekî xwe avêtiye te efû bike ev mezinantiya te rê dide.

Osman Sebrî di çîroka xwe ya bi navê “*Warê Min Ne Î Kor E*” de wek mijar ev nîşana mezinantiyê “efûkirin” hîlbijartiyê. Qadir axa bavê sê kuran e. Kurê bi navê Hemê li herêmê bi mêraniya xwe deng vedaye. Mistefa kurê bi çûk e. Bi destê neyarekî ve tê kuştin. Neyarê wî dikuje ji malmezinê eşîreke din e. Seyid Weqas ji tîrsa Hemê nema zane ew ê çawa bike. Gava fam dike bi revê ew ê xelas nebe radibe berê xwe dide mala Qadir axa ji bo xwe dextlî wan bike. Yek ji adetên eşirtiyê jî ew e ku gava ku yekî xwe dextlî te kir tu wî efû bike. Gava xeber tê û dibêjin ku Seyid Weqas hatiye hewşê ji bo dexlandinê bav li odê Hemê jî li aliyê malê ye. Her du bi hev du re heman tiştî difikirin. Bav dibê Hemê serhişke dibe ku tiştêkî bike, Hemê jî dibêje dibe ku bavê min bi mihrîvaniya bavîtiyê dexaleta Seyid Weqas qebûl neke û navê camêrî û dilgirsîyê ji ser mala Êsiv axa rake. Ji ber ku li navê camêrtî û dilgirsîyê ji bo malekê wek şeref tê dîtin. Her du ber bi hevdu ve tên û bi hev re “Ev e Seyid Weqas tê ye û xwe davê je mala me. Divê em tê de biborin.”<sup>72</sup> Piştî bi nêta hevdu fam dikin du hêsir ji çavên Qadir axa tên xwarê. Hemê dibêje qey bavê wî ji ber kubi zora wî diçe ku neyarê xwe efû bike digirî. Lê bav ji wî e dibêje “gava min tu li ser vê rêya camêr dîtî ji kêfxweşiyên ev hêztir bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşiya min ev e ko min zaniye warê min ne î kor e.”<sup>73</sup>

Osman Sebrî di çîroka xwe ya bi navê “*Pira Genderê û Hemûşê Kulik*” de di ser şerên eşîran re ku bi daxwaza heyfhilanînê tên kirin mêrxasiya Hemûşê Kulik derdixîne

---

<sup>71</sup> Hb. rp. 108

<sup>72</sup> Hb. Cîld 2, rp 1083

<sup>73</sup> Hb.



pêş. Di nav eşiran de kesê ku dest hiltîne û bi zanebûn û xurtiya xwe neyarê xwe têk dibe bi nav û deng dibin. Gava ku mesele tê ser şibandin bi navê wî kesî tên kirin. Hemûşê Kulik jî yek ji wan lehenga ye ku bi xurtî, mêranî û zanebûna xwe bi nav û deng e. Hemûşê Kulik jî aliyê neyarên wî ve du sê caran rêya wî hatiye birîn lê her carê xelas bûye. Cara dawî li ser pira Genderê dikeve kemîna dijminê xwe. Gava digihêje nîvê pirê dijminê wî ji her du aliyan ve serê pirê digirin û ji wî re dibêjin tê îja bi ku de here. Hemûş gava dibîne xelasî tune ye berê hespê xwe dide çem ku gelekî bilind e û dibêje “vê carê jî vir da, teqez ji destketina neyar çêtir e.”<sup>74</sup> Bi hesp re xwe ji pirê davêje lê berî bikeve avê bi çend gazan xwe ji ser hesp çeng dike. Hesp dimire lê ew bi vê zanebûna xwe ji destê dijmin difilite.

### 3.5. Evîn

Evîn yek ji wan temayan e k udi çîrokên Hawarê de pir hatiye bikaranîn. Di van çîrokan de tiştê bala me dikişîne ew e hemû evîndar bê mirad dimînin. Tenê di çîroka bi navê “Klêopatê” de evîndar pêşî digihêjin hev lê bi dû re ew jî ji hev diqetin.

Di çîroka “*Hêva Çardeşevî*” ya Qedrî Can de vegêr evîndarê heyvê ye. Ya jî evîndara xwe dişibîne heyvê. Di vira de em dikarin bibêjin ku heyv temsîliyeta evîndarê dike. Heyv bi gotina “Belê min tu dît nedît, bêhemdî xwe warqilîm. Bejn û bala te, ez bê hiş kirim. Maç iman nabêjim? A bê hiş ez im!.. Lawikê min ez hêvîna te me!”<sup>75</sup> evîna xwe ji vegêr re eşkere dike. Vegêrê evîndar dike nake nema zane ew ê çî bersivê bidiyê. Hîna di wê rewşêde ye dibîne ku ewrekî reş tê û ser heyvê digire. Ji xew vediciniqe vegêr. Em fam dikin ku xewnek dîtiye. Lê belê gava em dibînin ku dibêje “Ew, ne xewn bû. Ew, ne xeyal bû. Ew, ne hêv bû. Ew ser hatiyek qewimî; gewra min, rinda min, dilketiya min bû. Ewrê reş jî diz anim kîbû.” Em têdigihên ku ev xewn û hêv û ewrê reş temsîliyeta kesan dikin ku vegêr jî vê yekê diselmîne. Poşmanî dest xistiye pêsîra vegêr. Ji ber ku bi miradê xwe şa nebûne vegêr fedîkar e.

Di çîroka “*Klêopatê*” ya Celadet Alî Bedirxan de evîndar vê carê melîkeya Misirê ye. Melîke zû evîndar dibe û zû jî aciz dibe. Ew kesê ku dilê wê dibijê şevêkê bi wê re derbas dike û careke din kes nema wî dibîne. Tenê evîna wê ya li hember Antonyo rast xuya dike. Antonyo jî ne li wir e. Wek kumandarê ordiwa xwe li şer e.

---

<sup>74</sup> H.b, Cild 2, rp. 1098

<sup>75</sup> H.b, rp. 127

Klêopatré li bendî wî ye. Piştî ku Antonyo tê bi hevdu re dizewicin. Lê ji ber ku Antonyo berê zewicî ye û dev ji jina xwe berdaye, birayê jina wî Oktavyo li hember wî derdikeve û ew dibe serekê Romaniyan. Oktavyo ji bo heyfa xwişka xwe hilîne bi ser Misirê de digire û doza Antonyo dike. Gava ku şer berdewam e di dilê Klêpatrê de jî şerrekî din heye. Evîna wê ya li hember Antonyo vemirî ye û dilê wê ber bi Oktavyo ve xerq dibe. Lê nagihêje miradê xwe. Di dawiyê de ji hêla marekî ve tê kuştin.

Di çîroka “*Şûşa Dilan*” a Celadet Alî Bedirxan de em li rastî evîndareke jin tên ku ji du kesan bi heman awayî hez dike. Di vê çîrokê de dil ji bo hebûna evînê hatiye sewirandin. Ji her du dildarên xwe re jî dibêje “Çawan ez ji te hez nakim, ez perestişkara te me...”<sup>76</sup> gava her du evîndarê wê diçin şer Vêna ji wan re dia dike ji bo ku bi silametî vegezin. Wek îspata evîndariya xwe ji Xwedê şaveşav dike û dibêje “Min ew sipartine te, tu wan bisitirîne.”<sup>77</sup> Gava agahiya mirina yek ji evîndarê wê tê ji êşa evîna xwe qesta canê xwe dike û xencerê li ser hêşa çepê ya singa xwe dixê. Ev yek wek nîşana ciwê yekê ye ku dilê wê diêşe û xencerê li wî cihê diêşe dixê. Teva ku dilê wê disekine jî namire. Radibe ser xwe û jiyana xwe berdewam dike. Dema xebera mirina evîndarê wê yê dinê jî tê dîsa heman êşe dikişîne û dîsa xencerê di sînga xwe re radike. Vê carê li hêla rastê dixê û dimire. Gava bijîşk ji bo dilê derxin û wek yadigar bidin Klêopatreyê sînga wê vedikin dibînin k udi sînga wê de du dil hene. Wê tê famkirin ku Vênayê di her dilekî xwe de evînek xwedî dikir.

Di çîroka “*Li pêşberî Yarê*” ya Osman Sebrî de vegêr bi nameyekê evîna xwe ji evîndara xwe re vedigêre. Ji wê re dibêje ku piştî evîna welêt vê carê jî bi ber bayê evîna wê ketiye. Vegêr ji evîndara xwe re dibêje ku ew naxwaze “wek evînerên mayî peanê rûçik û sinçiyên te bidim.” Ew cuda ye ji her kêsî. Ji ber vê yekê jî ew evîna xwe ji her kesî cudatir tîne zimên. Bi van gotinên li jêr em dibînin ku evîndara wî di çavên wî de çawa xuya dibe.

*“Zerîya min! Heke di vî zemanî de bawerîya min bi rabûna miriyan tune bûye jî, ji îro pê ve min bawerî bi wê yekê heye.*

*Dergehê dilê min, yê ku wekî tehtan bi tu tilîsman venedibûn, nêrîke te ew dergeh bi gengazî vekir. Canê min, yê ko her diçel jînê şer bû û ji hev bêzar bû bûn; heyîna te ew ji hev ra kirin yar.*

---

<sup>76</sup> Hb. cild 2, rp. 1084

<sup>77</sup> Hb. cild 2, rp. 1085

*Heke Mesîh niriye n xwahişgerên jînê divejandin, te xweşekî xwahişgerê mirinê li jînê vegerand. Erê, çiqas ko tu ne Mesîh bî jî, hemîn tu mesîhî yî.*

*Ez di çavên te da kaniya jînê dibînim. Heke tu bi xwe ne jîn bî jî, teqez tu fehreştaya jînê yî.”<sup>78</sup>*

Di çîroka Kamiran Alî Bedirxan ya bi navê “*Eyloyê Pîr*” de evîn şerekî di navbera bav û law de ye. Bav û law her du jî dil dikevin heman jînê. Mîr Tacîn mirovekî pîr e. Di nav sêsed cariyeyî de dil dikeve keça Şingarî. Ji ber ku “kesekî ji wan hinde keçika Şingarî hevîn seh ne dikir û hejkirina wê qasî a şingarî têr pel û pereng nebû.”<sup>79</sup> Mîr Tacîn rojên xwe yê dawî bi kêf derbas dike. Gurgîn lawê wî ye. Mêrxasek e. Di şerekî de li hember Tirko bi ser dikeve. Li qesrê kêf û şahî tê danîn. Roja dawî bavê wî pesnê wî dide û ji wî re dibêje tiştêkî ji min bixwaze. Gurgîn gava vê yekê dibihîse “çavên wî wek stêrên esmanan diçirisin.” Ji bavê xwe keça Şingarî dixwaze. Piştî wê daxwazê mîr bêdeng dimîne. Lê “hawara dilê xwe a bi şewat dibihîse.” Qebûl dike mîr. Bi bihîstina vê yekê re “Gurgîn sor bû, çavên wî ji Şahiyan de çirisi...”

Mîr serê wî dikeve ser sînga wî û êşa wê biryarê wî diêşîne. Pişt re gava Mîr bi Gurgîn re tenê dimîne ji wî re dibêje “Rûj bi rûj jîna min vedimire û dilê min ê pîr her rûj sistir dibe û agirê sînga min her xwe kêm dike, tinê hejkirina Şingariya xweş bû bû ronî û germiya jîna min. Gurgîn ka j imin re bêje tu gelek hej jê dikî? Ji cariyên malê bi sedan bistîne tenê bila ew bimîne nik min.”<sup>80</sup> Mîr ji bo evîna xwe ya li hember keça Şingarî dibêje ew şahiya dilê min a paşîn bû.

Mîr ji bo ku lawê xwe vegeîne li ber wî digere. Lê Gurgîn ji wî re dibêje “Bavê min, ez ji mêj ve jê hez dikim.” Di ber hevdu de didin lê her du jî bi ser nakevin. Di dawiyê de Gurgîn wek çareyekê dipirse “Dixwazî em wê bikujin?” Her du jî nikarin bêyî evîna xwe debar bikin. Bavê wî ji ber ku nikare wê bide lawê xwe vê yekê qebûl dike. dibêjin em ê wê bavê jin avê. Keça Şingarî Perîxanê gava her du dikevin odeya wê meselê fam dike. Birayara wan qebûl dike. dikevin rê ber bi avê ve dimeşin. Di rê de gava mîr Perîxanê dixwe hembêza xwe û bir ê de dihere bi zora Gurgîn dihere. Ew

---

<sup>78</sup> Hb. Cild 2, rp. 1062

<sup>79</sup> Hb. rp. 427

<sup>80</sup> Hb. rp. 428

dexesiya ji ber evînê zorê lê dike. ji ber wê jî ji bavê xwe re dibêje “Bihêle ez bikevim pêşiyê, revîna agirê sor dikeve dilê min, ez ditirsim xencerekê li stoyê te bidim.”<sup>81</sup>

Piştî mîr Perîxanê diavêje avê ew êşa wendakirina evînê li xwezayê tê barkirin. An jî atmosfer jî bi wê wendakirinê re diguhere. “Ezman reştir, ewr her taritir dibûn, dengê bayî edî dengê mirinê bû.”<sup>82</sup> Piştî bêdengiyekê Gurgîn ji wî dixwaze ku herin. Mîr qasekî din dissekine. Dawiyê dest bi meşê dike. Piştî çend gavan Mîr wek li xwe warqilî be disekîne. Fam dike ku bê evîna Perîxanê nikare bijî. “Ma ez diçim ku?! Ma ez ji bo çi diçim?! Jîna min hemî vê re bû ma ko ew çû jiyîn û rehetî ji bom in çi ne, çi re ne.. kêrî çi tên. Ez pîr im, qes êdî hej min nake û jîna bê hevîn ma ne dînîtiye.”<sup>83</sup> Piştî van gotinan Mîr jî diçe xwe davêje avê.

### 3.6. Fedakarî

Di çîroka Qedrfî Can a bi navê “*Sond*” de temaya fedakariyê di ser lehengekî zarok re hatiye dayîn. Adeta xwînbiratiyê, ku du heb xwîna hevdu dimijin û bi hevdu re sond dixwîn û heta mirinê bi her awayî alîkariya hev dikin, mijara vê çîrokê ye. Di ser vê adetê re fedakariya xwînbirayê vegêr hatiye vegêrîn. Piştî ku vegêr bi hevalê xwe re Sindk re dibe xwînbara û pê ve rojekê kûçikêkî har êrîşî wan dike. Sindik wê gavê jî hevalê xwe re dibêje “tu xwe li paş min veşêre.” Sindik bi kûçikê har re şer dike. Birîndar dibe. Li diyarbekir û Stenbolê li ser tixtoran digerin lê Sindik dimire. Vegêr vê yekê jî bîra nake. Di birîna xwe ya li ser tiliya xwe xeyaleta hevalê xwe hest dike ku “ji bo na xelasiya hevalê xwe, bi kûçikê har re pence pence şer dikir.”

Di çîroka Celadet Alî Bedirxan a bi navê “*Keleha Şahîn*” de fedakarî di ser xizmetkareke jin ya ji bo Xatûna xwe re hatiye dayîn. Yemame xizmetkara Zeynoya melîka Tidmîrê ye. Eskerê Romayê êrîşî Tidmîrê dikin û gihaştine heta bi devên deriyên paytextê. Zeyno ji Yemame dixwaze ku here Keleha Şahîn û ji qumandarê wê re bêje ku temamê bajêr bikeve destê dijmin jî gerek Keleha Şahîn heta zindiyek tê de hebe li ber xwe bide. Qumandarê kelehê dildarê Yemame ye. Piştî derbasî kelehê dibe û dijmin dora kelehê digire roj bi roj keleh zeîf dikeve. Xwarin û cebilxaneyên wan namîne. Qumandarê dildarê Yemame hêdî hêdî rêya teslîmîyetê difikire. Gava Yemame vê yekê

---

<sup>81</sup> Hb. rp. 429

<sup>82</sup> Hb.

<sup>83</sup> Hb. rp. 430

dibîne fam dike ku heger tevdîrekê nestîne ew ê soza dabû xatûna xwe nikaribe bigire. Bi şev jehrê davêje nav ava kelehê. Serê sibê gava ro derdikeve ya zindî maye tenê Yemame ye. Piştî li nav eskeran digere û yeqîn dike tev mirine xencera xwe di sînga xwe re radike û bi ser laşê dildarê xwe de dikeve.

Kuştina dildarê xwe ya Yemameyê û bi dû re xwekuştina wê wek fedakariyê hatiye resimkirin.

### 3.7. Poşmanî

Qedrî Can di çîroka xwe ya bi navê “*Guneh*” de di ser bîranîneke xwe re ev temaya poşmaniyê daye. Bûyereke di zaroktiya vegêr de, teva ku bîst sal di ser re derbasbûye jî ji bîra wî neçûye. Ew heneka ku bi hevalemî xwe dike û ew henek dibe sebebê mirina hevalê wî. Vegêr vê bûyerê nikare ji bîr bike. Bi van gotinan jî wê poşmaniya xwe tîne zimên. “Ji min re bûye derdek, di hundirê min de bûye girêkek, di dilê min de bûye birînek... birîneke pir kûr. Sal bi sal nêma û kêma wê bêtir, êşa wê zêdetir dibe. Giyanê min ji ber diheje...”<sup>84</sup> Vê bûyerê gelek bandor lê kiriye û gelek caran wî hevalê xwe di xewnê de dibîne ku jê re dibêje “bêbext... bêbext!”<sup>85</sup> Dîtina xewnan û jibîrnekirina vegêr a vê bûyerê, eyankirina kişandina ezabê ûjdanî ye û ew yek jî bi hesta poşmaniyê ve girêdayî ye.

### 3.8. Bîranîn

Mijara çîroka “*Rojên Derbasbûyî*” ya Qedrî Can de bîranînên vegêr e. Ji çîroka em fam dikin ku vegêr mamoste ye. Li cihê ku lê dişixule, li Amûdê, cewrikekî kûçikan dev lê dike û ji bo tedawî bibe mecbûr dimîne here Eyndîwerê. Piştî dibistan tîn girtin vê carê ji Eyndîwerê jî bar dike. Li cihê xwe yê nû wan rojên li Amûdê û Eyndîwerê derbas kirina bibîr tîne.

“Roj, meh, sal.. çiqas zû derbas dibin. Ev bûn du sal – ne kêma ne zêde- ji wan cihan, ji wan helvan bi dûr ketime.. Li cihine wisan dimînim ko ne “here” ne “were” dibîsim: guhê min ji vê ahenga pîrestesî bê par maye.. li dora xwe dinêrim ji berdêla Cûdî û Dicle leylanine xapînok dibînim.

---

<sup>84</sup> Hb. cild 2, rp. 932

<sup>85</sup> Hb.

Hevalekî dewsa Mehemedê melê, ew dewsa vala tijî bike nîne... suxtê min jî ne Biro û Remo nin...”<sup>86</sup>

### 3.9. Zanîn/Xwendin

Pêşxistina zanîn û xwendinê yek ji armancên Hawarê ye. Di serê sedsala bîstan de ev kêmasî di nav civaka Kurdan de hatiye tespîtkirin û di kovar û rojnameyên pêşîn de jî bûye mijara gelek nivîs, gotar, helbest û çîrokan. Vê pêvajoyê di Kovara Hawarê de jî dewam kiriye. Ji ber ku heta dema Hawarê dest bi weşana xwe kir jî xwendin di nav civaka Kurdan de pir kêr e. Ji bo qîmetê xwendinê bê zanîn û di vê mijarê de gel bê hişyarkirin ev tema bi alîkariya çîrokê ve bi pêş ve hatiye derxistin. Çîrok dîsa wek alaveke propandayê hatiye bikaranîn û barê hînkariyê li wê hatiye barkirin.

Di çîroka *“Ber Tevna Mehfûrê”* ya celadet Alî Bedirxan de xwendina lawikê biçûk wesiyeta bavê hatiye kuştin e. Dê û her du xwişk ji bo wê wesiyetê bînin cih û lawê biçûk bidin xwendin jiyana xwe terxan kirine. Her du xwişk Rindê û Zîzê li ber tevna mehfûrê dişixulin. Gava carekê Zîzê ji ber sermayê digirî xwişka wê Rindê wê hişyar dike û dibêje “Ma Zîzê tu nizanî ko xebata me ji bona gefo ye. Ji bona xwendina Gefo ye.”<sup>87</sup> Zîzê bi vê yekê zane lê ew tam li ber neketiye. Ji ber Rindê ji wê mezintir e fam dike û wê jî li ber dixê. Gava Zîzê jê dipirse û dibêje “Ma çire Rindê ewnde bixwîne. Bila qasê kekê me Zinar bixwîne ne bes e? Zana bûn jî, ji bona çî? Di bersiva Rindê de armanca vê mijarê xwe dide der. Ji bo zanînê vê yekê dibêje:

*“Ji bona welêt Zîzê. Heke kekê me Zinar qenc xwendî bûwa rûja ko eskerê kurdan bi ser Diyarbêkrê de girti bûn ne dihişt ko esker bibin çend bir û herin bajarên din û di dora Diyarbêkrê de kêr bibin. Lê bi êrişekê Diyarbêkr distand û mesele safî dikir. Dibêjin ko vê xeberê dijminan bi xwe gotine.”*<sup>88</sup>

Çîrok di ser avakirina welêt a bi xwendinê re berdewam dike. Xwendin wek mifteya avakirina welêt hatiye pênasekirin. Ji ber wê jî ew zilm û zorî û tehdeya ku dikişînin bi tunebûna welêt ve girê dide.

---

<sup>86</sup> Hb. cild 2, rp. 1100

<sup>87</sup> Hb. rp. 84

<sup>88</sup> Hb. rp. 85

*“Ko Kurdistan bi serê xwe bû, hingê her tiştên welatê me, ji me dibin. Ev serhoste jî ji kurdan tête bijartin û pirsra kurd wek îrû pirsra dijûnê lê pirsra pesnê dê bibe. Ne tinê serhoste, lê hakimana heta paleyan hemî, j ime, ji milletê me dê bibin. Wê gavê ev zmanê ko em pê daxêvin û ji me re şêrîn e di her derê de bête gotin û bihîstin. Îrû em di zîvariyê de ne, malên me ji destê me hatine standin. Çire? Ji berk o em kurd in û dewlet me nîne... Welatê me xweyiyê zarowên xwenda bûwa heta niho, bi serê xwe dibû û bav û brayên me nedihatî kuştin û em jî nediketî vî halî...”<sup>89</sup>*

Di çîroka *“Bi Xwehên Guhderz Re”* ya Celadet Alî Bedixan de çîrok di ser diyalogêke vegêr a bi keçîka xwe re girîngiya xwendin û zanîna vedigerê. Keçîka vegêr jê dipirse bê ji bo Hawar ranekeve divê em çî bikin. Vegêr lê vedigerîne û dibêje *“Divêt em pir bixwînin û binivîsînin. Kitêbên ko di destê me de ne paqij hilînin; ji bo na ko em bikari bin şûna çay û qehwê pêş nas û dostên xwe bikin û bi hev ra bixwînin.”*<sup>90</sup> Gava keçîka wî lê vedigerîne û dibêje şerm e çawa mêvan bîn û bê çay û qehwê rabin vegêr lê vedigerîne û bi bersiva xwe qîmetê zanîn û xwendine bi wê dide zanîn.

*“Kurê min şerma mezin ew e ko mirov nezanê xwendin û nivîsandina zmanê xwe be; nezan be. Nezanin hene çar rojan çay û qehwê didin mêvanên xwe. Lê te dît neyar rabû û mal talan kir û xwedî bê çay û qehwe hişt. Lê xwendin û zanîn nayêne talankirin; ew her û her yê me ne.”*<sup>91</sup>

Di çîroka *“Xurşîd”* a Nûredîn Zaza de piştî mirina kurê xwe re Xurşîd, malê xwe ji bo xwendina zarokên gund dide melê gund. Melayê gund li ser vê yekê ji wî re dibêje *“... Were em ê hejkirina xwe bidin zaroyên gund û ji wan xortên xwenda, xurt û hêja bînin pê.”*<sup>92</sup> Bi van gotinên mela re em dibînin ku ew nerîna ku bi xwendinê zaroyên gund hêja dibin, xurt dibin derdikeve pêş. Yanî xwendin mirovan xurt û hêja dike. Ji xwe di dewama çîrokê de ev gotina vegêr ya *“Piştî şanzdeh salan di gund de daweta çil xortên hêja, xwenda û milletperwer çêdibû...”*<sup>93</sup> dîsa wê baweriya bi xwendinê re milletperwerî çêdibe aşkere dike.

---

<sup>89</sup> Hb. rp. 85

<sup>90</sup> Hb. cild 2, rp. 756

<sup>91</sup> Hb.

<sup>92</sup> Hb. cild 2, rp. 694

<sup>93</sup> Hb.

Di çîroka “*Perîşanî*” ya Nûredîn Zaza de nerênîyên ji nezanîn û nexwendebûnê dizên derketine pêş. Di serî de em rastî mirovên feqîr, belengaz û perîşan tên. Kameraya vegêr di ser wan dîmenan de digere ku ew halê perîşan ên mirovan nîşanî me dide. Di dawiyê de gava ji xewna xwe şiyar dibe vê carê şayesandina der û dora xwe dike ku bi temamî di rengekî modern de ye û ew mekan, alav û kereste bi temamî berhemên xwendin û zanîne ne. Vegêr li ser vê yekê jî nezaniyê yan jî nebûna xwendin û zanîne bi perîşaniyê re dike yek û dibêje: “nezanî... nezanî... nezanî... perîşanî...”<sup>94</sup>

### 3.10. Hezkirina Zimên

Celadet Alî Bedirxan di nivîsa xwe ya ewil ya di der barê armanca weşandina kovarê de dibêje “Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide naskirin. Lewma ko zman şerta heyîne a pêşîn e.”<sup>95</sup> Di ser vê nerîne re dest bi weşandina Hawarê kiriye. Yanî yek ji bingehen armanca derxistina vê kovarê ziman e. Hawarê karên wek ziman bide naskirin, ziman bide hezkirin û ziman bipêş de bixîne li xwe bar kiriye. Wek çawa dizane ziman şertê heyîne ye pêşîn e, ji wê jî bawer dike ku ziman dikare neteweyekê ava bike.

Di çîroka “*Şêraniya Zimanê Kurdmancî*” ya Celadet Alî Bedirxan de em li hezkirina zimanê Kurmancî ya muhacirekî Kurd rast tên. Vegêr gava ji bo karekî xwe li Bêrûde ye li sûkê rastî wî Kurdî tê ku li kolanê bi hevalên xwe re bi zimanê xwe dipeyive. Peyivîna wî ya bi Kurmancî dihêle ku vegêr, ji bo alî wî bike, bang li wî bike. Gava vegêr li dikanekê lazimiyên xwe dikere dibîne ku ew xort li wî dinere û dikene. Ji wî dipirse bê çima dikene. Xort lê vedigerîne û dibêje “... ji kêfa Kurdmanciyê ji kêfa kurdmanciuya te dikenim. Belê li Bêrûde kurdmanc zehf in. Ji sibê heta êvarê em bi kurdmancî xeber didin. Lê gava ji devê te dibihîsim hîn bêtir kêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî kurdmancî çiqas şêrîn e.”<sup>96</sup> Vegêr li ser vê yekê lê vedigerîne û dibêje ji ku kurdmancî kengî şêrîn e. Yê xort ji bo ew hezkirina xwe ya ji zimanê xwe bîne zimên dibêje:

*“Bi serê te ê ezîz, tu zman wek kurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirkî rind nizanim, lê mine w gelekî bihîsitye. Li Iraqê min erebî û ingilîzî gelek bihîstine. Li Sûriyê her rûj*

---

<sup>94</sup> Hb. cild 2, rp. 852

<sup>95</sup> Hb. rp. 23

<sup>96</sup> Hb. rp. 164



*erebî û frensizî dibihîsim. Ez van datînim ber hev û dibînim ko şêraniya zimanê kurdancî di tuwan de nîne. Lê çi fêde ew bi kurdancî nizanin.*"<sup>97</sup>

Yê xort hingî ji zimanê xwe hez dike bawer dike ku heger van milletên din gava zanîbûna zimanê kurdancî çiqas şêrîn e jê pê ve bi zimanekî din nedipeyivîn.

Celadet Alî Bedirxan di çîroka xwe ya bi navê "*Gazinda Xencera Min*" de dîsa mijar wek hezkirina ji zimên bijartiyê. Di vê çîrokê de di gazine xencera ku lehenga çîrokêye jî, em rastî wê hezkirinê tên. Xencer ji vegêr re dibêje ji ber te bera pê zimên daye û dixwazî milletê xwe xwedî kitêb bike, xwedî zanîn bike te dev ji min berdaye. Gava dibêje "Xelk nema dê bikarin bêjin ko zimanê kurdan nîne." Nerîna vegêr ya li zimên jî aşkere dike. Di vira de em pê dihesin ku vegêr ji zimanê xwe hez dike û ji milletê wî din av milletên din de kêr nemîne bi fedakarî li ser zimên xebatan dike. Gava vegêr van xebatsan dike armanca wî ew e ku xelk "bibêjin kurd jî wek xelkê xwedan ziman û xwedan kitêb in û zimanê kurdî zimanekî hêja, dewlemend û tekûz e..."<sup>98</sup>

### **3.11. Rêvebir/Rêvebirî**

Temaya rêvebiriyê yek ji temayên zêde ya di çîrokên Hawarê de derketiyê pêş e. Ji bilî çîroka "*Du Dengbêj*"an mijar aresteyî zemanê berê hatiye kirin. Çîrok di rengê meselokan de ne. Bikaranîna vê mijarê, ji ber ku rêvebiriyê Kurdan tuneye, balkêş e. Ji bilî çîroka "*Selahedîn û Rîçardê Şêrdil*" hemû çîrok li ser zilimdariya rêvebiran hatine hûnan.

Di çîroka "*Kevirê Mûsayê Ehmed*" a Celadet Alî Bedirxan de zilimkariya rêvebir bi liberxistina lehengê çîrokê Mûsayê Ehmed ve bi dawî dibe. Çîrok ew zilma rêvebir bi nezanî yan jî bîrnebirina wî ve girê dide. Gava Mûsayê Ehmed bi mirovên din re kevirên qesrê ji çiyê dikşîne deştê dibetile û li cihekî rûdinê. Begê nû Şêrik bi ser wî de tê. Mûsayê Ehmed ji wî re dibêje "Ez dibînim ko felek li Seîd begî geriyaye û tu kevirên qesra wî li ser piştê peyayên wî dibî deştê. Em berê xwe didin jêr, pêşiya me nişûv e; em diqedînin. Lê heke rojekê felek li te jî geriya, hinên din wê rabin û kevirên Şebistanê bidin piştê çêlî û peyayên te û wan vegeirînin cihê wan ê berê, serê çiyê. Didim eqlê xwe û dibêjim şikir ji xwedê re berê me li jêre, lêpeyayên te ên reben wê çi

---

<sup>97</sup> Hb.

<sup>98</sup> Hb. rp.520

bikin berê wan wê bikeve kêş.”<sup>99</sup> Li ser van gotinan Şêrik beg li kirina xwe hayil dibe Û dibêje “Keleh û kevirên wê li min heram bin, ez mirovekî kurdmanc im. Ez ne mêrê qesrê me.”<sup>100</sup>

Di çîroka “*Selahedîn û Rîçardê Şêrdil*” ya Celadet Alî Bedirxan de dilnizmî û zanebûna Selahedînê rêvebir hatiye vegêrîn. Di şerê di navbera xaçparêz û Selahedîn de keçikek bi navê Meryem a xwişka şervanekî Rîçard dîl dikeve destê leşkerên Selahedîn. Birayê Meryem ji bo xwişka wî xelas bike ji Rîçard dibe ricacî. Rîçard li ser vê yekê ji leşkerê xwe re dibêje “Pikon, divêt tu bizane ko Selahedîn mêrekî qenc, alîcenab xudan bext û rûmet û bi rebenan re dilovan e.”<sup>101</sup> Nameyekê ji Selahedîn re dinivîse bi destê birayê keçikê dişîne ji Seahedîn re. Rîçard bi rêvebiriya Selahedîn bawer e. Ji ber vê jî bi awayekî aşkere di nameyê de ji wî re dibêje ku ev leşkerekî wî yê qehreman e û di gelek meydanê şer de xwe gihandiye leşkerên te. Teva vê yekê jî Selahedîn qîmetê qasid dizane û xwişka wî teslîmî wî dike. Di nameya xwe ya ji Rîçard re nivîsiye dibêje “Me xatirê qasidê te herwekî sezayî wî, sezayî her mêrê qenc e, girt û zanî”<sup>102</sup> Li ser esîrgirtina wî leşkerî jî ku Rîçard di nameyê de ji wî re dibêje heger tu xwişka wî nede wî wî jî esîr bigire, Selahedîn vê bersivê dide: “Ji berk u di mal û qesirên me de tenê bi tenê ji hêsîrên qadên şer re cih heye.”<sup>103</sup>

Di çîroka “*Du Dengbêj*” a Kamiran Alî Bedirxan de temaya rêvebiriya di ser zilma rêvebirekî re hatiye dayîn. Ev revebir “... di wê qesrê de li ser textekî bilind û bi zêrîn û bi ebanos û hestiyê fil xemilandî rûniştibû.”<sup>104</sup> Ev terîf hinekî rêvebiriya wî rêvebirî aşkere dike ji xwe. Ev ew terîf e ku ew fikra zalimtiya rêvebir ji xwe ber li ber çavên me zelal dike. “Her fikra wî bêbextî, her awira wî ern, her gotina wî xerabî û her nivîsandina wî xwîn bû.”<sup>105</sup> Zalimtiya wî rêvebirî ji yek dengbêjên lehengê vê çîrokê wisa hatiye zimên “... em diçin qesra kot ê de zalimê me xedarê miletê me rûniştîye, divê em îro dilê ê hişk û polayî binermijînin.”<sup>106</sup> Di dawiya çîrokê de gava rêvebir ji wan aciz dibe radihêje şûrê xwe û di sînga dengbêjê ciwan re radike.

---

<sup>99</sup> Hb. cil 2, rp. 869

<sup>100</sup> Hb.

<sup>101</sup> Hb. cild 2, rp.1082

<sup>102</sup> Hb.

<sup>103</sup> Hb.

<sup>104</sup> Hb. rp. 408

<sup>105</sup> Hb.

<sup>106</sup> Hb.

Di çîroka “Behramê Gor” a Cegerxwîn de kêf û şahiya rêvebirê welatê Faris bûye mijar çîrokê. Ji berk u ew rêvebir li karê xwe ne miqate ye Milet di halekî xirab de ye. Hayê rêvebir ji vê yekê tune ye. Ew li dû kêf û şahiya xwe ye. Di dema nêçîrekê de du heb bûm dibînîn. Behramê rêvebir di Bêje xwezî min zanîbûya bê çî dibêjin. Li ser vê yekê zanayekî pê re ji wî re dibêje ferman bide ez ji te re bêjim. Piştî fermana rêvebir ê zana ji wî çîroka wî dibêje ku rêvebirekî çawa ye û çî li benda welatê wî ye. Revebir meselê fam dike. dikeev çadira xwe û bang li mirovê zana dike. Ji wî re dibêje “ey rêzanê welatê faris, vê gotina te agir berda dilê min. Belê te birîna min şanî min da...”<sup>107</sup> Piştî bi birîna xwe dihesê bi yê zana re dişewire ku çî bike. Yê zana ji wî re sebebên birîna wî rêz dike.

*“... te mirovên xwînxwar û sitemkar kirine rêzan û dergevan û rêber û serdar. Wan bi navê te reben û belengaz xudanê nav û nişan tev dil û gerdenxwar kirin. Gerek e tu wan mirovên bedkar ji dergehê xwe dûr bikî; gencên zêr û zîvîn ji wan bistîni û li belangazan belav bikî. Divêt guhê te ji dengê belengazê te re vekirî be; û çavên te ji wan re belkirî bin; û tu ji wan re dilovan û mihirvan bî...”<sup>108</sup>*

Di çîroka “Melik û Koçer” a Dilistan de diyalogek di navbera şivanekî û melikê Hesenkêfê de derbas dibe k udi wî diyalogê de şivan bi qalkirina meselokekê ji melik re wî bi rêvebiriya wî ya nebaş dihesîne. Piştî wî diyalogê melik şivan xelat dike, û ji gotinên wî ibretê digire.

### 3.12. OI

Temaya olê di du çîrokên di nav çîrokên Hawarê de derdikevîn pêş me. Di çîroka bi navê “Zerdeşt” a Celadet Alî Bedirxan de, Zerdeşt piştî li çiyê deh salan dimîne biryarê dide ku dakeve nav mirovan “ew mirovên ko hewcedarî zanîn û dewlemendiyê ne.”<sup>109</sup> Wexta dadikeve li mirovekî pîr rast tê li daristanê. Mirovê pîr wî nas dike û ji wî re dibêje tu daket çî. Zerdeşt ji wî re dibêje “ez ji mirovan hez dikim.” Zilamê pîr ji wî re dibêje “ma çîre min xwe kişandiye tenahiya rêl û daristanan... ne ji bona wê yekê kom in gelek hejî mirovan dikir. Niho ez ji Xwedê hez dikim û ji mirovan hez na kim; mirov tiştêkî nepêkhatî ye û hevîna wan ez bikuştama.”<sup>110</sup> Zilamê pîr li ber

<sup>107</sup> Hb. cild 2, rp. 770

<sup>108</sup> Hb.

<sup>109</sup> Hb. cild 2, rp. 907

<sup>110</sup> Hb. rp 908

dide ku Zerdeşt danekeve nav mirovan. Ew difikire ku tişteki ku ew bide mirovan tune. Li ser vê yekê gava zerdeşt jê dipirse bê ew di nav daristanê de çi dike, zilamê pîr dibêje “ez stranên çêdikim û wan dibêjim, û gava ez strana çêdikim, dikenim, digirîm û dinehwirînim û pê pesnê Xwedê didim. Bi stran, girîn, kenîn û nehvirandinê Xwedê dipesinînim; yê ko Xwedayê min e.”<sup>111</sup> Piştî van gotinan Zerdeşt xatirê xwe dixwaze û diçe. Gava Zerdeşt tenê dimîne ji xwe re dibêje “ma îmkana wî heye... vî mirovê pîr û miqedes di nav rêl û daristana de hêj nebihîstibe ko Xwedê miriye.”<sup>112</sup>

Di çîroka “*Segê Jar û Şêxê Teyles*” a Şêx Abid de nîşanên olî dibin mijarê çîrokê. Segê jar li ber deriyê Şêxekî ku cilên teyles lê ne birçî ye û li benda wan hestiyar e ku şêx ji wî rew bavêje. Lê şêx wan hestiyar davêje wî û destê wî dişkîne. Seg giliyê xwe dibe cem Silêman pêxember. Gava mehkema xwe datînin Silêman pêxember ji seg re dibêje ez jî destê wî bişkînim, seg qebûl nake. Di dawiyê de seg ji Silêman pêxember re dibêje “ezbenî ez jî ite dixwazim ko van cilên şêx yê baweriyê jê vekî û cilên wek yê xelkê li ber wî bikî da ko heywanên din wek min jar û reben bi van cilan nexapin û nîzingî li şêx nekin.”<sup>113</sup> Piştî vê daxwazê cilên şêx jê dikin û cilên adetî lê dikin.

### 3.13. Heyfhiilanîn

Di çîroka “*Nêçira Hirçan*” a Osman Sebrî de temaya heyfhiilanînê di ser şerê di navbera Mela Elî û Hirçekî nêr de hatiye vegêrîn. Mela Elî nêçirvaneke û rojekê di vegra malê de li hirçekî nêr rast tê. Xwe ji hirçê xelas nake û hirç wî dixê haletê mirinê. Xwe li mirîti datîne û bi vî awayê xwe jê xelas dike. Li ser biryara heyfhiilanîna xwe wisa dibêje. “Dema hirçî ez vedipûm ser hev û li min dixist, min sonda tola xwe xwari bû...”<sup>114</sup> Piştî birînê xwe derman dike û dipêçe bi sê rojan ji bo heyfa xwe hilîne diçe ew cihê hirçê ew binax kiribû. Li wê derê bi birayê xwe re kemînê datînin. Gava hirç tê bera wî didin wî dikujin. “Piştî wê bi du rojan mi kavi lê hirçê xwe di dîwana axayê Mirdêsan Hecî Ebûzer Axa de raxistibû.”<sup>115</sup>

Di çîroka “*Melayê Gulê*” ya Cemîlê Haco de ji ber ku jinika bi navê Gulê ji hêla jina qazî û miftî ve heqaret li wê tê kirin ji mêrê xwe daxwaz dike bibe mela. Mêrik ji

---

<sup>111</sup> Hb.

<sup>112</sup> Hb. cild 2, rp. 908

<sup>113</sup> Hb. cild 2, rp. 1022

<sup>114</sup> Hb. cild2 rp. 1055

<sup>115</sup> Hb. rp 1056

neçarî dibe mela û ji wî re li hev tê û dikeve çav hakimê bajêr. Di dawiyê de hakim ji wî re dibêje tu çî ji min bixwazî ez hazirim. Merîk “ezbenî ez ê tiştêkî bixwazim, min divê ko tu qazî û miftiyê bajêr bispêre min. Ji ber ko neqenc û fesad in.”<sup>116</sup> bibêje. Hakim wan dispêre mêrik. Bi vî awayî heyfa jina xwe ji qazî û miftî hiltîne.

### 3.14. Xurafe/Baweriyên Batil

Xurafe, wek bîr û baweriyên tewş û vala ku paşê ketine nav dîn dikare bê pênasekirin. Piştî wextekî ew bawerî di nav gel de cih digire û dibe yek ji rastiyên wê civakê. Osman Sebrî ev temaya di çîrokên xwe de bikar aniyê. Ya rast heman xurafe wek rêzeçîrokan ku ji çîrokên bihîstine rêz kiriye.

Di çîroka “*Şeytanqûnî 1*” de mijar yek ji xurafeyên ku di nav kurdan jê tê bawer kirin e, ku hin mirî piştî mirinê radibin. Du feqeyên ji bo xwendinê dikevin rê li gundekî dibin mêvan. Li camiya gund cihê wan çêdikin. Bi şev kurê mixtar dimire. Cendekê wî tînin camiyê û mixtar ji feqeyan dixwaze ku quranê jê re bixwînin. Derengê şevê deng bi tabûtê dikeve. Yek ji feqeyan di hundir de dimîne. Gava deriyê tabûtê vedibe û yê mirî jê derdikeve feqe hey dixwîne û pif ser wî dike. Piştî yê mirî bera wî dide û digire feqe kulmekê li ser çavê wî dixê. Xwîn di dev pozê yê mirî re tê. Hevalê feqe alî wî dike û wî ji pixêriyê re hildikşîne jor. Di wê navberê de yê mirî jî bi ser himdê xwe de tê. Gava cendek bang wan dike yek ji wan dixwaze bipeyive hevalê wî devê digire û ji re dibêje “Kuro, ma tu ji rêya Xwedê ketiye! Ev cendekê han şeytanqûnî bûye. Ma qey tu nizanî ko şeytanqûnî çî ye? An te divê bibî sebeba serê me!..”<sup>117</sup> Piştî van gotinan hevalê wî dibê xencera me heye, heger xwe bide ser me em ê wî bidin ber xencera. Yê din dibêje “li nik me mer jî nîne ku pê cendek bikujin. Ma şeytanqûnî bi xenceran dimire?!..”<sup>118</sup> Li gor vê baweriyê gava yek şeytanqûnî dibe tenê bi merê dimire.

Di “*Şeytanqûnî 2*” de dîsa bûyereke mirinê diqewime. Piştî yê mirî didefînînin pê ve nivê şevê yê mirî ji mezê radibe û tê malê. Ji ber jina wî bawer dike ku şeytanqûnî bûye derî lê venake. Ew jî di pixêriyê re dikeve hundir. Jina wî bin av gund dikeve û dike hawar û gazî. Bira û pismamên wî bi ser malê de digirin ji bo wî bikujin. “Tu nema hemiyar xwe di pixêriyê ra berdane xênî, her yekî merêk di dest da bû.”<sup>119</sup> Piştî ku

---

<sup>116</sup> Hb. rp. 185

<sup>117</sup> Hb. cild 2, rp. 1130

<sup>118</sup> Hb.

<sup>119</sup> Hb. cild 2 rp. 1134

cîranekî wî tê û ji wî cîranê wî li wî guhdar dike fam dikin ku ew şeytanqûnî nebûye lê bi xûnê ketiye.

Di çîroka “*Şeytanqûnî An Tabûta Şeşcendek*” de dîsa heman mijar hatiye vegêrîn. Mirovek di dawiya qemyonekê de rêwitiyêd dike. Dinya sar e û di dawiya qemyonê de tabûtek heye. Gava baran dibare rêwî dikeve hundirê tabûtê û di xew re dihere. Di wê navberê de şifêrê qamyonê çend rêwiyên din siwar dike. Piştî bi qasekî qemyon di rêyeke xerab de dihere û hin gî kort hene diheje û rêwiyê di tabûtê de şiyar dibe.

*“Rêwiyên li dorhêla tabûtê herwekî tirsê çengîn û hejîna timopilê têran wan nekiri be ko nişkava devê tabûtê vedibe û kesê ko tê da mirî dizanin, li ser xwe rûdinê û ji tirsê hejîna tomopilê pel pel li dora xwe dinêre.*

*Her pênc rêwiyên mayî dizanin ko miriyê di tabûtê de şeytanqûnî bûye.”<sup>120</sup>*

Piştî ku şofêr dibîne ku her şeş rêwî xwe ji qemyonê davêjin disekine û vedigere ser wan. Rêwî ji wî re dibêjin “me miriyek di tabûtê da dizanî. Gava timobîl çengiya û derê tabûtê vekir, me got qey şeytanqûnî bûye û me xwe avêt.”<sup>121</sup>

### 3.15. Welatperwerî

Çîrokên Hawarê wek me berê jî gotiye bi qasî hêla xwe ya edebî bi hêla xwe ya avakirina hişmendiyeke jî derdikevin pêş. Gelek çîrok bi armanca wê misyonê hatine nivîsîn. Wek çawa hezkirina zimên, qîmetê xwendin û zanînê, xelaskirina welêt bi wê armancê hatine nivîsîn û xwedî misyonekê ne çîrokên bi navê “*Mêrê Min Di Şerî De Ye*” û “*Kulîlkên Ko Ji Kurdistanê Tê*” jî xwedî misyonekê ne û bi armanca welatperweriyê derxîne pêş hatine nivîsîn.

Di çîroka “*Mêrê Min Di Şerî De Ye*” ya Kamiran Alî Bedirxan de ew welatperwer jineke nû zewicî ye. “Serxwebûneke mezin çêdibû.”<sup>122</sup> Zilamê wê Zend piştî dizewicin bi şevêke diçe şer. Şevêke Zend hew debar dike, tivina xwe dide hevalekî xwe û berî dide malê. Li deriyê Zînê dixê. Gava Zînê fam dike ku ew e derî lê

---

<sup>120</sup> Hb. cid 2, rp. 1140

<sup>121</sup> Hb.

<sup>122</sup> Hb. rp. 144

vedike. “Bi çavekî sar û tehl” ji wî re vê gotina ku bi heyvanê welatparêziyê hatiye meyandin dibêje. “Mêrê min Zend... bi welatîyên xwe ve di şeî de ye.”<sup>123</sup>

Çîroka “*Kulilkên Ko Ji Kurdistanê Tê*” a Telet Qedûr di ser sekn û tevgera kulilkan re ew ramana welatparêziyê vedigêre. Kulilkên ku ji Kurdistanê tê ji civata xwe ya her sal dîgerîn dereng dimînin. Di wê civatê de kê wê salê emelekî baş kiribe mikafatekê distîne. Nergis, beybûn û xecxecok ew kulilkin ku dereng mane. Kêlîka ku ew ê kulilka mikafat qezenc kiriye kifş bibe dikevin dikevin hundir. Gotinên wan bi ramana welatperweriyê ve dagirtîne.

*“Em dereng man qisûra me afitw bikin. Em ji dereke gelek dûr, ji çiyayên Kurdistanê tê. Li wê derê em rastî sê cendekên xortên Kurd hatin. Ew di riya welat û milletê xwe de bi şeref û rûmet hati bûn kuştin, em li ber wan sekinîn, me ji wan re sih girt heta ko hevalên wan hatin û ew veşartin.”*<sup>124</sup>

Piştî van gotinên wan kulilkên din jî vê welatperweriya wan tesdîq dikin û ew jî nîşan didin ku wan tiştê baş kiriye. Ji ber wê jî wan kulilkan radikin ser milên xwe, ji wan re li çepikan dixin û dibêjin “her bijîn her bijîn; mikafata vê salê ji we re ye.”<sup>125</sup>

### 3.16. Hêvî

Di çîroka “*Leylana Rastiyê*” ya Kamiran Ali Bedirxan de hêvî bi awayekî simbolîk hatiye bikaranîn. Di çîrokê de bi sedhezaran Kurd di rêyekê de ne ku ne roj li wan hiltê ne jî warekî şên derdikeve pêşiya wan. Tîbûn, birçîbûn, nexweşî wek tariyekê ew zeft kirine. Ew rewîtî bi salan dewam kiriye heta ku li wê hêviyê diqelibin. Ew hêviya ku rûyê wan dikenîne gava “ew kom şevêkê giha zozanekî spehî”<sup>126</sup> derdikeve pêşiya wan. Piştî ew taritiya dirêj “ji nişka ve di pêşberî wê de ronahike zelal çirisî.”<sup>127</sup> Piştî wê her tişt dibe dijberî beriya xwe. Birîndar birînên wan sax dibin. Zarok xwîn bi rûyê wan de tê, yextiyar xort vedigerin, der û dor bi kulilkan dixemile. Li ser vê yekê ji hev dipirsin; “ma ev nalîn û girîn ku ve çû? Çi qewimiye ku çarmedora me ji nişkan ve husan ava û xweş, dewlemend û rengîn bû! Ma em ketine buhiştê!”<sup>128</sup>

---

<sup>123</sup> Hb.

<sup>124</sup> Hb. cild 2, rp. 751

<sup>125</sup> Hb.

<sup>126</sup> Hb. rp. 203

<sup>127</sup> Hb.

<sup>128</sup> Hb.

Piştî van pirsan rûspîyên komê serê çiyê nîşanî wan didin. Dibînin ku li serê çiyê “... xortekî bi bejn û bal, xortekî zexm û nêr, xortekî çeleng û jêhatî, xortekî bi goş û gewde, xortekî delal û spehî çavên xwe digemirîne û veqêşa tîne xwe.”<sup>129</sup> Di vira de ew xortê bi her awayî erênî temsîliyeta hêviya wê koma mirovan dike. Xort hêvî ye. Ew ronahiya dide hawirdorê ne ji rojê lê ji çavên wî xortî tê. Ev yek jî dibe sebeb ku mirov wî xortî mereq bikin. Tenê yên yextiyar zanin bê ew xort çi ye yan kî ye. Ji ber wê jî bersiva mirovana bi dengê zarî û diayan didin û dibêjin “Kurdistan ji xew rabû.”<sup>130</sup>

### 3.17. Qedirnasî

Di çîroka “*Nivîsevan*” a Kamiran Ali Bedirxan de temaya qedirnasîyê di ser nivîskarekî mirî re hatiye dayîn. Nivîskarekî Kurd ê mirî rojekê şeytan tê ser gora wî û wî ji gorê radike. Bi şeytan re heta bin ava bajêr diçin. Em di diyaloga wî û şeytan de pê dihesin ku ew welatperwerek e û gelek xebat ji bo gelê xwe kiriye. Bi zimanê xwe berhem dane. Gava yek tê ser gora wî û navê li ser kêla wî dixwîne û dibêje min ev nav nebihîstiyê bi zora wî diçe. Gava dikevin nava bajêr dengê dibihîsin. Şeytan ji wî re dibêje bibihîse. “Nivîsevan guhda û bihîst şagirdên dibistanê yek ji şîhrên wî distiran pê gelek dilxweş bû...”<sup>131</sup> Ev dilxweşîya wî bi me dide zanîn ku ji ber qedrê wî hatiye girtin kêfa wî hatiye. Piştî ku digihêjin ber kitêbxaneyekê nivîsevan dibîne ku “yek ji kitêbên wî bi herfên zîv û zêr çapkirî pêşberî xelkê de ye, xelk bi çavên geş lê dinerin û herfê kitêwba wî wek stêran dityisin.”<sup>132</sup> Piştî vê yekê pir kêfa wî tê û gava şeytan ji wî re dibêje dixwazî em hinekî din jî herin bi pêş de lê vedigerîne û dibêje “No.. naxwazim, dixwazim bizîvirim ser tîrba xwe; min dît ko ji bom in mirin nine.”<sup>133</sup> Ji berk u qedrê wî hatiye girtin gelekê kêfxweş dibe.

### 3.18. Mêrxasî

Temaya mêrxasîyê yek ji temayên girîng ên çîrokên Hawarê ne. Ji ber ku yek ji armanca çîrokan ew e ku nasnameyê netewî ava bikin û ji bo wê nasnameyê jî lehengên mêrxas minakin baş in ev tema hatiye bikaranîn. Di gelek çîrokan de heger ne bi awayekî rasterast be jî ji bo îdealîzekirina lehengan li mêrxasîyê referans hatiye kirin.

---

<sup>129</sup> Hb. 204

<sup>130</sup> Hb. rp. 204

<sup>131</sup> Hb. rp. 449

<sup>132</sup> Hb.

<sup>133</sup> Hb.



Di çîroka “*Gulê*” ya Kamiran Ali Bedirxan de mêrxasî di ser lehengeke jin hatiye dayîn. Gulê ew jin e ku navê wê bi nebaşî derketiye. Mêrê xwe Yê bavê wê ew bi zorê dayiyê kuştiye û reviyaye cem Qoço. Ji ber ve yekê jî wek Gula qehbik tê bi nav kirin. Gava dijmin bi ser welatê wan de digirin, gundî tev ji bo xelasiyê difikirin û tevdîran digirin. Gulê jî difikire. Xew bi çavên wê nakeve ji ber ku “dijmin dê biketa welêt.”<sup>134</sup> Gulê li ser vê yekê bi şev diçe asêgeha dijmin û serê zabitê dijmin jê dike. Gundiya li pêş dijmin kemîn danîne. Gava Gulê ji alî dijmin tê yeqîn dikin ku xayintî bi wn re kiriye. Qoço bera wê dide wê dikuje. Lê gava serê sibê digrin ser asêgeha dijmin rastiye fam dikin.

Gulê ji bo welatê wê nekeve destê dijmin, ji bo Qoço ye wê azad karîbe li çiyayên xwe bigere wê mêrxasiyê dike ku here û serekê dijmin bikuje.

Di çîroka “*Dilawerê Çardesalî*” ya Sibhî Resûl de mêrxasiyê em ji lehengê bi navê Dilawer dibînin. Dilawer ji bo here cengê diya xwe bi zorê razî dike û diçe şer. Gava digihêjin pêş kelehê Dilawer xwe dide pêş û ji hevalên xwe re dibêje “mêrxasino welat weke gulekê ye; carcaran bi xwîna welatîyên xwe divêt bête avdan. Ez dibînim ku gula me çilmisiye divêt em wê bi xwîna xwe av din.”<sup>135</sup> Piştî gotina dike tîfinga xwe diteqîne û berî her kesî dirêjî dijmin dike. piştî şerekî dirêj Kurd dikevin kelehê. Dilawer berî her kesî dikeve kelehê. Ala dijmin dadixe û ala rengîn li şûna wê dadîçikîne. Piştî wê dibînin ku erdê bin lingê Dilawer sor dike. Dilawer birîndar bû lê tu kes pê nehisandibû. Gava şervanên hevalê wî dixwazin birîna wî derman bikin Dilawer ji wan re dibêje “Hevalino! birîna min xedar e; birîna mirinê ye. Ne tû xem e. ...Bi tenê min ji we divêt hûn vê alê bikin kefenê min, cendekê min di ala kurdan de bipêçin û ji diya min re bibêjin ko birîna min ne ji par re bû.”<sup>136</sup>

Wêrektî û fedakariya Dilawer wek mêrxasiyê derdikeve pêş û gotina wî ya dawî ku dibêje “birîna min ne ji par re ye” jî yek ji nîşanên mêrxasiyê ye ku di nav gel de tê zanîn tîna bîra mirov.

---

<sup>134</sup> Hb. rp. 733

<sup>135</sup> Hb. rp. 731

<sup>136</sup> Hb.

### 3.19. Sedaqet

Cemîlê Haco di çîroka xwe ya bi navê *“Biserhatiya Reşoyê Darê”* de temaya sedaqetê kiriye bingeha çîroka xwe. Di vê çîrokê de Reşo û jina xwe di tariya şevkê de li zindana Darayê li hev rast tîn. Reşo ji bo şertekî bîne cih, jina wî jî ji bo ew zilamê kuştiye veşêre li wira ye. Gava Reşo ji wê dipirse bê çi karê te li vira heye jina wî dibêje “paş ko tu ji mal çû odê, Hisoyê pismamê axê qesda mala me kir dawa şuxla neqenc li min kir, min kir nekir xwe jê xilas nekir.”<sup>137</sup> Jina wî pismamê axê dakuje û tîne zindanê jî bo wî veşêre. Reşo jî ji bo şertê axê bîne cih hatiye zinadanê. Piştî meyt vedişêrin Reşo tê odê. Gava axa sebebê bêmediya wî dipirse meseleyê ji wî re dibêje. Axa dibêje “te qenc kir.”<sup>138</sup> Piştî vê yekê jî axa dibêje ez ê dîsa jî qîza xwe bidim te. Reşo qebûl nake. Ev qebûlnekirina wî ji ber tesîra mêranî û sedaqeta jina wî ye.

### 3.20. Timayî

Di çîroka *“Tirba Spî û Marê Qut”* a Ş. Hesen de tema li ser timayîyê ye. Lehengê bi navê Muhemmed bi şahê maran re dibe destbirak. Mar jî her rojê zêrekî dide wî. Piştî wextekî dewlemend dibe û dest bi bazirganiyê dike. Rojekê kurê xwe bi xwe re dibe cem birakê yê mar û ji wî re dibêje ji îro û bi şûn de zêrên min bide lawê min. Mar her roj zêrekî dide lawê birakê xwe. Lawik bi vê yekê nayê ser. Dixwaze bi carekê re bibê xwediyê temamê zêran. Ji xwe re dibêje “ez ê vî marî bikujim û defina wî bi carekê bixwum.”<sup>139</sup> Rojekî bi xayintî diçe cem qula mar û gava derdikeve şûr davêje serê wî serekê wî jê dike. Mar bi serê xwe yê din bi wî vedide û wî dakuje.

### 3.21. Bindestî

Di çîroka *“Xewna Rastiyê”* ya Ş. Hesen de temaya bindestiyê di ser keçeke kurd re hatiye dayîn. Vegêr rojekê xewnê dibîne. Di xewna xwe de keçik bang wî dike. Di banga wê keçikê de em nîşanên bindestiyê û nerazîbûna ji wê bindestiyê dibînin. “Ey xortê kurd! Edî bes e, ji xew rabe, mêze ke hemû heval û hogirên we bi mirazê xwe şa bûne. Hûn tenê li şûna waran mane.”<sup>140</sup> Piştî têra xwe gazinan dike û şîretan li vegêr dike û pê ve dîsa ew nîşanên bindestiyê di gotinên wê de xwe didin der. “min di dilê

---

<sup>137</sup> Hb. rp. 533

<sup>138</sup> Hb.

<sup>139</sup> Hb. rp. 601

<sup>140</sup> Hb. rp. 564

xwe de digot: Rojek dê bê ev xortên hêja, hunermend dirêjî neyaran bikin, kezî û guliyên min ji destê neyaran dê biderxînin.”<sup>141</sup>

### 3.22. Camêrî

Di çîroka “*Dilgirsî û Dilovanî*” ya Fiad Cemil Paşa de di ser jiyana belengazekî re em temaya camêriyê dixwînin. Xela radibe û tişteki xwarinê di mala yê feqîr de tune. Jina ji wî re dibêje here cem cîranê me, ew dewlemend e belkî alîkariya me bike. Mêrik bê dilê xwe dihere lê cîranê wî wî dest vala vedigerîne. gava tê mal û jina wî dipirse bê çi kir, dibêje “dewlemend ji hezkirina peran pê ve çi dizanin? Wan mirovatî, camêrî, dilovanî hemî ji bîr kirine.”<sup>142</sup> Bi gotina wî re cîranekî wî yê din ê dewlemend dikeve hundir û ji yê feqîr re dibêje “dewlemend hemî ne malperest in. Hin hene ko wek we ji comediye hez dikin. Ji îro bi şûn de tu jî wek birayekî min din av mala min de xweyî par î.”<sup>143</sup>

Ev gotinên dewlemendên din di nav metnê de wek nîşana camêriyê hatiye dayîn.

### 3.23. Yekîti

Temaya yekitiyê di gelek çîrokan de di nava mijaran de nîşanên wê xuya dikin. Têgeha yekitiyê ji xwe hema bêje di temamê nivîs, helbest, gotar û nivîsarên Hawarê de wek paşxaneyê tematîk tê xuyakirin. Piştî ku her du serhildanên kurdan ji ber avanebûna yekitiyê têk çûn avakirina vê yekitiyê dibe wek armanca sereke ya nivîskarên Hawarê. Ji ber vê sedemê jî di gelek cihan de li têgeha “yekitiyê” referans hatiye kirin.

Çîroka “*Kurd Yek In*” a Derketîkî Dêrsîmî temaya xwe rasterast ji yekitiyê digire. Vegêr qala helwesta mamosteyê xwe dike gava şakirdekî nû tê sinifa wan. Gava mamoste fam dike şagird ji Mûşê ye ji zarokan re dibêje “Zaroyên min! Divê îro hon pir kêxweş bin! Niho ji we re ji kurdên jorîn hevalem tê. Ew li Mûşê hatiye dinê, li ciyekî dûr; ji kenarê bakurê Kurdistanê.”<sup>144</sup> Ji bo ew nîşana yekitiyê berbiçav bike ji zarokan re dibêje “da bizane ko zarokê kurd li her dibistana kurd, û li her derê Kurdistanê ji

---

<sup>141</sup> Hb.

<sup>142</sup> Hb. rp. 735

<sup>143</sup> Hb.

<sup>144</sup> Hb. rp. 757

xwe re zû hevalan û bran pêda dike.”<sup>145</sup> Gava mamoste ji zarokekî li sinifê de ye dibêje xêrhatinê li hevalê xwe bike ew zarok ji yê Mûşî re dibêje “Ev der welatê te ye! Em gi bra û yar in!”<sup>146</sup> Di ser van gotinan re gava her zarokek diyariyekê didin hevalê xwe yê nû, yekî ji Silêmaniyê sûretê seraya wîr xêz dike û dide wî. Gotina vegêr ya ku dibêje “ala rengîn di ser re pêl dida û diçirîsî.” Yekitiya ku armanca çîrokê jê ew e di bin ala kurdan de saxlemtir dike.

### 3.24. Xayintî

Temaya xayintiyê dîsa di gelek çîrokan de ku mijarên wan şer an jî serhildanin bi awayekî xuya dike. Hema bêje di temamê çîrokên li ser vê mijarê ne têkçûnê bi têgeha xayintiyê ve girê didin. Di çîrokan de di temamê şer û serhildanan de kurd ji ber ku xayintî bi hevdu re kirine wenda kirine û ji ber vê sedemê welatê xwe ava nekirine û bindest mane.

Di çîroka “*Mîr û Nêçirvan*” a M. Emîn Silêman de ev temaya xayintiyê di ser kewê re hatiye dayîn ku kew di meseleya xayintiyê de bûye semboleke kurdan. Mîrê Botan gava rojekê derdikeve gerê li nêçirvanekî rast tê. Nêçirvan ji wî re dibêje ew bi kewê xwe yê ribat ku dixwîne û hevalên xwe dixê dafan, nêçirê dikim. Gava mîr vê yekê dibihîse ji kêw re dibêje “Hey heywanê bênamûs, tu çawa heval û hogir û welatîyên xwe bi destê xwe ji dijminan re dikî davan.”<sup>147</sup> Piştî wê şûrê xwe derdixê û kewê dukuje. Li ser kuştina wî jî dibêje “Ez ji kesê ko heval û hogirên xwe bi destê xwe dikê davên dijmin hez nakim. Heqê wî kesî kuştin e.”<sup>148</sup>

---

<sup>145</sup> Hb.

<sup>146</sup> Hb.

<sup>147</sup> Hb. rp. 1080

<sup>148</sup> Hb.

## ENCAM

Çîroka kurdî li ser temelê pexşana kurdî bi pêş ketiye. Çîrokên Mela Mahmûdê Bazîdî ji ber ku ne di çarçoveya hunera çîroka modern de ne wek çîroka ewil nayê qebûlkin. Çîroka kurdî ya di çarçoveya hunera çîroka modern de, cara ewil di sala 1913an de di kovara Rojî Kurd de hat weşandin. Navê çîrokê “Çîrok” e. Nivîskarê wê Fûad Temo ye. Çîrok teva ku di dawiya wê de hatiye gotin ku dewama heye jî tamam nebûye.

Piştî çîroka yekemîn em di Kovara Hawarê de rastî çîroka Kurmancî tîn. Kovara Hawarê di sala 1932an de dest bi weşanê kir. Hejmara wê ya ewil di 15ê Gulana 1932an de derket. Kovarê li Şamê dest bi weşana xwe kir ku wê serdemê Şam di bin desthilatdariya Fransayê de bû. Xwedî û berpirsiyarê Hawarê Celadet Alî Bedirxan e.

Kovara Hawarê di nav kovargerîya kurdî de cara ewil e ku cih nedaye zimanê tirkî. Vê yekê jî kiriye ku nivîskariya kurdî di ser zimanê kurdî re şax vede û pêş bikeve. Ji bilî Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Alî Bedirxan paşxaneyê nivîskariyê ya nivîskarên kovara Hawarê tune. Nivîskarên ku di Hawarê de nivîsên wan hatine weşandin gelek ji wan bi alîkarî û teşwîqkirina Celadet Alî Bedirxan dest bi nivîskariyê kirine.

Di 57 hejmarên *Kovara Hawarê* de ji hêla 31 nivîskarî ve li ser hev 77 çîrok hatine weşandin. Ji van çîrokan 19 heb çîrokên gelerî ne. 2 heb adaptasyon, 6 heb jî werger in. Çîrokan di çarçoveya hunera çîroka modern de me qebûl kirine 50 heb in û ji hêla 15 nivîskarên cuda ve hatine nivîsîn. Çîrokên modern ên di kovarê de weşiyane me kurteya wan jî daye. Me ev çîrok li gor taybetiyên wan senifandine û wek tablo jî nîşan dane. Her weha me tabloya nivîskaran jî derxistîye.

Analîza çîrokên Kurmancî yê modern ên di Kovara Hawarê de hatine weşandin me li gor temayên wan kiriye. Çîrokên Hawarê xwedî temayên wek; şer/serhildan, xelaskirina welêt, hezkirina welêt, şer/adetên eşîrî, evîn, fedakarî, poşmanî, bîranîn, zanîn/xwendin, hezkirina zimên, rêvebir/rêvebirî, ol, heyfhilanîn, xurafe/baweriyên batil, welatperwerî, hêvî, qedirnasî, mêrxasî, sêdaqet, timayî, bindestî, camêrî, yekîfî û xayintiyê ne.



## ÇAVKANÎ

### 1. Pirtûkên Ji Wan Hatine Îstifadekirin

- Bedirxan, Celadet Alî, **Gazinda Xencera Min**, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007
- Bedirxan, Celadet Alî, **Klêopatre**, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007
- Bedirxan, Celadet Alî, **Gazinda Xencera Min**, Avesta, Stenbol, 2014
- Borges, Jorge Luis, **Alef**, Wer: Fatma Akerson, İletişim Yayınları, İstanbul, 2009  
(wergêra çîroka Alefê)
- Can, Qedrî, **Guneh**, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007
- Can, Qedrî, **Hemû Berhemên Wî**, Amd. Rênas Jiyan, Belkî, Stenbol, 2009
- Farqînî, Zana, **Türkçe – Kürtçe Sözlük**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2013
- Hawar, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012
- Jîr, Sîdar **Ariya Giyanên Stewr**, Weşanên Bajar, Stenbol, 2004
- Karahan, Enwer, **Şevbihêrkên Şevên Xalî**, Weşanên Doz, Stenbol, 2001
- Mazî, Çiya, **Mistek Jiyan**, Weşanên Sî, Stenbol, 2003
- Sebrî, Osman, **Hevalê Çak**, Weşanên Lîs, Ankara, 2011
- Zaza, Nûredîn, **Gulê**, Weşanên Lîs, Stenbol, 2007

### 2. Makale

- Ergün, Zülküf, **Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê**, Mukaddime, Hejmar:9, 2018
- Keskin, Songül, **Lênêrînek Li Çîroka Xezala Sîma Semend: Li Gel Şoreşa Sovyetê Pirsgirêka Jinê**, Kovara Wêje û Rexne, Hejmar 9/10, 2017

Önen, Ronayi, **Dilde Bir Modernleşme Öyküsü Celadet Bedirxan'ın Alfabe Serüveni**, Kürt Tarihi Dergisi, Sayı: 25, 2016

Pîrbal, Ferhad, **Bîblîografya û Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû**, Kovara Nûdem, Hejmar 11, Sweden, 1994

UÇAR, Fuat , Osman AKANDERE, **Turgut Özal'ın Kürt Sorununa Yaklaşımı**, Ankara Üniversitesi Türk İnkılâp Tarihi Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi, Sayı: 61, 2017

Ulugana, Sedat, **Kurdolojiya Sovyetê û Kronolojiya Edebiyata Wê ya Kurdî (1922-1991)**, Kovara Wêje û Rexne, Hejmar 9/10, 2017

### 3. Tez

Alpay, İmge, **Anton Pavloviç Çehov'un Kısa Öykü Sanatı**, Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Yüksek Lisans tezi, 2016

### 4. Malper

[http://www.nefel.com/articles/article\\_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319](http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=34&ArticleNr=319)

<http://diyarname.com/news.php?Idx=301>

<http://diyarname.com/news.php?Idx=302>

### 5. Pirtûk

Ahmedzade, Haşîm, **Ulus ve Roman Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma**, Wer: Azad Zana Gündoğan, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004

Alan, Remezan, **Bendname**, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013

Amîda, Îrfan, **Qonaxeke Modernîzma Kurdî Helbesta Tîrêjê**, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2016

Andaç, Feridun, **Öykü Yazmak Hikaye Anlatmak**, Eksik Parça Yayınları, İstanbul, 2017

Aydoğan, İbrahîm Seydo, **Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî**, Weşanên Rûpel, Stenbol, 2014



BATES, H.E., **Kısa Öykü**, Bilge Kültür Sanat, Stenbol, 2013, Wer. Gökçen EZBER

Bazîdî, Mela Mehmûdê, **Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî**, Amadekar: Ziya Avcî, Weşanên Lîs, Amed, 2010

Peter Brooks, **Psikanaliz ve Hikaye Anlatıcılığı**, Wer: Hivren Demir- Atay – Hakan Atay, Boğaziçi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2016

Ecevit, Yıldız, **Türk Romanında Postmodernist Açılımlar**, İletişim Yayınları, İstanbul, 2016

**Hawar**, Amd. Fîrat Cewerî, Weşanên Nûdem, Swêd, 1998

Özer, Sevinç Sayan, **Çağdaş Kısa Öykü Sanatı ve Politikaları**, İmge Kitabevi Yayınları, Ankara, 2018

**Rojî Kurd 1913**, Amadekar: Koma Xebatên Kurdolojiyê, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013

Shakely, Ferhad, **Modern Kürt Öykü Sanatı**, wer: Rohat Alakom, Weşanên Avesta, İstanbul, 1998

Tosun, Necip, **Modern Öykü Kuramı**, Hece Yayınları, Ankara, 2018

Uzun, Mehmed, **Kürt Edebiyatına Giriş**, İthaki Yayınları, İstanbul, 2006

Zeraq, Dilawer, **Rajena Kurdî Nivîsarên Libarey Ziman û Wêjeyê**, Weşanên Lîs, Diyarbakır, 2014

T.C.  
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: "ÇİROKA KURMANCE YA MODERN DI KOVARA HAWARÊ DE"

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 114 sayfalık kısmına ilişkin 24/09/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dâhil 6% ' dir.

**Uygulanan Filtrelemeler:**

**Kaynakça hariç**

**Alıntılar dâhil**

**5 Kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar**

**Açıklamalar:** Kapak sayfaları ve kaynakça dâhil edilmemiştir.


Mardin Artuklu Üniversitesi turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Emin BOZAN

Öğrenci No: 15711011

Programı: Kürt Dili ve Kültürü


Statüsü: Yüksek Lisans

  
Tarih ve İmza

24/09/2019


Danışman Onayı

Doç.Dr. Mustafa ÖZTÜRK



A.B.D. Başkanı Onayı

Prof.Dr. Abdurrahman ADAK





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

# HAWAR DERGİSİNDE KURMANCÎ MODERN ÖYKÜSÜ

Yüksek Lisans Tezi

Emin BOZAN

15711011

Danışman

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin, 2019